

K.T
ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ



TEZA MASTERÊ
HÛRNÊRÎNEKE SEMİYOTİK LI SER ÇÎROKÊN KURDÎ

Amadekar
Ahmet SUBAŞI

ŞÊWIRMEND
Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD

BÎNGOL – 2022

T.C
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANA BİLİM DALI



YÜKSEK LİSANS TEZİ
KÜRTÇE MASALLAR ÜZERİNE GÖSTERGE BİLİMSEL BİR ANALİZ

Hazırlayan
Ahmet SUBAŞI

TEZ DANIŞMANI
Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD

BİNGÖL – 2022

NAVEROK

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ.....	IV
KURTE.....	VI
ABSTRACT.....	VII
ÖZET.....	VIII
Ferhengoka Sembolan.....	IX
Ferhengoka Têgihan.....	IX
DESTPÊK.....	1
Mijara Tezê.....	2
Armanc û Zehmetiyên Tezê.....	3
Sînorên Tezê.....	4
Rêbaz.....	4
BEŞA YEKEM	6
Çanda Devkî.....	6
1.1. Taybetiyên Çanda Devkî.....	11
1.2. Di Çandên Devkî de Jiber.....	12
1.3. Metodên Parastina Agahiyan di Heş de.....	13
Çîrok.....	14
1.1. Kêşeya Senifandinê û Hewldana Pênaseya Çîrokê.....	15
1.2. Ber bi Pênaseya Çîrokê ve.....	18
1.3. Çîroka Kurdî û Berhevkarî.....	22
1.4. Xebatên ku ji Fikra Neteweti Dûr Hatine Kirin.....	22
1.5. Xebatên ku bi Bizava Netewetiyê Romantîk Hatine Kirin.....	22
1.6. Xebatên ku bi Fikarên Zanistî Hatine Kirin.....	23
1.7. Kurtedîroka Berhevkarîya Çîrokên Kurdî/Kurmancî.....	24
1.8. Berhevkarî.....	24
1.9. Rojname.....	25
1.10. Kovar û Xebatên din.....	26
BEŞA DUYEM	28
1.Semiyotîk.....	28
1.1. Wate û Pênaseya Semiyotîkê.....	28
1.2. Geşedan û Dîrokçeya Semiyotîkê.....	29

1.3. Têgihana Semiyotîkê ya Platon	30
1.4. Têgihana Semiyotîkê ya Arîsto	30
1.5. Semiyotîk di Sedsalên XVII û XVIII de	32
2. Du Pêşengên Semiyotîka Modern: Charles Sanders Peirce û Ferdinan de Saussure ...	32
2.1. Charles Sanders Peirce	32
2.2. Ferdinand de Saussure	33
2.3. Berawirdkirina Peirce û Saussure	35
3. Semiyotîka Vegêranî: Wêje	36
4. Ekola Semiyotîkê ya Parisê	38
5. Wate û Semiyotîk	38
6. Modela Kiryarvanan.....	40
7. Eksenên Fonksiyonê.....	42
8. Îfade.....	44
9. Bernameya Derbirînê	45
10. Eksena Wateyê û Veguherîn.....	45
11. Beşkirin û Sînorên Beşkirînê	47
BEŞA SÊYEM	48
1. Çîroka Yekem: Alpiz û Zemmê	48
1.1. Beşa Yekem: Rewşa Destpêkê	48
1.2. Beşa Duyem: Xweveşartina K ₁ ê.....	49
1.3. Beşa Sêyem: Beşdarbûna Kirdeyeke Nû	49
1.4. Beşa Çaran:.....	50
1.5. Beşa Pêncan:.....	51
1.6. Beşa Şeşan:	51
2. Bergeha Karakterên Çîrokê	52
3. Pêkhatina Mekan di Çîrokê de	52
4. Sererastkirina Demê di Çîrokê de	53
2. Çîroka Duyem: Kurê Pîra Cina	54
2.1. Beşa Yekem: Rewşa Destpêkê	54
2.2. Beşa Duyem: Beşdarbûna Alîkarekî.....	55
2.3. Beşa Sêyem: Şertê K ₁ ê yê bi hev re mayînê.....	56
2.4. Beşa Çaran:.....	56
2.5. Beşa Pêncan: Bi destxistina tecrûbeyê ji bo pêkanîna kiryarê.	56

2.6. Beşa Şeşan: Tevlîbûna Astengêr	57
2.7. Beşa Heftan: Rola Astengêr	58
3. Bergeha Karakterên Çîrokê	58
4. Pêkhatina Mekan di Çîrokê de	59
5. Sererastkirina Demê di Çîrokê de	61
3. Çîroka Sêyem: Teyrê Sîbeg / Çîroka Çil Bira	61
3.1. Beşa Yekem: Rewşa Destpêkê	61
3.2. Beşa Duyem; Pêkbûyîna Kirdeya Sereke	62
3.3. Beşa Sêyem: Xapandîna Astengêr û Temamkirina Kêmasiyê	64
3.4. Beşa Çarem: Kiryara Yekem	65
3.5. Beşa Pêncem: Kiryara Duyem	66
3.6. Beşa Şeşem: Encama Kiryaran	66
3.7. Beşa Heftem: Yekem Alîkar û Yekem Kiryara Performansê	68
3.8. Beşa Heştam: Encama Lêgerînê	68
3.9. Beşa Nêhem:	69
3.10. Beşa Dehem: Kiryara Yekem a Vê Beşê	71
4. Binbeşên Çîrokê: Dûvbûyera (tr. Olunut, İng. Artifact) Çîrokê	74
4.11.1. Beşa Yekem: Rewşa Destpêkê	74
4.11.2. Beşa Duyem:	75
4.11.3. Beşa Sêyem: Guherîna K ₂ yê	77
4.11.4. Beşa Çarem: Danîna Peymanê Yekem	77
4.11.5. Beşa Pêncan: Peymana Duyem û Kiryara Performansê	78
4.11.6. Beşa Şaşem: Dawiya Çîrokê û Peymana “Serjêkirinê”	79
5. Bergeha Karakterên Çîrokê	79
6. Pêkhatina Mekan di Çîrokê de	81
7. Mekanên Dûvbûyera Çîrokê	82
8. Sererastkirina Demê di Çîrokê de	83
ENCAM	84
ÇAVKANÎ	87
PÊVEK	90

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Yüksek Lisans tezi olarak hazırladığım *Hûrnêrîneke Semiyotîk li ser Çîrokên Kurdî* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

28 / 04 / 2022

Ahmet SUBAŞI

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Ahmet SUBAŞI tarafından hazırlanan “*Hûrnêrîneke Semiyotîk li ser Çîrokên Kurdî*” başlıklı bu çalışma, 28.04.2022 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda *oybirliği ile* başarılı bulunarak jürimiz tarafından Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan	: Doç. Dr. Canser KARDAŞ	İmza:
Danışman	: Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD	İmza
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Zafer AÇAR	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../ 2022 tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA
Enstitü Müdürü

KURTE

Metn an jî derbirîn, bi xêra rêbazên tehlîlê yê objektîf ku li ser zimanzaniyê hatine kirin ji bin şîroveyên subjektîf derketine û bûne mijara lêkolînên zanistî. Di vê peywendê de berhemên wêjeyî jî bi rêbaza semiyotîka vegêranî re bûne mijara vê qadê. Bi vî aliyê xwe rêbaza A. J. Greimas ku tevli têgîn û amûrên wê yê tehlîlê bi pêş xistiye ji bo tehlîlên dermentnî û sepandina vê rêbazê îmkanên baş daye avakirin. Janirên wêjeyî, nemaze jî çîrok di vê peywendê de para xwe ji van lêkolînan stendiye.

Di vê peywendê de armanca vê xebatê ew e ku rêbaza ku A. J. Greimas ya bi navê *modela kiryarvanan* ku ji binyatgerên wek Vladimir Propp wergitibû û bipêşxistibû li ser çîrokên kurdî bicerbîne. Ev çîrokên ku bûne nimûneyên vê xebatê me bi xwe berhevkirine ku bi vî awayî em hevî dikin ku ev xebat dê hem sînoren vegotina çîrokên kurdî derxe holê û hem jî binyata wan a kûr.

Peyvên Serekî: Semiyotîk, Modela Kiryarvanan, Çîrok, Çîrokên Folklorîk yê Kurdî, Tehlîla Çîrokên Folklorîk yê Kurdî, Nimûneya Tehlîleke Semiyotîka Vegêranî.

ABSTRACT

Text or narrative, thanks to the objective analysis methods on linguistics, got rid of subjective interpretations and became the subject of scientific research. In this context, literary Works have also become the subject of this field together with the method of narrative semiotics. In this respect, this method which will ve applied with the concepts and tools developed by A. J. Greimas for analysis, and non-textual analysis, has built good opportunities. Literary works, especially fairy tales, have taken their share from these studies in this contxt.

The aim of this study is to apply thid method, which was developed by A. J. Greimas, inspired by structuralists such as Vladimir Propp, to Kurdish fairy tales. We have personally compiled these tales, which are examples of this study, and we hope to reveal both the limits of expression and the deep structures of Kurdish tales with this study.

Keywords: Semiotics, Acting Model, Tales, Kurdish Tales, Analysis of Kurdish Stories, Analysisi with Narratives Semiotics

ÖZET

Metin veya anlatı, dilbilim üzerine yapılan nesnel çözümleme yöntemleri sayesinde öznel yorumlardan kurtulmuş ve bilimsel arařtırmaların konusu olmuřlardır. Bu bağlamda edebi eserler de anlatsal göstergebilim yöntemi ile beraber bu alanın konusu haline gelmişlerdir. Bu yönüyle A. J. Greimas'ın çözümleme için geliřtirdiđi kavram ve araçlarla metindiři çözümlenmeler ile uygulanacak bu yöntem iyi imkanlar inřaa etmiştir. Edebi eserler, özellikle de masallar bu bağlamda bu arařtırmalardan kendisine düşen payı almıştır.

Bu çalışmanın amacı A. J. Greimas'ın, Vladimir Propp gibi yapısalcılardan esinlenerek geliřtirdiđi, *eyleyenler modeli* olarak adlandırılan bu yöntemi Kürtçe masallara uygulamaktır. Söz konusu bu çalışmaya örnek olan bu masalları bizzat derledik, bu çalışma ile hem Kürtçe masalların anlatım sınırlarını hem de derin yapılarını ortaya çıkarmayı ümit ediyoruz.

Anahtar Kelimeler: Semiyotik, Eyleyenler Modeli, Masal, Kürtçe Masallar, Kürtçe Hikayelerin Çözümlemesi, Anlatsal Göstergebilimle Çözümleme Örneđi

Ferhengoka Sembolan

Sembol	Wate
K	Kirde
B	Bireser
[]	Îfadeya kirinê
()	Îfadeya rewşê
→	Fonksiyona kirinê yan jî veguherîn
∩	Pêkvebûn
∪	Jêkvebûn

Ferhengoka Têgihan

Kurdî	Frensî & Îngilîzî	Tirkî
Alîkar	Adjuvant, Helper	Yardımeden
Astengêr /Dij-Kirde	Opposant, Opponent	Engelleyici/Karşı-Özne
Bernameya Derbirînê	Programme Narratif, Narrative Program	Anlatı İzlenesi
Beş	Séquence, Sequence	Kesit
Beşkirin	Segmentation, Segmentation	Kesitleme
Hilgir	Destinataire, Addressee	Alıcı/Gönderilen
Îfade	Énoncé, Utterance	Sözce
Kiryar	Action, Action	Eylem
Kiryarvan	Actant, Actant	Eyleyen
Lebatî	Passif, Passive	Edilgen
Modela Kiryarvanan	Modèle D'acteurs, Actors Model	Eyleyenler Modeli
Nîşanbar	Signifiant, Signifier	Gösteren
Nîşandêr	Signifié, Signified	Gösterilen
Nîşanek	Signe, Sign	Gösterge
Şandyar	Destinateur, Addresser	Gönderen
Tebatî	Actif, Active	Etken

DESTPÊK

Berhemên folklorîk di şevên dirêj de carinan bi mebesta şîretan, carinan jî bo pêkenînê û carinan jî ji bo bihurandina demê dihatin gotin. Vebêjer bi van berheman di hişê guhdervanan de bûyerên fantastîk bi vagotineke fantasîtk diafirand û wan dikire şahidê vê afirîneriyê û her wiha ji bo berdewamiya vê kevneşopiyê ji nifşên nû re vebêjerên nû perwerde dikir. Berhemên folklorîk hem ji ber ku xwedî taybetiyên subjektîf in hem jî bo ku pireke devkî ne di navbera rabirdû û dahatûyê de û di heman demê de ji ber ku xwedî binyadeke guherbar in hem tecrûbeyê demê hem jî ya vebêjer radigihînin ber destê me. Her çî qas ev vegotin bi hunera ragihandina vebêjer û guherîna demê re peywendîdar be jî xwe adapteyî vê rewşa nû dike û tu caran çarçoveya wê naguhere.

Di dîroka dinyayê de berhevkarîya berhemên folklorîk nêzî du sed sal berê dest pê dike. Piştî girîngiya berhemên folklorê hat fahmkirin ne bi awayekî bi rêk û pêk be jî xebatên berhevkarîyê li welatên rojava dest pê kirin. Ev xebatên ku hatin kirin rê li ber xebatên wek zimannasî, mîtolojî, senifandina gelan û wd. vekir ku zanyaran ev babet wek çavkanî bi kar anîn û bi vî awayî jî berhemên folklorîk bûn qada lêkolînên navdîsîplînî. Nemaze jî di vî warî de lêkolînên binyadgerî yên li ser çîrokan hatin kirin hevpariyek mezin a di navbera çîrokên dinyayê de derxist holê. Piştî vê geşedana li ser çîrokan û lêkolînên navdîsîplînî hat fahmkirin ku ne wek îdiayên berê ne, yên ku çîrok û berhemên gelêrî wek tiştên pûç didîtin.

Li gor welatên rojava di nav kurdan de karê berhevkarîyê bi derengî ketiye û her wiha berhavkarîya berhemên folklorê yên kurdî jî yekem car ji aliyê mîsyoner û gerokên ewrupî ve dest pê kiriye. Xebatên girîng yên berhevkarîya kurdî cara ewil bi pêşniyazên konsolê ûris yê Erzeromê Alexandre Jaba ji aliyê Mele Mahmûdê Bazîdî ve hatiye kirin. Ev pêvajoyê piştî sedsala XIXan di nav kurdan de bêtir berbelav bûye. Lêbelê xebatên zanistî di van demên dawî de (li bakurê Kurdistanê) zêdetir bû, nemaze piştî qedexeya li ser zimanê kurdî kêmbû û li zanîngehan beşên kurdî hatin vekirin. Bi vê peywendê gelek tez, gotar û pirtûk hatin nivîsandin.

Piştî hat fahmkirin ku çîrok xwedî binyadeke hevpar in (nemaze bo yên Hînd-Ewropî) ji bo analîza wan çend model derketin pêş. Ji van modelan ya herî girîng “teşenasî”ya Vladimir Propp e, ku Propp di xebatên xwe yên li ser çîrokên gelê ûris de hevpariyeye xwedî 31 fonsiyonî di çîrokan de peytandîye. Her wiha “motîf îndeks”a Stith Thompson jî di bin vê

geşedanê de derçû ye. Lêbelê semiyotika ku berê bi gelemperî wek têgiheke zimanzanî û felsefeyê dihat bawerîkirin bi analîza wateyî ya çîrokê derbasî merhaleyeke din bû. Nemaze jî semiyotika vegotinî (*anlatsal göstergibilim*) wek cureyên din yê vegotinê taybetiyên binyadî û vegêranî ji xwe re kiriye mijar. Di vê peywendê de em dikarin qala Dibistana Parîsê ya Semiyolojîyê bikin ku bi rêveberiya A. J. Greimas ve hatibû damezrandin û bi vê Dibistanê re êdî semiyotîk wek teoriyeke zanistî ya serbixwe ji zimanzanî, rexneya wêjeyî, civakzanî, psikolojî, teoriya hunerê û wd. veqetîya û bi pêş ket (Rifat, 2009: 115).

Çîrok ku cureyek ji vegotina pevxistî ye bi hûrnêrîna semiyotîk ve ketiye ber hewla wate û watedarkirinê. Vê xebata ku di vê pêvajoya wate û watedarkirinê de hewla dîtina nîşanbarên (*indicator*) watedar ên çîrokan dide bi vê rêyê helwest dike ku bûyera di çîrokê de tê vegotin li rûrasta ravekirina mantiqî bide rûniştin. Di vê pêvajoya vegotinê de vegêran hem bandordar e hem jî bandorker e, bi gotineke din hem obje ye hem jî subjê ye; bandora mirov li mirov dibe, ya mirov li derdorê dibe, ya derdorê li mirov dibe û wd. Di vê pêvajoyê de vegêran mijara ku bûye malê vegotine, watedar dike (*afirînerî û watedarkirina xwe*) bi kesên dîtir re jî dide watedarkirin. Ev rewşa xwezayî (*têkiliya navhevî*) fersenda ji ‘bîra wateyan’ watederxistinê û watedarkirinê dide me.

Bêguman armanca semiyotîkê ne peydakirina cureyê rexneyeke nû ye, tenê wek pêvekekê dixwaze wateyê watedar bike. Gava vê dike jî li ser afirîneriya movikkirina wateyan ya bi hev ve lêdikole û wek modeleke fikrînê ya zanistî derdikeve pêşiya me ku pêvajoya vê afirîneriyê derdixe holê (Rifat, 2009: 22). Ev pêvajoya afirîneriyê li ser wateyên di navbera hestên dijber de derdikeve, yê wek başî-xerabî, rastî-derewî xweşikahî-kîretî, belengazî-dewlemendî, lawazî-xurtî û wd. Ev paradîgmaya semiyotîkê firseta hûrnêrîna rêzwateyên di çîrokan de dide me. Her çî qas piştî lêkolînerên ûris hevpariyeye mezin yê dinavbera çîrokan de derketibe holê jî layeneke wan ya çandî jî heye. Ji ber vê sedemê jî semiyotika watedar ne tenê hevpariyên çîrokan di heman demê de aliyên wan yê wateyî û çandî yê guherbar jî bi me dider watedarkirin.

Mijara Tezê

Ev tez çîrokên folklorîk yê kurdî li gorî modela kiryarvanan dê tehlîl bike. Modela kiryarvanan ji aliyê A. J. Greimas ve hatiye bipêşxistin, ev rêbaz wek semiyotîka vegêranî tê binavkirin ku beşeke semiyotîkê ye. Ev rêbaz di metn de li wate û îmkanên wateyê digere, me

jî di vê peywendê de di çîrokên gelêrî yê kurmacî yê me berhev kiribûn de bi xêzkirina şablonan, tehlîla mekan, dem û karakteran xwestiyê bigihêje wateya kûr a îfadeyên çîrokan.

Armanc û Zehmetiyên Tezê

Çîrok wek cureyekî pevxistî dibe ku bibe berhema girîngtirîn ya wêjeya devkî. Sedema girîngiya çîrokê lipaşmayîna çanda nivîskî ye û ev jî hêza vegotinê di çîrokan kurdî de qewî dike. Ji ber vê sedemê çîrokên kurdî nîşan û neverokek piçûk ji her warê jiyane digirin ev jî wan ji aliyê wateyê ve bihêztir dike.

Heta niha, wek ku me li jor jî destnîşan kiribû, nemaze van salên dawî ne tenê xebatên berhevkarîyê, xebatên zanistî jî li ser çîrokên kurdî hatin kirin. Ev xebat bi gelemperî çîrokên kurdî ji layena binyadî ve nirxandine û rêbazên wek “teşenasî”ya Vladimir Propp û “motîf îndeks”a Stith Thompson şixulandine, her wiha hin xebatên ku li ser rola çîrokan a ji bo perwerdehiya zarokan û civatê û babetên taybet yê wek rola jinê di çîrokên kurdî de û wd. jî hene. Lêbelê heta niha li ser semiyotîkê an jî semiyotîka vegotinê tu xebat nehatine kirin. Ev rewş ji bo vê xebatê dezavantajeke mezin e, lewra mijareke wisa ku hê jî nû tê hesibandin di kurdî de ne xwedî termolojîyekê ye. Tenê gotareke Mehmet Yonat ya bi navê “*Semiyotîk Çi ye*” di pirtûka “*Waneyên Zimannasîyê*” de hatiye weşandin. Yonat di vê gotarê de bi kurtasî li ser pêname, pêşeng û cureyên semiyotîkê sekiniye û hin têgihên sereke rave kiriye.

Di kurmacî de hin nimûneyên teorîk yê ravekirina semiyotîkê hebin jî em rastî tu xebatên pratîk nehatin lêbelê di zazakî de xebateke bi navê “Keyneka Wayerê Hot Bırayan Sera Tehlîlêko Semiyotik” (Li Ser Çîroka Xwişka Heft Bırayan Tehlîleke Semiyotik) ku ji aliyê Mehmet Aslanogullari ve hatiye xebitîn û di “Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi” (Zanîngeha Çewlîgê Kovara Estûtuya Zimanên Zindî) de weşiyaye. Ev gotar di zazakî de jî xebata yekem e li ser semiyotîkê. Li gor agahiyên ku em gihane wan di soranî de di vî warê de gelek lêkolînên berfireh yê akademîk hene lê mixabin menikaribû xwe bigihîne van xebatan û ji wan îstifade bike.

Bêgûman ev xebata me ne bi angaştê dagirtina valahiyên di vê qadê de radibe ser pîyan, lê heta ku ji destê me bê em ê hewl bidin ku di vê qadê de nimûneyeke piçûk û bi kêrhatî pêk bînin. Her wiha ji hêla hilbijartina rêbaza semiyotîkê ya ji bo nirxandina çîrokên gelêrî armanca me ew ku em rêyeke piçûk ji bo avakirina vê lîteraturê ji bo kurdî vekin. Helbet em ne bi îdîayeke mezin radibin, tenê em hewl didin ku rê li ber xebatên bi vî rengî

vekin û ji bo vê zanistê xaleke piçûk ava bikin. Di vê peywendê de em ê çarçoveya van çîrokan ji aliyê semiyotika vegotinê ve destnîşan bikin. Û bi vî awayî em ê sînorên çanda devkî ya kurdî jî bi bergeheke ku wateyê dike navend, xêz bikin. Em ê bidin ber çavan bê çawa bi bergeha wateyî (semantîkî), vegotina hêsan a çîrokan watedarên hevgerî pêk tîne. Hêmanên ku di çîrokan de serbixwe xuya dikin jî bi vê bergehê tevî vê rewşa semantîkê dibin.

Sînorên Tezê

Ev xebat dê li ser sê çîrokên kurdî yê folklorîk raweste ku min ev çîrok ji gundê Xanosera Bismila Amedê berhev kirine. Helbet berhemek li kijan heremê kemilî be li gor jiyana wê heremê kêr zêde rû digire û ev her sê çîrok jî nîşanekên civata vê heremê kêr zêde di naveroka xwe de dihevin. Di vê peywendê de semiyotika ku li dû pêkhatina wate û îmkanên wateyê diçe dê nîşanekên xwerû yê civatê derxe holê.

Di heman demê de nezanbûna zimanê tirkî ya çîrokbêjê ji me re avantajêke mezin pêk anî lewra nezanbûna tirkî, kurdî kiriye zimanê serdest û bi vî awayî jî reseniya vegotinê hatiye parastin. Ev jî rûrasta reseniya wateyên ku di peyvê de nivveşartîne pêk tîne. Rêbaza ku me ji bo tehlîla van çîrokan hilbijartîye rêbaza “semiyotika vegotînî” ye, bi awayekî gelemperî semiyotik ji pênc cureyan pêk tê ku em ê bi kurtasî di beşeke din de qala wan bikin. Di vê xebatê de me rêbaza A. J. Greimas ya tehlîlê ya bi navê *modela kiryarvana* hilbijartîye ku her wiha Greimas wek pêşengê Dibistana Semiyotîkê ya Parisî ye. Li gor vê dibistanê xêzkariya semiyotîkê teoriya gelemperî ya pergala watedarkirinê pêk tîne (Dervişcemaloğlu, 2005: 23).

Rêbaz

Di çanda devkî ya kurdan de çîrok cihekî girîng digirin. Bi bajarbûnê re êdî çîrok wek adetên gundiyan mane û li bajaran rêça wan êdî winda dibe yan jî li ber windabûnê ye. Tenê di nav gundiyan de çîrok baş tî zanîn, bê guman ev çarenûsa hemû çandan e; hemû çand bi vî awayî ji kevneşopiyên xwe bi dûr ketine. Di vê windabûnê de rola nivîsê, amûrên ragihandinê yê teknolojîk, afrîneriya çanda gerdûnê û popûlerbûna wê cihekî mezin digire. Ji ber vê sedemê jî cihe ku min ê bikaribû çîrokan berhev bike gund bi xwe bûn, di çîrokên ku min berhev kirine de yê gelekî dirêj û pirtebeqe hene lewma jî heta ku ji min hat min yê ku ji aliyê wateyê ve bihêztir hilbijartin.

Çîrokbêj dayika min bi xwe bû, Sultan Subaşi (Siltana qîza Mehme Salih, sala jidayîkbûnê: 1948). Ew xwedî çandêke bihêz ya devkî ye û di heman demê de guhdervaneke baş e. Bavê dayika min hinek dewlemend bûye û lewma jî mala wan ji gelek dengbêj û çîrokbêjan re bûye wargehek. Lêbelê du çavkaniyên eslî yê wê hene ku jê sûdwegirtiye; nîvserhedbûn û nîvbotanbûna wê. Çîrokên her du heremên Kurdistanê jî bandor lêkirinê. Lewma ew li Amedê mezin bûye lê diya wê ji serhedê ye, ev jî bûye sedem ku repertuara wê ya çîrokan berfireh be. Di heman demê de dayika min bi tirkî jî nizane û ev jî wê ji tv û amûrên din yê ragihandinê bi dûr xistiye û kiriye guhdarvaneke baş. Lewma jî gotin li cem wê biqîmettir in. Min ev çîrok çar sal berê tomarkiribûn û bi xêra vê xebatê jî min ew derbasî nivîsê kirin. Lêbelê ez ê tomara dengên jî wek pêvekekê bi dû teze ve bikim.

BEŞA YEKEM

1. Çanda Devkî

Mirovahî an jî mirov ji roja ku li ser rûyê erdê dest bi ji jiyane kirin nixên maddî û manewî hilberandin. Ev nixên ku hatin afirandin ji bo hebûna wê civakê berdewam bike ji nifş bi nifş dihatin veguhastin. Ev pêvajoya dîrokê ji bo avakirin an jî parastina civakan pir girîng bû ji ber sê sedemê jî vê pêvajoyê amûra ku wek çandê tê binavkirina derkete holê. Bêjeya çandê cara yekemîn ji aliyê Voltaire ve ji bilî wateya xwe ya berê, wekî aliyekî avabûn û pêşketina hişên mirovan hate nixandin. Antropolog Tylor di sala 1871an de wateyeke zanistî li vê bêjeyê bar kir. Li gor Tylor, çand ji dema ku mirov wekî qebîleyan dijiyan û vir ve heyê. Dîrokî ye, bi pêvajoyê re ava dibe, bi carekê re derneketiye holê, mayînde ye; ji nifşekî digihêje nifşekî din (Çifçi, 2012: 6) û gava ku vê dike jî ji tecrûbeyên nû yê jiyane sûd werdigire, bi agahiyên nû xwe dewlemend dike. Di civakeke nexwende de temamê kevneşopiya devkî bi amûra gotinê tê veguhastin ku temamê çandê jî di vê çarçoveyê de ye (Goody, 2009: 129). Lewra ji bo civakeke nexwende gotin yekem amûra veguhastinê ye.

Bi kifşkirina nivîsê re û nemaze jî piştî ku nivîs ji aliyê hin civakan ve hate navxweyîkirin/înternalîzekirin civak ji aliyê lêkolîneran ve di du kategoriyan de hatine senifandin. Lewra bi awayekî teknîkî nivîsandina nivîsê kir ku agahî ji xeynî hişê tazî bi amûreke hêzdartir were tomarkirin, civandin û tasnîfkirin (Kanca, 2020: 537). Ji wan kesên civakê ku disenifînin yek jê jî Claude Levi- Strauss e. Ji aliyê Strauss ve civakên ku nivîsê bi kar tînin “hemdem”; civakên ku ji nivîsê ne haydar in jî wekî “kevnare” hatine pênasekirin. (Çifçi, 2012: 6). Civakên ku ji nivîsê haydar in an jî bi awayekî çalak bi kar tînin wek ku em ê dawiyê jî destnîşan bikin dikarin analîzan, lêkolînan bikin, beravajî vê civakên ku ji kaniya çanda devkî vedixwin nikarin van erkan pêk bînin; lêbelê çanda wan a devkî gelekî bi pêş ketiye. Hemû hînbûnên xwe, baweriyên xwe, serpêhatiyên xwe û wd. bi rêya gotinê/dev vediguhêzin nifşên nû. Di navbera van her du civakan de awayekî jiyane heyê ku bi tercîha (her çi qas xwezayîbûna vê tercîhê mijara nîqaşê jî be) nivîs û gotinê rû digire. Ji ber vê sedemê jî ji bo civakên hemdem “dîtin” bawerîkirin e, lê ji bo civakên kevnar “bihîstin, gotin” bawerîkirin e (Çifçi, 2012: 7). Ev tercîh di her cûre qadên jiyane de xwe dide nîşan, tirs û baweriyên van her du civakan jî bi vê terzê reng digirin, bo nimûne civakên “hemdem” xwedî tirsên şênber in, lê yê “kevnare” xwedî tirsên razber in.

Tê bawerîkirin ku nivîs berî zayînê 3000 sal berê ji aliyê Sûmeriyan ve hatiye kifşkirin (Yörür 2013: 3), lêbelê hem berî kifşkirina nivîsê hem jî piştî wê (bi pirahî berî serdema modern) gotin yekem amûra ragihandinê bû. Pêşengê zimanzaniya modern Ferdinand de Saussure (1857-1913) bi bîr tîne ku beriya her tiştî bingeha her cûre ragihadina gotinî axaftin e (Ong, 2020: 17). Di vê peywendê de kifşkirina nivîsê her çî qas wek cûreyekî nû yê ragihandinê derketibe holê jî, nikare cihê gotinê bigire.

Ong îdia dike ku tu kes nikare diyardeya ku ziman xwe dispêre deng înkare bike (Ong, W. r. 19). Helbet sedema mezintir ya ku ragihandina gotinî li hember nivîsê dide jiyandin jî xwezayîbûna axaftin e; lewra axaftin amûra me yî kevintir yê ragihandinê ye. Gotineke pêşiyana a kurdan dibêje, gotinên pêşiyana nexşa li ser keviraan e. Ev hevok tîkiliyeke heyatî ya di navbera gotin û nivîsê de îşaret dike; li aliyekî rastî û tekûziya gotinên pêşiyana, li aliyê din jî derbasdariya wan a demî ku ew jî bi nivîsê pêkan e, lewra nivîs mayînde ye. Ev retorîka devkî/gotinî mayîndebûna/neguhêrbarbûna nivîsê bi awayekî bêpayaan îfade dike û gava vê dike jî amûra ragihandinê gotin bi xwe ye. Di eslê xwe de gotinên pêşiyana mijareke çanda devkî ne, lêbelê wek paradoksekê ji bo girîngiya vê babetê nivîs hatiye mînakdayîn. Her çî qas nivîs îmkana zêde jî biafrîne, gotina ku tê bidengkirin hê cihê xwe diparêze (Dursun, 2017: 313) Ji bo ku metneke nivîskî armanca xwe vebêje yekser an neyekser hewcehiya wê bi zimanê ku qada wî girêdayî deng e heye. Di vê peywendê de jî Juri Lotman nivîsê girêdayî zimanê axaftinê dibîne lewma jî Ong wê wek “pergala duyem a teşedanê” pênase dike (Ong, 2020: 20).

Wek tê zanîn lêkolînên li ser deng/gotinê li gor yê nivîsê bi derengî ketine û ancax bi berhevkarîya berhemên folklorîk dest pê kirine. Nivîs li gor gotinê meteryalekî şênbertir e û ji bo lêkolînê hin hêsaniyê wê jî hene. Ji bo lêkolînên li ser nivîsê ne hewceye ku hûn derkevin qadekê yan jî heremekê; hûn dikarin vî karî di malê de bi tena serê xwe, bêyî ku hûn bi kesên sêyem re alaquadar bibin, bikin. Di heman demê de nivîs karekî bi mesref û entelektuelî bû û tenê tiştên bi qîmet derbasî nivîsê dibûn lê li hember vê rewşê, gotina ku li hember nivîsê kevna bû û têrî çandêke manewî bû ne hêjayî lêkolînê dihat dîtin. Sedema vê derengmayîne girêdayî tîkiliya qewîm a di navbera dinyaya lêkolînê û nivîsê de ye. Lewra fikirîn, di çandên bingehin yê devkî de jî, ji aliyekî ve analîtîk e. Lewra ji aliyê teknîkî ve nivîsandina nivîsê rêya tomarkirina û berhevkirina agahiyan daye bidestxistin (Kanca, 2020: 537) bi xêra vê tevgera fikirînê, yekeyên ku kereseyan pêk tînin ji hev cûda dike. Lêbelê analîzkirina bûyer an jî rastiyên razber, sentagmatîk, senifandin û ravekirina ku tînan pêşniyazkirin bêyî zanîna xwendin û nivîsandinê pêk nayê (Ong, 2020: 21).

Ong, çandên ku haya wan ji hebûna têgihên wek nivîs û çapxaneyê jî tuneye û ragihan tenê ji zimanê axaftinê pêk tê wek “çanda devkî ya yekem” diwesifîne. Lêbelê berevajî vê wesfa devkî ya telefon, radyo, televîzyon û amûrên din yên elektronîk ku bi teknolojiyeke pêşketî beşdarî jiyana me bûne, ji ber ku hilberî û erka wê di serî de ji nivîs û metnan derketiye û dawiyê jî veguheriye zimanê axaftinê “çanda devkî ya duyem” pêk tînin (Ong, 2020: 23, 24).

Xebatên di derbarê çanda devkî de di çarçoveya “pirsgirêka Homeros” de destpêkirin. Niqaşên li ser Îlyada û Odesseia heta serdema antîk diçin lebelê pirsgirêka ku wek “pirsgirêka Homeros” tê binavkirin çawanî û kamiliya xwe di sedsala 19an de bi dest xist. Gelek lêkolîner di vê pevwendê de li ser destanên Îlyada û Odyseia lêkolîn kirin. Di serdema antîk de yên ku bi wêjeyê re mijûl bûbin, car caran tê gihastine ku destanên Îlyada û Odesseia naşibin helbestên Yewnan û çavkaniya wan ne diyar e. Bo nimûne di dema Cicero de du metnên Homeros ku hatine xwendin dihat îdîakirin ku ji aliyê Peisistratos ve hatine sererastkirin. Josephus jî îdîa dike ku Homeros bi xwendin û nivîsanidê nizane (Ong, 2020: 31).

Di sedsala 17. de François Hedelin berpêş dikir ku honaka bûyeran ya van destanan gelek xerab hatiye şixulandin, leheng nekemilîne û berhem li gor dîn û ehlaq çep in, di heman demê de îdîa dikir ku ev destan rêze “rapsodi” ne û ji aliyê hin kesên din ve hatine berhevkirin û kesê bi navê Homeros jî navekî bêbînî ye. Her wiha Îtalyan Giambattista Vico (1668-1744), ku felsefevanê dîrokê ye bawer dikir ku kesekî bi navê Homeros qet nejiyaye, lêbelê destanên Homeros berhema hevpar ya çivaka gelan e (Ong, 2020: 32).

Teorî û gumanên li ser Homeros û berhemên wî heta dîplomat û arkeologê îngilîz Robert Wood ku cihên di Îlyada û Odyseia de derbas dibin yek bi yek peyîtand, bi awayekî gurr domand. Wood, ji xwe bawer bû ku Homeros bi xwendin û nivîsandinê nizanibû û destan jî tenê bi xêra bîra xwe ya hêzdar afirandibû. Tespîta Wood ya ku balê dikişîne, cûdahiya di navbera çandên devkî û nivîskî de ye, ku bîr di çandên devkî de li gor yên nivîskî girîngtir e (Ong, 2020: 32). Lewra civakên ku gotin li ba wan yekane amûra ragihandinê ye ji bo parastina çanda xwe manewî û veguhastina wê bo nifşên nû bîr, rola arşîveke devkî dilîze. Aydogan, radigihîne ku mirov, bi awayekî xwezayî tim bi serboriyên xwe re dijî û rabirdûya xwe bi xwe re tîne. Xwesteka şîroveya dema niha û ravekirina dema bihurî, bûyerên rabirdûyê û yên niha dibin bingeha zimanê wî, çanda wî, dîroka wî, xewnên wî û ya soxî bîra wî (Aydogan, 2014: 25). Ji ber ku civakên nexwende ne xwedî kamera û amûrên tomakirinê an jî materyalên nivîsê ne; ji bo ku ji bîr neçin, serpêhatiyên ku hatine serê wan bi hêza bîrê ew

parastine û bi pêvekên nû û şîrovevên awarte (gurza Ristemê Zal, hespê Memê Alan, bêhemtabûna bajarê Mixurbê, Qonaxa Celaliyan, Kaniya Qeselê, serweriya bêdawî ya Mîrê Cizîrê, lehengî û camêriya Tajdîn) ew bi hêz kirine. Gava ev kirine jî heta ku ji destê wan hatiye nehîştine ku ji mijara navendî, karaktêr û mekanên ku di serpêhatiyê de derbas dibin bi dûr bikevin û peyama ku di van serpêhatîyan de tê ravekirin xera bikin. Di vê peywendê de hin çîrokên girîng ji bo veguhastina rastiya wan a dîrokî ji aliyê guhdarvanan ve were erêkirin xwedî karaktêr, mekan û ramanên hevpar in.

Milman Parryê ku “pirsgirêka Homeros” çareser kiribû rêyeke çawa şopandibû, wî ji serî ve dest pê kiribû yan xebatên berê yên bi vî rengî hebûn? Wek ku Ong dibêje, xebata Parry a di sala 1920an de rêgeza neguhêrbar a peyv û hîlbijartina teşeyê peyv an di helbestên Homeros de [ên ku bi awayê devkî pêk tînin] pêgira kêşeya ristan a heksametrik¹ berê di lêkolînên J. E. Ellendt û H. Düntzer de hatibûn nîşandan. Di çandên devkî yên modern de binyata helbestan ya qalibgirtî Arnold van Gennep amaje kiribû, û M. Murco jî amaje kiribû ku di van çandan de helbestên devkî her cara ku bihata gotin peyv bi peyv dihate ragihandin (Ong, 2020: 34).

“Peyv û hîlbijartina teşeyê peyv an pêgirê kêşeya heksametrik e”, yanî Homeros ji bo lihevanîna risteyan peyvên hemwate bi kar dianî. Düntzer diyar dike ku ev metod ji bilî cûdahiya wateyê ji bo kêşeya risteyê li hev bê hatiye hîlbijartin (Ong, 2020: 35). Ev metod her çi qas jî bo helbestvanên ne baş handîkapek be jî, ji helbestvanên wek Homeros ku bîra wî mîna ferhengyekê têr û tîjî bû ne dijwar e. Ev nîşan dide ku Homeros serdestî çanda gelê xwe ya devkî bû û dîtina peyv an ji bo wî ne karekî dijwar bû.

Bi kifşkirina Parry re hat pê hisandin ku di bîra hozan de jî xizneyeke wek ferhenga têgehî (pirtûkên şêwazê) hebû û ji vê xizneyê qalib bi qalib dûbare kiriye. Yanî Homeros perçeyên ku berê hebûn yek bi yek bi hev ve kiriye û Ong, gavekê zêde pêde diçe û ji bo vî karî Homeros dişibîne “karkerekî montajê” (Ong, 2020: 36).

Bikaranîna “qalibên standart” wek ku me berê jî got karê helbestvan hêsan dikir. Ev qalibên ku di berhemên çanda devkî de cih digirtin ji aliyê lêkolîneran ve wek klîşeyekê û hêsanîyekê dihatin dîtin û ev rewş serdemeke dirêj domand. Bi vî halî jî di serdema Homeros de ji bo çanda Yewnanî şêwazên qalibî bi qîmet bûn, ne tenê helbestvan, dinyaya fikirînê ya devkî jî ji heman qaliban îstifade dikir. Sedema vê ya herî mezin jî, agahiyên ku tên bi destxistin û hînbûn ji bo ku neyê ji bîr kirin û wînda nebin her tim dûbare pêwîst bû (Ong,

¹ Risteya ku ji şeş bi pênên ku ji kiteyek dirêj û duyên kurt pêk tê. –*n.w.*

2020: 37, 38). Lewma jî vebêj tim û tim di berhemên xwe de (berhemên gelêrî) serî li gotinên pêşiyar, dubare, bikaranîna li ser hev ya peyvên hemwate, biwêj, dubareya hejmaran û wd. dide.

Agahiyên/bûyerên kompleks û dirêj bi awayekî zelal û herîkbar di bîra mirov de cîh digirin. Mêjiyê mirov li hember aloziyên jiyanê metodeke wisa ya xebatê diceribîne, ku bi vî awayî mijarên herî tevlîhev jî bi rengekî hêsan di mêjiyê mirov de xêz dibin. Wek me berê jî got di çandên devkî de çavkaniya agahiyan bîra mirov e. Ong diyar dike ku teorema “tiştên ku tu bi bîr tînî, tu dizanî” di çandên devkî de jî derbasdar e (2020: 48). Civakên ku nivîsê bi kar tînin ango xwende ne, gelek amûrên ku vê bîranînê hêsan dikin hene, her wiha tiştên ku ew bahs dikin an jî bi bîr tînin di serî de derbasî nivîsê bûne û hatine amadekirin. Lê kesên ku di çanda devkî de dijîn ji van derfetan bêpar in, wê demê kesên ku di çanda devkî de dijîn çawa bi bîr tînin? Gotinên pêşiyar di vî warî de mînakên baş in. Gotinên pêşiyar ji aliyê wateya xwe ya kûr ve kurtehevokên pîrsgirêkên dirêj û tevlîhev in yên ku di jiyana mirovan de rû didin. Ev derbirînên ku aîdê bîra civakê ya hevpar in bi awayekî xwerû xwe dispêrin tecrûbeya jiyanê. Bo nimûne di civaka kurdî de li ser demsalan gelek gotin hene, tê fahmkirin ku gelek caran hatine ceribandin û çavdêrîkirin; “kerê ker jî dizane di sersalê de ro dirêj dibin (li gor salnameya kurmancî/hîcrî)”, “adarê berfê da guliyê darê, nema danê êvarê”, wek ku ji van hevokan jî tê fahmkirin çavdêriyeke dûdirêj heye ji bo bidestxistina van agahiyan. Her wiha gotinên pêşiyar, kurtewateya civakê ne ku agahî û serboriyên ku di hemû ji jiyana xwe de bi dest xistine û gelek caran di bin bandora heman serpêhatiyar de mane. Di çandên devkî de, ev derbirînên ku ji aliya wateyê ve xurt û bandordar in car caran ji bo ravekirina bûyereyêke dirêj serî li wan tê dayîn, wek ku Ong jî diyar dike carina ev cûreqalib ji bo çareseriya bûyereyê erka dadgehê bi cîh tînin (2020: 51). Bikaranîna van hevokan ji aliyê kesekî zana ve mîna biryara dadgehê bi bandor e. Peyva helbestvan di hin civakan kevnare de dewsa kesê zana digirt (Kanca, 2020: 539).

Li gor Ong, divê fikir ji ahengê, dubareyên hevokêş an jî bi antîtezên wê, bi lihevhatina dengdêr û dengdarên di peyvê de, qalibên ku herkes tim û tim dibihîze û bi hêsanî bibîr tîne, gotinên pêşiyar yên ji bo ku bi hêsanî werin bîranîn hatine teşekirî, pêk were û bicîhkirina hin mijarên eşkere. Neçariya bihêzkirina heş, hevoksaziyê jî bi merc dike (2020: 49, 50). Armanca bicîhkirina van hemû hêmanan di helbest, kilam, destan û wd. de, hêsanîkirina bibîrxistinê ye, lewra di çanda devkî de ji bilî heş tu amûrên tomarkirinê tune ne û bûyereke dirêj û tevlîhev jî ancax bi vî awayî dikare di heşê guhdarvanan de zelal bibe û were parastin. Di encamê de bibîrxistin teqlîda tiştêkî dihewîne, dibe ku bi şêwazeke nû û afrîneriyeke nû ev

mijar hatibe vejandin jî (Mem û Zîn, Yûsûf û Zleyxa, Mewlûd û wd. ku di rojhilata navîn de ev cûre gelek berbelav in).

1.1. Taybetiyên Çanda Devkî

Ong, neh taybetiyên çanda devkî tespît dike ku ev taybetî derbirîn û fikrîna ji tradîsyona devkî der tî. A yekem 'ji dêvila hevoka pêreyî, pêvekirin' e (Ong, 2020: 53). Li gor vê taybetiyê di çandên devkî de rola gihanekan pir girîng e, nemaze jî ya 'û'yê. Ev bikaranîn, teşeyeke helbestkî, muzîkal û herîkbar dide vegotinê. A duyem 'ji dêvila dahûrînê komkirin' e. Ev tabetî ji bo xurtkirina heş îstîfadekirina ji qaliban guncav dibîne. Fikrîn û hêmanên vegotinê yê girêdayî gotinê bi tena serê xwe tu wateyê îfade nakin; bi kombûna têgînên hemwate an jî diwate, şêwaz û girdeyan gotin çawaniya temamkirinê pêk tîne (Ong, 2020: 54).

... bejn zirava, çepil dirêja, porkeja, nav qendîla xwe da ne pêşiyê gemar û miskînya, dêkotîya xwe dane dawîyê, (Güneş, Şahin, 2019: 536)

Wek ku di vê mînakê de jî xuya dike, vegotin hem bi hemwateyan hem jî bi diwateyan hatiye xurtkirin. Ji bo îfadekirina xweşikiyê peyvên nêzî hev hatine bi kar anîn. Şakiro di gelek kilamên (Emro, Wey Dil, Nêçirvano û wd.) xwe de ji bo teswîra xweşikahiyê heman hevok hilbijartîye (Güneş, Şahin, 2019: 536, 311, 415) ku ev bijartin di çanda devkî dibê qalibekî ku hem vegotinê hem jî heş xurt dike. Her wiha armanca vê komkirinê parastina kirdeyê ye ku ji bo vê teswîrê minasib hatiye dîtin. Di çandên devkî de vebêjer her tim balê dikişîne têkiliya navbera kirde û rengdêrê (Bekoyê Ewan, Zîna Zêdan, Memê Alan, Mîrê Cizîra Botan, Qere Tajdîn), di vegotinê de gelek caran ev dubare xwe nîşan didin, di vir de jî armanc parastina van kirdeyan û taybetiyê wan e. Ongê ku wek taybetiya sêyam ya çandên devkî dijmêre 'dubareyên pir û bi ber' e. Vegotin bi van dubareyan hem plana vê pêvajoyê xêz dike hem jî bala guhdarvanan dikişîne ser bûyerê.

Veguherîneke ji binî ve ne hêsan e. Di çandê devkî de agahiyên ku bi diwarî hatine bidestxistin û bi salan hatine veguhastin ji binî ve naguherin û ev agahî bi xêra jiberê ji windabûna tî xelaskirin. Û bi xêra vê kevneşopî tê avakirin. Di vê peywendê de di çandên devkî de nûjentî û teşebusa ceribîna fikrî tî astengkirin. Lêbelê, wek ku Ong destnîşan dike çandên devkî di şêwazê xwe de ji afrîneriya resen ne bê par in. Lê ev resenî ne ji ber xwe ve gotina çîrokekê ye, di pêvajoya vegotinê de tevîkirina guhdarvanan a nav vegotinê ye (Ong, W. r. 58) Çîrokbêj her cara ku dest bi çîrokê dike bi şêwazeke û kelecaneke nû vegotina xwe

didomîne û bi vî awayî her tim kelecana guhdarvan zindî dihêle. Heta carina guhdarvan tevî vegotinê jî dibe û temaseke piçûk li herikîna bûyeran dike.² Ev tîkiliya beramber a di navbera vêbêjer û guhdervan de bi demê re dibe ku afirîneriyeke siruştî pêk bîne. Çirok bi vî awayî, bi danûstandina fikran diguherin. Jixwe guhdarvan hay ji çîrokê heye, ev ne çîrokê ku hilibijartina wan bi awayekî tesadûfî hatiye kirin, guhdarvan jixwe li hêviya van çîrokan e (Sanders, 2016: 15)

1.2. Di Çandên Devkî de Jiber

Di veguhastina çanda devkî de rola jiberê gelekî girîng e. Bêguman ku ne ji jibera guhdervanên baş bûna ev çand ew qas sal li ser piya nedima û nedigihaste roja me. Kî dizane û tu delîl jî di destê me de tune ne bê ka çî qas destan, helbest, kilam û wd. di pêvajoya dîrokê de ji ber nebûna guhdarvanên baş an jî bi gotina Ong, berdestkên baş hatine jibîrkirin. Lêbelê jibera di çandên devkî yê yekem û duyem de wek hev in gelo? Ong vê wek 'na' dibersivîne. Di çanda nivîsê de jibera peyv bi peyv bi gelemperî ji metnekê tê kirin û ev jiber bi xêra metna heyî dikare were kontrolkirin jî. Lê di serdemeke ku hay ji tomara deng tune de dê çawa ev rêbaz were kontrolkirin, ne diyar e (Ong, 2020: 75). Destaneke ku di civateke giran de hatibe gotin dibe ku ji aliyê çend kesan ve hatibe jiberkirin, lê dê çawa were kontrolkirin, bê kîjan wek ya resen e? Ligel vê di demên cûda de di destana resen a ku ji aliyê heman degbêjî ve hatibe gotin jî li gor divêtiyên serdemê û şertên jiyanê guherîn pêk tên. Ev taybetiya xwezayî ya vegotina devkî ye. Gava em li guherînan ku di jiyanê mirovan de pêk tên û zimanê ku xwe adapteyî van guherînan dike, bifikirin em ê bibînin ku ev pêvajoya guherîna misoger e. Hem şertên jiyanê hem jî zimanê ku ro bi ro diguhere û bi bihîstina vegotîneke nû xwe dewlemand dike pêşengiyê li vê guherîna dîkin. Her wiha wek me li jor jî destnîşan kir civakeke ku ji nivîsê û amûrên tomarkirinê bêpar in dê çawa ragihandîneke bêqisur pêk bînin? Hele ku ev berhem li gor rêzikên wêjeyî yan jî li gor fikarên estetîk hatibe afirandin.

Bi xebatên Milman Parry yê li ser Îlyada û Odysseîayê hatibû fahmkirin ku ev berhem malê çanda devkî ne. Bêyî ku hozan bi hezaran risteyan peyv bi peyv jiber bike, ev serkeftin deyndarê xizneya qaliban ya di bîra wi de bû. Ji bo her rewşê û guherîna qalibek di bîra hozan de heye. Hozan ew qas di derbarê çanda devkî de serwext e ku ji bo dîtina peyv

²Di destana Memê Alan de gava ku denbêj behsa hevdîtina yekem a Mem û Zînê dike, piştî axaftîneke dirêj, gava ku dê Zînê here ser nivînan Memo guhdervan gotina dengbêj dibirin, hew sebir dîkin û berî dengbêj bibêje Zînê dibin ser nivînan Memo.

tevdana heş têra wî dike. Ji bo babetên standart qalibên standar dihatin bikaranîn. Armanca vê hem hêsankirina hînkirinê hem jî ya bibîrxistinê ye (Ong, 2020: 77, 78). Bo nimûne di berhemên çanda devkî yên kurmancî de çend taybetiyên keçên xweşik hene ku her tim tên dubarekirin, heta ev wek pênaseyekê jî dixuye, keç yan jî jinên xweşik; çepil dirêj, bejn zirav û târihan, qirikqaz, çavxezal û wd. in. Ji bo dengbêj ragihandina şerê du kesan (gava du kes werin hemberî hev, navdihevbidin û hev sor bikin) bi qalibên standart yên ku di heşê wî de amade ne pêk tê. Kes ji kirina karekî teqez, nemaze jî ji bo babetên girîng li ser telaqan (bi sê telaqê jinberdanê) sond dixwin. Ev derbirîn ji bo çanda devkî hêmanên gelek girîng in.

Bandoreke nepenî ya civakê li ser bêjer heye, carina qada vegotinê li wan teng dibe. Ji ber vê sedemê, derneketina ji derbirîneke ji rêzê carina ji bo dengbêj xetereyek mezin pêk tîne. Dengbêj bi awayekî eşkere di bin xwestekên civakê de ye û li gor van xwestekan destan, klam, çîrok û wd. tevî repertuara xwe dike yan jî li erdê dihîle û dewam dike. Peyv bi peyv were dubarekirin an neyê dubarekirin jî, her jibera devkî di bin fermana civakî ya neyekser de ye. Hozan, destan an çîrokên ku civak dixwaze bibihîze û bi bêhnfirehî guhdar dike, vedibêje. Lewma jî çîrok, destan û wd. ku nekevin bin meyla vê xwesteka civakî tên ji bîr kirin. Bi gelemperî em nav, jiyan û hevalnavên lehengê ku di şer de serfiraz bûye dizanin û çîroka van kesan tê gotin, û bi xêra van kesan em navên yên têkçûyî dibihîzin. Ong vê wek kitekita binemalê pênase dike û li gor wî bi gelemperî kitekita binemala ku bi ser ketiye temendirêjtir e (Ong, 2020: 85). Wek ku tê zanîn gelek dengbêj di qesr û qonaxên mîran de dengbêjtî kirine, ku bi vî awayî hem dabara xwe kirine hem hatine parastin hem jî derfeta wek pîşe dengbêjtî bi destê wan ketiye (Gürer, 2014: 48, 49). Bi xêra vê têkiliyê dengbêj bi awayekî xwezayî di klaman de pesnê patronê xwe didin. Cihê ku dengbêj lê disekine di derbarê yên serkeftî û desthilardar de me agahdar dike.

Carina guhdarvan mudaxileyî kitekitan (navê lehengên alîkar, cih, rêzavegotina bûyeran an jî bûyer piçûk) dike yên ku ji aliyê dengbêj ve hatibin jîbîrkirin an jî di ser wan re hatibe derbaskirin.

1.3. Metodên Parastina Agahiyan di Heş de

Di çandên devkî de bi qasî afirandinê parastina vê afrîneriyê jî girîng e û gelek hêmanên bingehîn yên berhemên devkî li gor vê bingehê hatine dîzaynkirin. Ev hêman, bi armanca hêsankirina bibîrxistina xwedî hin taybetiyên in. Ew tiştê di binyata çîrokê de ku V. Propp wek erk (kiryarên kesekî) binav dike hêmanên neguherbar yên vegotinê ne ku di çîrokan de leheng van kiryaran digirin ser xwe (Kıran. 2007: 169). Di çîrok û destanan de

lehengên ku xwedî taybetiyên derasayi ne bi hêsanî ji bîra mirovan dernakevin lê beravajî vê yê pasîf û çilmisokî ji heşê mirovan difirin û diçin. Lewma jî wek ku tê gumankirin ne ji ber bandora romantîzmê an jî xizmeta armancên hînkerî, ji bo parastina bîranînên bûyeran, ji şixulîna xweser ya xêva tradîsyona devkî, lehengên derasayî derdikevin (Ong, 2020: 88). Leheng bi xêra teybetiyên xwe di bîra mirovan de cih digirin, ewaniya Beko, zîrektiya Memo (hê di çardeh saliya xwe de xetm kirina Tewrat, Încîl, Zebûr û Quranê), Bozê Rewan, Mîrê baqil, Tajdîn, Heso, û Çeko ku çêlikê şêran in. Her wiha ev ji bo çîrokan jî derbasdar e, Mîrze Mihemeyê piçûkê biran û yê herî baqil, teyrê Sînbeg (Sîmûrg) bi heman taybetiyan hatine dorpêçkirin.

Di tradîstona devkî de hejmar jî roleke girîng dilîzin. Ev qalibên hejmarî hem vegotina devkî xurt dikin hem bibîrxistinê hêsan dikin. Wek nimûne di destpêka destana Memê Alan de şayesandina bajarê Mixribê li ser hejmara hatiye avakirin:

“Bajarê Mixribê bajarekî ezîm î pir giran e

Li ser heft çiyane

Li ser sê sed û şêst qapiyan e

Her qapîkê li ser sê sed û şêst û şeş walîlixan e

Her walîlikê li ser sê sed û şêst û şeş midirlixan e” (Lescot, 2013: 25)

Di çîrokên kurdî de jî ev qalib gelekî berbelav in, di gelek çîrokan de em dikarin li wan rast werin. Bo nimûne, çil bira, sê bira, xwişka heft birayan, sê roj û sê şevan, çil roj, hîva çardeh şevî û wd. di vê mijarê de mînakên herî berbelav in. Ev qalibên hejmarî ji bo bibîrxistina nixê civakê jî di çîrokan de hatine bicîhkirin (Demir, 2015).

Çîrok³

Ji cureyên herî berbelav yê vegotina folklorê kurdî yek jê jî çîrok in. Ji ber berbelavbûna dereng ya nivîsê û amûrên teknolojiyê di nav kurdan de danîşanên çîrok û çîrokbêjîyê heta roja me jî bi xurtî di nav jiyana kurdan a rojane de xuya dikin. Her wiha wek encama vê dewlemendiyê navê çîrokê li gor gelek hereman ji hev cûda dibe. Wek hemwateya “tale”ya îngilîzî, “marchen”a almanî, “masal”a tirkî de, di kurdî de nêzikî 20 navên çîrokê di

³ Di vê xebatê de me têgiha çîrokê hîlbijart lewra ji hemû hemwateyên xwe berbelavtir e û kêma zêde literaturek bi vî awayî hatiye avakirin.

nav kurdan de hatine bikaranîn. (Çîrok, çirçironik, dastan, xeberoşk, çêrçerok, çîronk, çîvanok, qewatî, be ser hat, meselok, xeberoşk, çîrvanok, çîrçîrok, serborî, metalok, kurteçîrok, xemisok, mesel, serpêhatî, hîkaye) (Tanrîkulu, 2017: 16).

1.1. Kêşeya Senifandinê û Hewldana Pênaseya Çîrokê

Wek me di mijara çanda devkî de jî destnîşan kir; senifandin, karê çandên duyem ên devkî ye. Piştî ku folklor wek dîsîplîneke ilmî û serbixwe berbelav bû pîrsa pênasekirina cureyên folklorîk derkete holê. Pîvana jihevçûdakirin û senifandina van cureyên folklorê çi ye gelo? Alan Dundes diyar dike ku heta hemû cureyên folklorê bi awayekî nûwaze neyên pênasekirin folklor tu carî bêkêmasî nikare were pênasekirin (Dundes, 2006: 40). Ev ravekirina ku dişibe cureyek enduksiyonekê, ji bo têgihîştina berfireh ya folklorê pênaseya cureyên wê ya tekûz şert dibîne ku hêj jî di destê me de pênaseyeke berfireh û hemûgir ya ku “çîrokê” bi temamî bide naskirin nîn e. Lewma jî ji bo pênaseya folklorê ji serdemên kevnare ve zanistê dest bi kategorîzekirinê kiriye. Li gor Richard Bauman, “cure awayekî pêşkêşkirinê ye ku bûye wek kevneşopiyekê”, ev têgih di serî de ji bo senifandinê hatiye bi kar anîn ku armanca vê jî ketegoriyên wek helbest, destan, nituq, gotar ku ji hev cûda ne sererast bike (Bauman, 2006: 109). Bêguman pêvajoya navlêkirinê ya mirovatiyê ku bi axaftinê re dest pê kiriye bi nivîsê re derbasî merheleyeke cûda bûye û divêtiya senifandinê bi awayekî ilmî derketiye holê. Dan Ben Amos berpêş dike ku peyvên wek mît, çîrok, efsane, gotinên pêşyan, mamik ku berhemên sereke yên folklorê ne wek îngilîzî di hemû zimana de hebûn lê ev têgihên ku pêşî di cureyên folklorê de bûn ji nîşandêreke teorîk bêpar bûn û peyvên jirêzê yên zimanekî bûn û diyar dike ku ev peyv tenê ji bo têgihîştina senifandina tradîsyonê dihat bikaranîn. Piştî ku folklor wek zanistekê peyda bû xebatên ku li ser keresteyên wê hatin kirin, bi awayekî xwezayî (ji ber sedema têkiliya nivîsê bi fikrîna re) hewcehî bi senifandina cureyan dîtin û ew li gor mijar, şekl, naverok, fonksiyon û wd. senifandin (Gümüş. 2015: 7).

Wek ku Alan Dundes jî diyar kiribû kêşeyên pênaseya folklorê ji bo çîrok û cureyên din yên folklorê jî derbasdar in. Her wiha li gor wî materyalên zanîna gel li gor pîvanên ku ji derveyî qadê bînan nîkarin zanîna gel pênase bikin (Dundes, 2006: 40). Lewma jî ew ji bo pênaseya zanîna gel/folklorê pergala vehûn, metn û kontekstê dirust dibîne. Li gor Dundes, bîyî van her sê hêmanan cureyekî gelêrî nikare were pênasekirin (Dundes, 2006: 41). Metin Ekici jî rêbazeke nêzî wê destnîşan dike. Ekici ji bo peywend û metnên ku di peywendê de pêk hatinê û pênaseya komên ku ji aliyê metnan ve hatine kirin di çar hêmanan de xulasa dike; “Afrîneriya Metn û Taybetiyên Peywenda Veguhastinê, Taybetiyên Metn yên Şekl û

Binyadî, Taybetiyên Naverokê/Mijarê, Taybetiyên Fonksiyona Metn” (Gümüş, 2015: 8). Ji bo pênaseyê ev hêman hem metn hem jî çand û civaka ku metn lê hatiye avakirin dike bingeh. Lewra ev hêmanên ku Dundes û Ekici destnîşan dikin amûrê sereke ya afrîneriya gel, yanî ziman û taybetmendiyên ziman ji bo wergerê sedî sed îmakanê nadin. Di heman demê de metn û kontekst jî li gor çandê reng digirin. Wê demê pênaseya çîrokekê dê têrê neke û nikaribe bibe pîvan û vê pîvanê bi awayekî gelemperî bide qebûlîkirin ji bo pênaseyeke berfireh.

Max Luthi, diyar dike ku beriya derçûna çîrokê wek têgihek modern, çîrokên gel yê Ewrûpî, bi lêçûnên wek derasayî û derrastî bi efsane (Sage), menqîbe (Legend), mît (Mythus), fabl (Fabl), pêkenok (Schwank) û wd. bi hev re dihatin nirxandin (Luthi. 2006: 220). Ev nêrîn di derbarê navlêkirina dewlemend ya “çîrokê” kurdî de jî dikare fikrekê bide me. Gelo dibe ku di navbera (Çîrok, çirçironik, dastan, xeberok, çêçerok, çironk, çîvanok, qewatî, be ser hat, meselok, xeberok, çîrivanok, çîrçîrok, serborî, metalok, kurteçîrok, xemisok, mesel, serpehatî, hikaye) ew qas nevlêkirinê “çîrokê” de ji aliyê şewaz, mijar, teşe û wd. ve cûdahiyek hebe? Ne hemû bin jî di van pênaseyan de dibe ku çend heb jê ne pênaseya heman cureyê bin. Lewma jî bi kurtasî, ji bo cûdahiya van cureyan me xwest ku “çîrok” û “serpehatiyê” bidin ber hev. Lewra di hin “çîrokan” de û di pêvajoya berhevkariyê de li gor çavdêriya me delîlên cûdahiya van cureyan peyda dibin.

Di pêvajoya berhevkariyê de çîrokbêje bi navê M. Sadiq gava ku me jê xwest ku çîrokekê bibêje got, “Ez ê çîroka Zîvkerê Misrê ji te re bibêjim, ev serpehatî ye, hatiye serê însanan.” Wek ku ji vê hevokê jî diyar dibe, çîrokbêj ji ber ku dizane “çîrok” derew in dixwaze vegotina xwe bi kirasê “serpehatiyê” zexm bike. Her wiha bi vî awayî bawer jî dike.

Pertev Naili Boratav ‘çîrokan’ wek du cureyên ji hev cûda dibîne; çîrok û serpehatî.⁴ Û du karakterên bingehîn yê çîrokan destnîşan dike ku yek jê bûyerên ku di çîrokan de bilez bi cîh tîne navgîneke bandordar a çîrokê derdixe holê û ya didoyan jî diyarkirina demê ye ku ji aliyê çîrokbêj ve ji bo guhdarvanan tê ravekirin ku ev bûyer aîdê demê berê ne (Boratav, 2014: 46). O. Spies di pirtûka xwe de behsa pênc taybetiyên hevpar yê çîrok/masal û serpehatiyên/halk hikayeleri dike ku bi vê xebatê îdîa dike ku çîrok û serpehatî heman tişt in. Ev taybetî; welatên lehengan yê çîrokan in, nav bi gelemperî ne ew nav in ku gel bi kar tîne, leheng xwedî teybetiyên derasayî ne û di navenda bûyeran de ne, leheng her tim yek e yanî

⁴ Me ji bo (halk hikayesi) têgiha ‘serpehatî’ çêtir dît û ji bo (masal)ê jî jixwe têgîna çîrok berbelav e. Lewra di encama berhevkariya çîrokan de me dît ku bi navê ‘serpehatî’yan di çîrokan de bûyerên li gor yê çîrokê rasttir derbas dibin. Boratav jî di senifandina *masal* û *halk hikayeleri* de vê destnîşan dike.

yan kurek an keçek tenê ne, hemû leheng xwedî heman taybetiyan in (temen, xweşikahî). Boratav diyar dike ku ev taybetî di gelek serpêhatiyan de heyî ne, lê belê ne di hemûyan de. Di heman demê de diyar dike ku em nikarin van taybetiyan bi tevahî wek taybetiyên hemû çîrokan bihesbînin (Boratav, 2014: 47).

Fikrên O. Spies yên di derbarê çîrok û serpêhatiyan de ji aliyê H. A. Ficsher jî tên rexnekirin. Li gor wî çîrok û serpêhatî bi tevahî ji hev cûda ne; “xwîner, vegêr û guhdarvanên serpêhatiyan xwedî helwesteke subjektîv in”; her wiha di çîrokan de bûyer bi tevahî li derdora derasayîbûnê derbas dibin û derasayîbûn li ber çavan e lê jiyana rastîn wek xemlekê di çîrokê de cih digire. Lêbelê beravajî vê di serpêhatiyan de jiyana rastîn li ber çavan û derasayîbûn wek xemlekê xuya dike. (Boratav, 2014: 48). Wek ku li jor jî hat diyarkirin; ji ber ev cure sedî sed bê kêmasî nehatine pênasekirin em ê nikaribin qenaetê berfireh ya jihevderxistina van cureyan peyda bikin, lewma jî Boratav pirsê diyar dike divê li ser serpêhatiyan yeko yeko lêkolîn were kirin (Boratav, 2014: 48).

Ev rêgezên ku ji aliyê H. A. Ficsher ve hatine diyarkirin di xebata me de jî derdikevin holê. Nemaze jî çîrokeke (Çîroka Leglegê) ku sê heb serpêhatî têde derbas dibin ji bo lihevhatina van rêgezan mînakeke baş e. Di çîrokê de yekane kurê malê ji aliyê jinbava xwe ve bi sûcê destavêtina namûsa wê tê tawanbarkirin. Ji ber vê sedemê jî bavê wî dixwaze kurê xwe bikuje, lêbelê sê hevalên kurik yê feqîtiyê ji ber ku bi eslê meseleyê dizanin şevê yek tê mêvantiya bavê wî û bi gotina serpêhatiyekê dixwaze bêgunehiya kurik derxe holê. Bi serpêhatiyê tiştê ku di çîrokê de dixwaze bê gotin an jî kirpandin; rasteqîna jiyane ye. Ango di jiyana rastî de bûyerên bi vî rengî rû didin an rû dane û ew dikarin bibin mînak ji bo guhdarvanên serpêhatiyê. Her wiha her sê serpêhatî jî li ser poşmaniya serlehangên wan in ku piştî bûyerên trajîk ev poşmanî diqewime. Peyama van serpêhatiyan ji bo lehengên çîrokê ji aliyê vegêr ve bi eşkere tê kirpandin da ku bavê wî dev ji kuştina wî berde. Di vê çarçoveyê de wek ku Ficsher jî destnîşan dike asta rasteqîniya bûyerên çîrok û serpêhatiyê eşkere dibin. Bûyerên ku di çîrokê de diqewimin hê ji destpêkê ve xwedî derasayîbûnekê ne, lêbelê serpêhatî ji bingeheke rastî derdiçin û derasayîbûn tenê cihekî piçûk digirin. Boratav diyar dike, çîrokbêj ji bo serpêhatiyan dibe ku ji çîrokan di nav gel de îstifade kiribe û dibe ku şewaza çîrokê ji serî heta dawîya serpêhatiyê li dar be jî, lê bûyerên çîrokan li gor teknîka serpêhatiyên gel tên şixulandin û bi vî awayî jî çîrok dikeve dirûvê serpêhatiya ku xwe di çanda devkî de bi tevahî dide nîşandan (Boratav, 2014: 49).

Remezhan Alan di gotara xwe de ya ku li ser Mele Mahmûdê Bazîdî û çîrokên wî nivîsiye, cureyê çîrokên wî wek serpehatî dihesbîne, li gor wî serpehatî rasteqînîn. Ew serpehatiyan wek bûyerên ku hatine qewimî dibîne ku bi awayekî devkî heta serdemekê hatine û ji aliyê yekî xwende ve derbasî nivîsê bûne. Li gor Alan qalibên destpêkê (Neqil dikin ku..., Rîwayet dikin ku..., Hikeyet dikin ku..., Qise dikin ku..., Neqil û beyan dikin dikin ku..., Rawî rewêd dikin ku...) yê çîrokê wek delîlê vê rasteqîniyê ne. Her wiha li gor Alan, heke di destpêkê de ev qalib tune bin jî di dawiyê çîrokê de qalibên wek: “Ev hikayet di nêva xelqê de me’lum e...”, “Wesanê meşhûr bûye...”, Ev qiseya jî di nêva alemê danê bûye dstan û derb bi mîsal...”, “Ev istiran (stran) û qezaya di nêva ekradan de meşhûr e...” hene (Alan, 2015: 91).

Li ser pênasîya çîrokê di navbera lêkolîneran de fikreke sedî sed hevpar nîne, lêbelê xaleke hevpar heye ku hemû lêkolîner di heman fikrê de ne ku çîrokbêj hay ji derewbûna çîrokê heye. Di xebatên ku min bi xwe jî kirin ev wisa bû, nemaze jî heke çîrokbêj ixtiyar be carinan naxwaze çîrokan bibêje, lewra difikire ku ew derew in û bawer dike ku bi gotina çîrokê dê gunahkar bibe. Li gor Pertev Naili Boratav formela “bir varmiş, bir yokmuş” ya çîrokên tirkî (di kurdî de jî ev formel heman e; hebû, tunebû) danîşaneke bi hişmend e ku çîrokbêj bi vê ji guhdarvanan re dide zanîn ku çîrok derew e (Boratav, 2014: 46). William R. Bascom di gotara xwe ya ku mît, efsane û çîrokan dide berhev de aliyê çîrokê yê derewê dupat dike (Bascom, 2006: 116). Di mijara derewbûna çîrokê de Luthi, diyar dike ku di formelên îronîk yê qedandina çîrokê de ti fikarên ku çîrokê bi guhdarvanan bidin bawerîkirin nîn in (Luthi, 2006: 220).

1.2. Ber bi Pênasîya Çîrokê ve

Piştî ku folklor wek dîsîplîneke ilmî berbelav bû, hewcehî bi senifandin û pênasîkirina cureyên folklorê çêbû ku çîrok jî yek ji wan e. Peyva çîrokê cara yekem di sala 1697an de di wergera Madame D’Aulnoy’ hatiye bikar anîn. Terri Windling, di xebata xwe ya bi navê “Les Contes des Fées: The Literary Fairy Tales of France” de diyar dike ku peyva çîrokê ji bo pênasîkirina kurteçîrokên zarokan yê bi sêhr tê bikar anîn ku reha wê ji peyva *conte de féesa* (çîrokan pîrhebokan) ya fransîzî tê (Gümüş, 2015: 8).

Wek wateya xwe ya îroyîn çîrok cara yekem ji aliyê Wilhelm (1859) û Jacob Grimm (1863) ve ku wek Birayên Grimm jî tên zanîn di pêşgotina hin çapên çîrokan de û di heman demê de di hûrnêrînên ku di pirtûkên çîrokan de nivîsandine ev têgeh bikar anîne. Nemaze bi ravekirinan, zanista karê lêkolîna çîrokan ava kirin û ev têgeh bi kar anîn. (Ewig, 2019: 224).

Wan li ser folklorê xebatên pir mezin kirin û xeberoşk, efsane û menqîbeyên elmanî berhev kirin û bi navê *Kinder und Hausmarchen* (Çîrokên ji bo Zarok û Maliyan) weşandin. (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 20). Birayên Grimm çîrokê wek cûreyeke wisa pênase dike ku bûyerên jiyana rojane û derasayîbûnê bi hev ve dikin (Gümüş, 2015: 8).

Vladimir Propp ku ji aliyê binyadgeriyê ve çîrok nirxandine di sala 1928an de di pirtûka xwe ya bi navê *Morfologiya Skazki* (Teşenasîya Çîrokan) li ser rêgezên di çîrokan de sekiniye. Rêbaza Morfolojîk a Propp li ser “fonksiyon” û “rol”ê ava dibe ku ev her du hêman bingeha rêbaza wî ava dikin (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 48; Gümüş, 2015). Gava ku Propp li ser çîrokên gelê ûris hûr bûye du taybetiyên van çîrokan bala wî kişandine; yek jê curbicurbûna çîrokan e, ya didoya jî yekanehengbûna çîrokan e. Di encama van lêkolînan de Propp dipeyîtine ku her çî qas leheng biguherin jî fonksiyonan wan naguherin. Di heman demê de Propp dipeyîtine ku di çîrokan de çî qas leheng pir bin jî fonksiyonên wan kêman in (Kıran, Eziler Kıran, 2007: 167).

Max Luthi çîrokê wisa pênase dike; “Çîrok ew cure vebêje ye ku edebî, fantastîk, plankirî, ji sehrebaziyê cûda, ne hewceye ku bi jiyana rastî re li hev were ku çîna bilind û ya jirêzê bi hev re guhdarî dikin” (Gümüş, 2015: 9). Li gor Luthi pênc taybetiyên şewaza çîrokên Ewrûpî hene ku em ê bi kurtasî behsa van taybetiyan bikin;

Yekrehendî/Eindimensionalit⁵: “Di çîrokê de dinyaya fizîkî û ya metafîzîkî, alema ku dixuye û ya ku naxuye (alema xeybê), dinyaya rastî û derrastî ji hev nayên veqetandin” (Oruç, 2019: 251). Di çîrokê de lehengên asayî û yê derasayî ku ne ji heman rehendê ne di têkiliyeke gelekî normal de ne ku di çîrokê de lihevqelibûna wan ne bûyere derasayî ye. Bo nimune melekên Xwedê (wek Rehistên/Ezraîl) cin, pîrhebok, pîrên xwînmij, dew, hût, ajalên xwedî ziman û wd. Hebûna van lehengan ji bo çîrokê ne rewşeke derasayî ye. Hin lehengên çîrokan dikevin dirûvê ajalên an jî ajal bi mirovan re dizewicin. Di çîrokê de ev rewş ew qas normal tê şixulandin ku tu dibê qey ev heyîn ji dinyaya me ne û qet ev ji bo guhdervan biyanî nayên (Oruç, 2019: 251).

Bisereyî/Flächenhaftigkeit: Bisereyîya ku taybetiyeke çanda devkî ya xwezayî ye li gel bidestxistina vegotîneke hêsan û veguhastina nîşên nû, hêmanên ku di çîrokê de derbas dibin bi awayê herî hêsan duxuyin. Tu carî çîrok bahsa kitekitên meknan, lehengan û demê nake. Şayesandin di çîrokan de bi peyvên sereke derbas dibin, bo nimune; keçeke xweşik, qesreke

⁵ Reseniya van têgihan elmanî ye, lewma jî me xwest elmaniya wan jî bidin.

mezin, dêwekî yek çav û wd. “Karakter û hestên lehengên çîrokan tu carî nayên diyarkirin tenê li gor tevger û çalakiya wan tê ravekirin”. Bi xêra biserebûnê çîrok taybetiya dûrketina ji rasteqînê bi dest dixê û pevxiştîbûna çîrokê derdixê pêş (Oruç, 2019: 252, 253). Wek mînak, li gor tevgerên Mîrze Miheme em tê derdixin ku ew kesekî bêtirs e, heke na ev di çîrokê de nayê gotin.

Şêwaza Razber/Absrakter Stil: Ursula Ewig dibêje ku şêwaza razber dibe taybetiya herî girîng a çîrokê (Ewig, 2019: 226). Di çîrokê de pêkhatina bûyeran a zû bi zû girîng e, lewma jî çîrok nakeve kitekitan. Gava ku lehengek ji cihekî diçe cihekî din çîrok nakeve şayesadinan, tenê cih dide bûyerên ku ji bo aksiyonê û honaka bûyeran girîng in (Oruç, 2019: 53). Ji ber vê sedemê jî bûyer zû bi zû diqewimin.

Tecrîd û Girêdayîbûna bi Her Tiştî ve/Isolation und Allverbundenheit: Li gor Oruç, Luthi bi têgeha “Tecrîdê” diyar dike ku lehengên çîrokê tîkatenê ne û ne girêdayî tişteki, malbatekê, welatekî û wd in. Ê di heman demê de ew ne xwedi dinyayekî takekesî ne û tu tîkiliya wan bi têgiha demê re jî nîn e (Oruç, 2019: 254). Wek mînak, lehengekî çîrokekê gava ku ji cihekî diçe cihekî din qet nafikire ku dê jin, zarok, dê yan jî bavê wî piştî wî çî bikin û çiqas dem di serê re here bila here qet ferq nakin. Di çîroka Çil Bira/Teyrê Sînbeg de Mîrze Miheme sî û neh bîrayên xwe li dû xwe dihêle û diçe welatekî xeyrî xerîb.

Lehengên çîroka hem bi awayekî hêsan dikarin bi hev re tîkiliyê deynin hem jî bi hêsanî dikarin vê tîkiliyê qut bikin (Oruç, 2019: 254). Ev tîkiliyên ku di honaka bûyeran de xwe didin nîşan ji bo berdewamiya çîrokê bi carekê re ji aliyê leheng ve tîk qut kirin û careke din dibe ku em rastî ve tîkiliyê neyên jî. Luthi taybetiya bingehîn ya cureya çîrokê wisa rave dike, “tecrîdeke ku dixuye û girêdana bi her tiştî ku bi awayekî naxuye peyda dibe” (Oruç. r. 254)

“Danîşana herî xweşik ya bûyera tecrîdê û girêdana bi her tiştî, nemaze objeya ku keramet û mucîzeyê pêk tîne, mucîze û motîfên kor in” (Oruç, 2019: 254). Lehengê çîrokê bi xêra vê objeyê di navbera dinyara fîzîkî û metafîzî diçe û tê. Ev obje carina hingulîsk, tîzbî, pirtîkên ajalan û wd. in. Wek mînak, Mîrze Miheme di çîroka Çil Bira de gava xwe bi hûta dide naskirin tîzbîyê nîşanî wan dide da ku wî nas bikin û tişteki neynin serê wî, di heman çîrokê de ji bo ku ji cihekî here cihekî pirtîkê Teyrê sînbeg li hev dixê û teyr bi carekê re xuya dibe. Ev obje ji bo girêdana her du dinyaya rola kilîdê pêk tînin.

Bilindkirin û Girtina Dinyayê ya Nav Xwe/Sublimatin und Welthaltigkeit: Çîrok ne xwediyê motîfên xwe ne, ew motîfên xwe ji efsane, bûyerên kevn ên ku ji rastiyê dûr ketine, mît an jî ji heqîqetê digirin ku dibe ev heqîqet xwedî bingeheke îlahî be jî. Ev motîf, çîrokê ji realîteyê (rastiyê) dûr dikin, wateyeke derrastî an serrastî û bi wateyeke manewî, bi pîrozkirinê, bi xwerûkirinê vediguherin motîfên çîrokê (Oruç, 2019: 255).

Luthi diyar dike ku lehengên çîrokê taybetiyên xwe yê takekesî winda dikin û vediguherin lehengên sivik û şefaf. “Lewma jî çîrok teşeyeke misoger û vekirî digire.” Ku valakirina hindirê figûr û objeyan di heman demê karekî bilindkirinê (pîrozkirinê) ye. Bi vê valakirinê hemû hêmanên çîrokê tên paqijkirin, safkirin û bi vî awayî hemû motîfên girîng yê heyîna mirov bi aheng tên şixlandin. Lewma jî ev hêza çîrokê ya pîrozkirinê keysa girtina dinyayê ya nav xwe didê (Oruç, 2019: 255).

Wek ku me berê jî got li ser pênaseya çîrokê di nav lêkolîneran de aloziyek heye. Bi gelmeperî tê îdîakirin ku çîrok ji bo bezmê tên gotin, lêbelê hin fonksiyonên girîng yê çîrokên exlaqî hene ku ji wan îdîayên cûda ne. Dibe ku honaka bûyera çîrokê li cihekî û di demekê de pêk hatibe lê, “hema hema bê dem û bê cih in”. Çîrok wek vegotinên zarokî tên pênasekirin lê em dizanin ku gelek çîrok li derveyî vê pênaseyê ne (Bascom, 2006: 115). Nemaze jî çîrokên pirtebeqeyî ji bo fahmkirina zarokekî ne guncav in. Her wiha çîrokên dirêj dibe ku xwedî kitekitên tevlihev bin û ev ji bo famkirina zarokekî ne hêsan dixuye. Û guhdarvanê çîrokên ku qala hîleyên jinan dikin ne zarok in. Di nav kurdan de em dizanin ku çîrok di civatên giran de jî tên gotin û carina muxatab an jî guhdarvan ne zarok in. William R. Bascom çîrokan li gor taybetiyên wan dabeş dike û wek çîrokên mirovan, çîrokên ajalan, çîrokê xapandinê (hîle), çîrokên pirole-dirêj, çîrokên nakokiyan, çîrokên qalibgirtî (hatine formulakirin), çîrokên exlaq û fabl binav dike (Bascom, 2006: 116).

Fablên ku bi gelemperî lehengên wan ajal in li gorî çîrokên mirovan kurttir in û mirovan hemû cureyên vegotinê yê ku dîtine têde ajal, nebat û eşya diaxivin wek fabl pênase kirine. Cûdahiya di navbera fabl û çîrokê de derxistina peyamê ye (Luthi, 2006: 222). Di fablan de guhdarvan li benda peyamekê disekine û di dawiya fablê de peyameke bingehîn derdikeve. Lêbelê ne hewceye ku çîrok peyamekê bide, di çîrokê de ya girîng pevixistina bûyerên girîng û yê tijî aksiyon in.

1.3. Çîroka Kurdî û Berhevkarî⁶

Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan di xebata xwe ya bi navê “Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî” de çavkaniyên folklorê kurdî di bin “Serdema Klasîk” û “Serdema Modern” de dabeş dikin. Em ê jî di cureya çîrokê de xebatên ku li ser çîrokê hatine kirin di bin sê sernevan de debaş bikin:

1. Xebatên ku ji Fikra Netewetiyê Dûr Hatine Kirin
2. Xebatên ku bi Bizava Netewetiyê Romantîk Hatine Kirin
3. Xebatên ku bi Fikarên Zanistî Hatine Kirin

1.4. Xebatên ku ji Fikra Netewetiyê Dûr Hatine Kirin

Em di arşîva Aleksandre Jaba rastî Mele Mûsayê Hekarî tîn ku hê di sedsala XVII. de ji 50 heb zêdetir çîrokên gelerî berhev kiriye û di pirtûka bi navê Duru'l-Mecâlîs an jî Durru'l Mecâlîsê de ew wek pexşanî derbasî nivîsê kiriye (Pertev, 2015: 249). Lêbelê di vê pêvajoyê de em dikarin xebatên Mele Mahmûdê Bazîdî (1797-1867) ku bi Aleksandre Jaba (1803-1894) re kirine wek pêşeng bihesbînin. Nemaze jî bi pirtûka xwe ya Camiayê Rîsale û Hikayetê Ekradiyye di warê folklorê kurdî de diyariyeke giranbiha li dû xwe hîştîye. Di vê pirtûkê de li gel 40 çîrokên kurdî 3 maqale jî hene. Lewma jî ew wek “hem pêşengê folklorê kurdî hem jî tomarê folklorê kurdî ye” (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 53, 54).

1.5. Xebatên ku bi Bizava Netewetiyê Romantîk Hatine Kirin

Di bin vî sernavî de em dikarin qala gelek xebatan bikin. Nemaze jî piştî şoreşa fransî û Şerê Cîhanê yê Yekem wek kêmîneyên din yê Împaratoriya Osmanî kurd jî di bin bandora pêlên netewperiyê de man û bi vê bandorê gelek berhemên folklorîk hatin berhev kirin. Piştî hat fahmkirin ku folklor di avakirina neteweyekî de xwedî roleke taybet e, rewşên kurd di weşanên xwe de cih dan gelek berhemên folklorîk.

Di vê xalê de rojnameya Kurdistanê (1898-1902) wek pêşeng derdikeve pêşberî me, bi vê rojnemayê êdî xebatên li ser folklorê “hem sîstematîk in û hem jî ji bo hişyarkirina hişmendiya neteweyî ne” (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 55). Di heman demê korava Jîn (1918-1919) bi weşana gotarên xwe yê netewetî xwedî cihê girîng e di vê wateyê de (Aslan, 2015: 112).

⁶ Heta ku bi taybetî nayê diyarin ji kurdî qest kurmançî ye.

Azad Aslan her cure xebatên rewşenbîrên kurd (ku di bin banê osmanîtiyê de dihatin kirin) yên beriya Şerê Cîhanê yê Yekem wek “netewetîya xapînok” pênase dike (Aslan, 2015: 118). Rewşenbîrên kurd yên beriya şer hemû hêviyê xwe bi dewleta osmanî û fikra umetperweriyê ve girê dabûn û bawer dikirin ku anca xelasiya kurdan bi xelasiya dewleta osmaniyan ve girêdayî ye. Her wiha em dikarin vê têgihîştîna ku di bin bandora *Jön Türkler* de şikil girtibû bi eşkeryê di nivîsên yên wek Abdurrahman Bedîrxanê ku edîtorê rojnameya Kurdistanê (1898-1902) bû û endemê lijneya *Kurd Teavvun ve Teraki Gazetesi* (1908-1909) Babanzade İsmail Hakkî de bi eşkeryê bibînin (Aslan, 2015: 122)

Bi bandora neteweperwerîya romantîk kovar û rojnameyên wek “Yekbûn, Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Zarî Kurmancî, Riya Teze, Hewar, Ronahî, Roja Nû” (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 55) jî bûne cihê weşana gelek çîrok û berhemên folklorîk.

Di heman demê de em dikarin çend xebatên oryantalîstên ewrûpî jî bijmîrin, nemaze xebatên Eugen Pryme (1843-1913), Albert Socin (1844-1899), ku di salên 1890î de ji heremên wek Botan û Turabidîn berhevkirina vegotinên devkî kirine û bi navê *Kurdische Sammlungen* “Koleksiyona Kurdî” li Petersburgê weşandine (Şubaşî, 2019: 1,2). Rojhilatnasê almanî F. Le cop jî li deverên bakur geriyaye û çîrokên kurdî yên gelerî berhev kiriye û bi navê *Kurdische Text* (Deqên Kurdî) çap kiriye (Pertev, 2016: 46).

1.6. Xebatên ku bi Fikarên Zanistî Hatine Kirin

Di bin vî sernavî de Kemal Fewzî (1891-1925) xwedî cihê girîng digire, lewra ji bilî berhevkarîyên wî wek ku em dizanin heta niha yekem car yê ku bi rêbazeke ilmî nêzî çîrokên kurdî bûye ew e. Kemal Fewzî van xebatên xwe wek rêzegotarekê di kovara *Jînê* de bi navê *Kürt Masalları* (Çîrokên Kurdî) weşandiye (Pertev, 2016: 50). Kemal Fewzî li gundên Kurdistanê çîrokên kurdî berhev dike û wek ku ew jî diyar dike, tiştê ku dibihîze bêyî ku tiştêkî li ser zêde bike derbasî nivîsê dike û diyar dike ku ji bo ev kereste neyên ji bîr kirin wî ev karê berhevkarîyê kiriye. Ew bi vê helwesta xwe hem rêbaza zanistî ya berhevkarîyê dimeşîne hem jî wek neteweperestekî romantîk beşdarî xebatên berhevkarîya çîrokên kurdî dibe (Pertev, 2016: 53).

Li Tirkiyeyê piştî qedexeya tund a li ser kurdî hinekî hat sistkirin û li zanîngehan beşên kurdî hatin vekirin xebatên zanistî li ser çîrokan zêde bûn. Berhema Ramazan Pertev ya bi navê “Zarok û Çîrok”, Teza masterê ya Muzaffer Ekinçi ya bi navê “Lêkolîneke Li Ser Motîfên Lawiran Ên Ku di Berhema M. Emîn Bozarlan ya Rêzeçîrokên Lawiran a bi Navê

“Meselokên Lawiran” de Cih Digirin”, teza masterê ya Kenan Subaşı ya bi navê “Tîpolojîya Vegêrana Çîrvanokên Kurdî/Kurmancî”, xebata Bünyamin Demir a bi navê “Çîrokên Kurdî li gorî Motîf Îndeksa Stith Thompson (Bi Nimûneyên Çîrokên Mîrze Mihemed)”, xebata Leyla Kaplan a bi navê “Di Çîrokên Hîzanê da Motîfa Dê” û wd. di vê qadê de mînakên baş in.

1.7. Kurtedîroka Berhevkarîya Çîrokên Kurdî/Kurmancî

Di vê beşa xebatê de em ê xebatên berhavkariyê li gor xebatên takekes û yên ku di kovar, rojname û pirtûkan de weşiyane kategorîze bikin. Di vê beşê de me pirtûka Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan a bi navê “Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî” wek referans hilbijart, lewra di vê pirtûkê de hema bibêje hemû (heta dema çapbûna pirtûkê) xebatên ku li ser folklorê di taybetiya xebata me de yên li ser çîroka kurdî hatine kirin cih digirin.

1.8. Berhevkarî

Xebatên folklorê bi kifşkirina parzemînên nû yên wek Amerîka û Awistralyayê dest pê kiriye. Mirovên “modern” yên Ewrûpî piştî dîtîna ku mirovên li ser van axên nû dîjin ji wan gelekî “paşma” (îng: primitive, tr: ilkel) ne, bawerî pê anîn ku ev mirov wek bavûkalên wan ên kevnare ne û bi vî awayî jî xwerû mane. Li gorî vê têgihîtinê ku dixwest bigihêje destpêka mirovahiyê, heke çî qas bi paş ve biçin dê bêtir bigihêjin destpêka mirovahiyê (Oğuz, 2013: 7). Ji ber vê sedemê jî cih û warên ku nû hatibûn kifşkirin ji bo gihastina armancên xwe ji lêkolîneran re bûne qada lêkolînê. Bi vî awayî gundiyên Ewrûpî jî ku ji çanda modern bê par mabûn û bi hezar salan xwe ji piştaftinê parastibûn û xwerû mabûn ji bo avakirina çanda nû ya neteweyî mîna keke baş xuya dikirin û lêkolînên di derbarê çanda van gundiyan de hatin kirin wek avakirina çanda neteweyî hat dîtîna. Di vê têgihîştinê de folklorîstên pêşeng yên wek Ossian, Herder, Birayên Grimm û Lönrot ji bo “vegera li xwerûbûna xwe vegera gund wek şert didîtin” (Oğuz, 2013: 8). Lewma jî di pêvajoya avakirina çanda neteweyî de berhevkarîna berhemên gelêrî xwedî cihekî mezin e. Bi awayekî gelemperî berhevkarî: “ew kar e ku berhemên folklorî di dem û cihekî diyar de li gorî rê û rêbazên zanista folklorê bi riya kesên folklorîst an jî amatorên eleqedar, ji kesên rêber û çavkanî bi awayê devkî an nivîskî tên tomarkirin” (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 145)

Bi wateya xwe ya gelemperî berhevkarî cara yekem bi xebatên Qral Ptoleme yê yewnanî ku ji bo avakirina Pirtûkxaneyê Îskenderiyeyê pêk hatine dest pê dike. Qral Ptoleme, bi darê zorê berhemên nivîskarên klasîk ku di keştiyên dihatin benderê ji wan dida stendin û

tevlî Pirtûkxaneya Îskendereyê dikir. Ev xebata ku Qral kiriye di dîrokê de wek yekem karê berhevkarîyê tê dîtin (Polat. 1999: 13).

Berhevkarîya ku ji berhevkarîya me ya îroyîn re bûye bingeh di sedala 16. de li Fransayê ji aliyê Qral I. Francois ve hatiye kirin. Qral ferman daye, her nisxeya berhema ku li dewletê were çapkirin divê bidin pirtûkxaneya taybet ya Bloisê (Polat, 1999: 13).

Li gorî xebata “Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî” Heciyê Cindî neqil dike, kevintirîn xebata ku li ser folklorê kurdî hatiye kirin destxeta Mecrop Nastoc e ku di sala 1711an de li Ermanîstanê hatiye nivîsandin ku di vê destxetê de 115 gotinên pêşiyên hene (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 52). Her wiha Peter Lerch ve di salên 1853 û 1856an de di kampa dilgirtiyên a artêşa osmanî de hatiye kirin ku Lerch vê lêkolînê li ser leşkerên kurmanç û zaza kiriye û di encama vê lêkolînê de ji van leşkeran çîrok guhdar kiriye û ew derbasî nivîsê kiriye (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 53, Aydoğdu, 2015: 2) Em di arşîva Aleksandre Jaba rastî Mele Mûsayê Hekarî tîn ku hê di sedsala 17. de ji 50 heb zêdetir çîrokên gelêrî berhev kiriye û di pirtûka bi navê Duru'l-Mecalîs an jî Durru'l Mecâlsê de ew wek pexşanî derbasî nivîsê kiriye (Pertev. r. 46). Di heman demê de Mele Mahmûrê Bazîdî ku wek pêşengê folklorê kurdî tê zanîn di pirtûka xwe ya bi navê Camiyê Rîsale û Hikayetê Ekradiyye de çil çîrokên gelêrî derbasî nivîsê kiriye (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 54).

Piştî ku çapxane li dinyayê û li împaratoriya osmanî berbelav bû û kurd jî bi îmkên çapxaneyê hisiyên yekem rojname û kovarên kurdî dest bi weşanê kirin. Ev rojname û kovarên ku ji aliyê rewşenbîrên kurd ve dihatin derxistin wek romantîkên Ewrûpî ji bo avakirina çanda neteweyî girîngî dane berhemên gelêrî û bi vê mebestê berhemên gelêrî ji aliyê rewşenbîrên kurd ve hatin çapkirin.

1.9. Rojname

Di vê wateyê de Rojnameya Kurdistanê (1898-1902) xwedî cihêkî taybet e. Rojnameya Kurdistanê her çî qas bi bûyerên siyasî yên rojane re mijûl bûbe jî bi weşanên xwe ji bo hişyarkirina fikrên neteweyî pêşengî ji çapemeniya kurdî re kiriye (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 62). Di derbarê detayên weşanên folklorîk yên Rojnameya Kurdistanê de me agahiyek bi dest nexist, lêbelê ji ber ku Kurdistan yekem rojnameya kurdî ye û ji bo belavbûna bizava neteweyî roleke sereke listiyê me hêja dît ku di vê beşê de behsa wê bikin.

1.10. Kovar û Xebatên din

Di Kovara Rojî Kurd (1913) de çîrokeke gelêrî heye bi navê “Çîroka Kurmanca” ku ji aliyê rêvebirê berpirsyar Ebdulkerîm ve hatiye weşandin. Fablek jî ji aliyê Baba Rewşo ve hatiye veguhastin (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 63). Kovara Jîn (1918-1919): Em dikarin bibêjin ku di vê kovarê de yekem car jî bo nirxandina berhemên gelêrî rêbazeke zanistî hatiye hilibijartin ku Kemal Fewzî ji wan nivîskara yê herî girîng e. Kemal Fewzî di Jînê de digel weşana çîrokên berhevkirî rêzegotereke ku li ser têkiliya dîrok û mîtolojiyê sekiniye jî weşandiye ku di vê gotarê de li ser têgihên çîrok û efsaneya radiweste (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 66). Kovara Hawarê (1932-1943) ji aliyê temenê xwe ve heta dewra xwe kovara herî temendirêj e. Di kovara Hawarê de digel gelek berhemên gelêrî bi dehan çîrok û fablên kurmancî hatine weşandin ku kovara Hawarê bi 57 hejmarên xwe jî bo folklorê kurdî gelek xizmetên mezin kiriye.⁷ Kovara Ronahî (1942-1944) ku wek berdewama kovara Hawarê jî tê hesabandin cih daye gelek berhemên gelêrî ku ji jimara pêncan û pê de nivîsn folklorîk dest bi weşanê dikin. Kesayetên wek Celadet Bedîrxan û Osman Sebrî bi weşana fablan xwedî cihêkî taybet in, nemaze jî Osman Sebrî bi fablên manzûm hem jî bo wêjeya gelêrî hem jî ji bo wêjeya zarokan xebatên baş pêk aniye (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 81).

Kovara Xwençe wek deh cildan hatiye weşandin ku bi tevahî tê de nêzî du hezar berhemên folklorê hene ku ji van berhemên ku wek serpêhatî (5), çîrokên rawilan/fabl (40), çîrokên têkel (262), çîrokên dirêj (68) hatine kategorîzekirin bi tevahî 375 heban dikin (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 92). Kovarên wek Rewşen (1992-1996), Nûbiharê (1992-), û wd. di warê weşana çîrokên kurdî yê gelêrî de xizmeteke giranbiha kirine û hê jî dikin (Nûbihar).

Lêkolînerên wek Elaeddîn Secadî di pirtûka xwe ya bi navê Riştey Mirwarî (1953) de ligel berhemên gelêrî gelek çîrokên ku li Kurdistanê berhev kiribû jî weşandiye, Heciyê Cindî û Emînê Evdal di xebata Folklorê Kurmancan (1958) de gelek çîrokên gelêrî weşandine, Îzeddîn Mistefa Resûl di pirtûka Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî (1970) de cih daye gelek cureyên edebiyata kurdî, Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl di pirtûka Zargotina Kurdan de ku ji du cildan pêk tê cih dane bi sedan berhemên folklorîk, Sadiq Bahaeddîn di pirtûka xwe ya bi navê Folklorê Kurdî (1988) de ligel serpêhatî, destan û stran cih dane gelek çîrokên kurdî jî. Di heman demê de lêkolînerên wek Zeynelabidîn Zinar, Ahmet Aras, Şerefxanê Cizîrî, Gerard

⁷ Ji bo zêdetir agahî bnr. Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî.

Chailand, Philip G. Kreyenbroek, Christine Allison û gelek navên dîtir di van demên dawî de li ser folklorê kurdî gelek xebat meşandine (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 58,60).

BEŞA DUYEM

1. Semiyotîk

1.1. Wate û Pênaseya Semiyotîkê

Li ser têngîna semiyotîkê ji serdema antîk û vir ve gelek felsefevan, zanyar û hekîm fikirîne û ligel gelek qadên curbicur (bo nimûne; tib) di serî de li ser nîşanekên (fr. signe, tr. gösterge) zimanî lêkolîn kirine. Têngîna semiyotîkê ku îro di zimanên rojavayî de hê jî tê bikaranîn, di kurdiya soranî de di wateya zanista îşaretan de wek “amajenasî”yê (Alan, 2015: 183) tê pênasekirin; ji pevgihana têngîna semeion (nîşanek) ya yewnanî û logîa (ji logosa ku di wateya “teorî”; “gotin”ê) yê pêk tê (Rifat, 2009: 27, Elyıldırım, 2020). Lê peyva semiyotîkê bi eslê xwe ji peyva “semiotique”a frensîzî (di dewra modern de) derbasî nav zimanên din bûye. Têngîna semiyotîkê wek “şaxê zanistê ya ku li ser nîşanekan lêkolînê dike” tê pênasekirin. Di vê wateyê de nîşanek, “bi awayekî gelemperî ji bilî xwe her cûre şikil, obje, diyarde û wd. temsîl dike û ji ber vê sedemê jî dikare cihê tiştê ku temsîl dike bigire” ku di vê çarçoveyê de peyv, remz, îşaret û wd. wek nîşanekê tên qebûl kirin. Bi gotineke din semiyotîk teroriya şîrovekirin û fêmkirina remz, sembol û îşaretan e ku bi pênasyeke gişgir li dû pirsê “wate çawa pêk tê?” diçe û di vê çarçoveyê de bi armanca çareser kirina bastûrên watedar lédikole (Rifat, 2009: 11, Alan, 2015, Uzdu Yıldız, 2011).

Di vê çarçoveyê de ji bo pênaseyê berfireh ya nîşanekê em dikarin wisa bibêjin: Nîşanek pergala ku ji yekeyên wek zimanê siruştî yên ku mirov ji bo lihevhatinê afirandine û bikar tînin, hin cûre jest (tevgerên wek serî, çav, dest, mil), alfabeya kerr-lalan, îşaretên trafîkê, flemayên hin pîşeyan (bo nimûn flemayên deryavanan), afîşên reklaman, moda, daraştinên mîmarî, wêje, resm, muzîk û wd. pêk tê. Ev pergalên ku bi bikaranîna hin amûran (deng, nivîs, wêne, tevger, wd.) tên dereceya pêkhatinê bi şixulîna hin rêzikên diyar, dibe wateyê hevgirtî. Û yekeyên vê wateya hevgirtî jî wek nîşanekê tê binavkirin (Rifat, 2009: 12). Bo nimûne, armanca lehengekî, motîfên mîmarî, katjimêr, îşaretên trafîkê, reng û motîfên xalîçeyekê, hin objeyên ku di çîrokên gelêrî de derbas dibin, hin semptomên nexweşiyên (kûxîn, vereşîn, heraret). Ev hemû nîşanek xwedî peyamekê ne, û me di derbarê tiştê de hişyar an jî agahdar dikin. Rengê îşaretên trafîkê di vê çarçoveyê de mîna keke eşkere ye; heke sor veketibe ji bo ajokeran tê wateya rawestîna û kesk jî tê wateya derbasbûnê. Lêbelê bêyî rengê zer ev hevgirtin pêk nayê, rengê zer vê hevgirtina watedar pêk tîne. Bi tena serê xwe ne

rengê sor ne jî yê kesk tu wateyê nade, rengê zer wek daçekê di navbera van her du rengan de peywendiyê pêk tîne her çî qas carina rengê zer li dernan pênekeve jî.

Wek me li jor jî destnîşan kir; nîşanek ne ew tişt be jî, wî tiştî bi bîr dixê yan jî temsîl dike. Em ê vê bi sêv û qelûna Magritte⁸ rave bikin.



Li ser wêneyê sêvê; ev ne sêvek e û li ser yê qelûnê jî ev ne qelûneke e dinivîse. Her çî qas cara pêşî ev hevok ji me re ecêb werin jî lê rast in. Rast e, lewra ev ne sêvek e, hûn nikarin vê sêvê bidin ber gezan û ew jî ne qelûneke, hûn nikarin kufinê jê bînin. Lêbelê cara ewil gava em vî wêneyî bibînin em ê van objeyan bi awayê wan ê rastî bifikirin. Ev obje/têgîn di zêhna me de temsîliyeta hemû sêv û qelûnan dikin; heke me ew dîtîbin an me ew nedîtîbin jî (Erkeman Akerson, 2019: 23).

Di vê çarçoveyê de nîşanek vediqete du hêmanan; nîşanbar û nîşandêr. Em ê bi kurtasî di bin vî sernavî de behsa wan bikin lewra di detayên teoriyê de em ê bi kûr û dirêj van her du têgînan rave bikin. Ev her du lêlatên ku nîşanekê pêk tînin di heman demê de hevgirtina wateyî jî pêk tînin. Nîşandêr beşa nîşanekê ye ku raste rast tê hestkirin ango tê gihîştin. Ji bo zimanên siruştî layena deng di vê lêlatê de tê nirxandin û her wiha îmajê bihîzê (şopa deng ya zêhnî ango şopa deng ku di zêhna me de bi bilêvkirinê pêk tê) bi xwe ye. Lêbelê nîşanbar beşa nîşanekê ye ku raste rast nayê hestkirin ango nayê tê gihîştin, ew layena têgînî ya nîşanekê ye, ne fîzîkî ye; naverok e (Rifat, 2018a: 123-135).

1.2. Geşedan û Dîrokçeya Semiyotîkê

Di çanda yewnanî de nîşanek bi awayê “kehanetan” dihatin bikaranîn ku ji ber vê sedemê *semeîonê* di çanda yewnanî de bi gelemperî wek têgîneke ku metna devkî û nîşaneka

⁸ Ev, wek Sêv û Qelûna Magritte tê zanîn ku di destpêka semiyotîkê de ji bo ravekirina nîşanekê xwedî cihekî taybet e.

kehanetekê dixuye (Elyıldırım, 2020: 8). Têgîna semiosîsê ku di yewnaniya kevnar de di wateya diyarkirin û nîşanekê de bû, bi gelemperî di qada tibê de dihat bikaranîn. Hekîmên navdar ên wek Hîppokrates (B. Î. 460 – 370) û Galenos (B. Î. 139 – 199) ji bo pêvajoya teşhîsa nexweşiyê wek diyardeya vê nexweşiyê ev têngî bi kar tanîn. Bi xêra vê armanc, beriya ku nexweşî peyda bibe pê bihisin, bû. Semptomên tibî wek nîşanekên xwedî pevragihînên taybet ên nirxdar dihatin qebûlkirin û bi vî awayî jî têngînen wek heyîn û mirinê dihatin pirsyarkirin (Batu, 2018: 10, Erkman Akerson, 2019).

1.3. Têgîhana Semiyotîkê ya Platon

Têgîna semiyotîkê xwe di lêgerîna rasteqînê ya teoriya îdealan ya Platon de jî nîşan dide, li gor Platon îdeal yanî rasteqînên eslî yekane afrîneriyên afrîner in, obje tenê awayekî van afrîneriyên yakane ne. Bikaranîna nîşanekê ya Platon ji teoriya ziman venaqete, li gor wî navdêr navê wê îmajê ye ku ji bo derxistina heqîqeta objeyan e ku ew nav li wan hatiye kirin ku bi vê ravekirinê dixwaze pêwendiya di navbera navdêr û objeyê de bi me bide zanîn. Divê peyv, nav ango nîşanekên ku nûnerê van heyîn û objeyan in li gor heqîqeta wan bin, lê ne wisa ye. Lewra peyv bi amûra têngîhana kêr û bêbawer ya mirov hatine peyda kirin, ew kopiyaya van kopiyaya ne û ji bo rengvedana îdealan yanî rasteqînan kêr in. Li gor Platon têngîh ne ji tecrûbeya dinyayî ya mirovan hatine bidestxistin, ew diyardeyên îlahî ne ku ji aliyê Xwedê ve hatine afirandin (Batu, 2018: 12, Elyıldırım, 2020).

Platon diyar dike ku têngîhana me girêdayî hestên me ye û ji ber vê sedemê têngîhana me ya dinyayê jî xapandineke. Îdealên ku di serî de ji aliyê Xwedê ve hatine afirandin li gor her heqîqeta objeyekê ne û yekane ne. Tenê rasteqînên matematîkî û rasteqînên zanistê dikarin rengvedana van îdealan bin (Erkman Akerson, 2019: 51, 52). Wate, li gor Platon ji ber vê sedemê jî em nikarin qala afrîneriyeke mirovî bikin. Mirov bi hestên xwe li dinyayê dinêrin û şîrove dikin û bi vî şiklî jî tu carî nikarin bigihêjin heqîqetê. Her wiha tiştên ku mirov çê dikin di serî de hatine afirandin û ancax ev çêkirin/huner kopyaya van afrîneriya ye.

1.4. Têgîhana Semiyotîkê ya Arîsto

Arîstotelesê ku şagirtê Platon e li dijî têngîhiştina Platon derdikeve, li gor wî ev têngîh bi têngîhana dinyayê re bi mirovan re peyda bûne, mirovan di serî de têngîhaştin dinyayê û dû re li ser navlêkirinê li hev kirin. Ango li dij fikra Platon derdikeve ku îdîa dikir ku têngîh berî objeyan hatibûn afirandin. Li gor wî, remz, nav, peyv an jî nîşanek ji bo hemû mirovan bingeha xwe ji hevpariyekê digirin, lê ji ber cûdahiya çandî û zimanî em wan bi navên cûda

binav dikin. Yanî “lihevkirina” li ser zimanekî (di nav axêverên wî de) wan peyvên dike nav û remza objeyekê, hekan ew bi me re pêk nehatine. Arîsto diyar dike ku rengvedana dinyayê di zêhna me hemûyan de bi heman awayî cîh digire. Çavdêriya objeyên li dinyayê ya ku di zêhna me de cîh digire rengvedana tiştên rasteqînî. Arîsto di vir de balê dikişîne têkliya di navbera nîşandêr (îng. signifier; tr. gösteren) û nîşanbarê (îng. signified; tr. gösterilen) de; heke bi wate û bi deng em ziman wek pergelekê bihesbînin ku ziman di vir de nîşandêr e û tiştê ku hatiye gotin yanî objeya ku di zêhna me de rengvedaye jî nîşanbar e. Arîsto diyar dike ku hemû mirov bi heman têgihînê li dinyayê dinêrin lewra dinya li her derê xwe bi heman awayî nîşan dide. A ku Arîstoteles ji bo semiyotîkê mûhîm dike helwesta senifandina hemû heyînen candar û bêcan yê dinyayê ye ku ew bi awayekî “bingeha sîstematîzekirinê davêje” (Batu, 2018: 12, Erkman Akerson, 2019).

Di heman demê de beravajî Platon di berhemên Arîsto de teoriya ziman ji teoriya nîşanekan vediqete. Lê di teoriya semiyotîka modern de tê qebûlkirin ku têgihînê ku ziman sererast dikin nîşanek bi xwe ne. Ji ber vê veqetînê Arîsto teoriya nîşanekan dixwe navbera mantiq û retorîkê. Jixwe li gor wî nîşanek “pêwendîya navbera du tiştên li dinyayê yan jî ya navbera du rasteqînan îma dike”. Bo nimûne di hevoka ‘kulîlk bişkivîn’ de rastiya ku dixweze bê gotin ‘hatina biharê ye, ango bihar hatiye’; hevoka yekem a duyem îma dike. Ev jî cihê semiyotîkê nîşanê me dide ku Arîsto bicîh kiribû. Ev pêşniyaz gava bi pêwendîya mantiqî were îzah kirin encameke bi vî rengî derdikeve holê; ‘q’ nîşaneka ‘p’yê ye (Elyıldırım, 2020: 11).

Hewla pênasê û şîroveya semiyotîkê di serdema antîk de nemaze jî bi nêrînên Platon û Arîsto di çarçoveya nîşanekên zimanî û der-zimanî de xwe nîşan dide. Platon navdêran wek ravekerê objeyan pêşkêş dike, yanî navdêr divê li kîjan objeyê hatibe kirin wê objeyê pênasê bike. Lêbelê vê pêkan jî nabîne; lewra peyv ji aliyê mirovan ve bi hestên xapînok yê dinyewî hatine afirandin û ew hestên xapînok me li hember heqîqeta îdealan kor dikin. Lê Arîsto xwedî fikra beravajî vê ye. Ew navdêran wek remza objeyekê dibîne û di pêvajoya navlêkirinê de lihevkirina axêverên wî zimanî dike bingeh. Her wiha li dijî îdelan derdikeve û diyar dike ku ziman û hemû afrîneriya zimanî li dinyayê di navbera axêverên wî zimanî de bi rêya lihevkirinê peyda bûye/afiriye. Rengvedana van her du têgihîştinan di serdema antîk de di çarçoveya qada felsefê û mantiqê de xwe nîşan dide.

1.5. Semiyotîk di Sedsalên XVII û XVIII de

Di sedsalên XVII û XVIII de felsefevanên wek Leibniz, Locke, Diderot, Condillac, Lambert di avakirina teoriyeke gelemperî ya wate û ziman de bi nîşanekan re mijûl bûne û di derbarê wesfên nîşanekan de analîz kirine. Nemaze John Locke di pirtûka xwe ya bi navê *An Essay Concerning Human Understanding* (Li Ser Gaveke Mirov Ceribînek)⁹ [1690] cih daye pirsgerêka semiyotîkê û di wateya doktrîna nîşanekan de peyva semiyotîkê bi kar aniyê. J. Lock di pirtûka çaran a vê berhemê de beşeke cûda ji semiyotîkê re vediqetîne û wê ji zanistên din cûda dike. Li gor wî armanca doktrîna nîşanekan analîza bikaranîna çawaniya nîşanekên ku ji bo têgihiştina heş an jî hînkirina agahiyan e bo kesekî din (Rîfat, 2009: 28).

2. Du Pêşengên Semiyotîka Modern: Charles Sanders Peirce û Ferdinand de Saussure

2.1. Charles Sanders Peirce

Xebatên li ser semiyotîkê li Emerîka û Ewropayê hema bibêje di heman demê de dest pê kirine. Lê Tahsin Yücel diyar dike ku pêşengiya Charles S. Peirce beriya ya Ferdinand de Saussure e û êdî kes nakeve vê nîqaşê jî. Li Emerikayê felsefevan, matematîkzan û pisporê mantiqê Charles S. Peirce (1839-1914) bi xebatên xwe zanista semiyotîkê kir wek zanistêke serbixwe (Yücel, 2020: 110, Uçan, 2016a, Rîfat, 2009). Têgihîna Peirce rê li ber semiyotîkê vekir ku ji bilî zimanzanê û wêjeyê di qadên din de jî derbasdar bibe (Erkman Akerson, 2019: 61). Wî teoriyeke nîşanekên zimanê û der-zimanê ava kir û navê “semiotîk” lê kir û wê wek tenê rêziman, mantiq û tenê peyvzanî veqetande sêyan. Ev sê şaxên semiyotîkê hem dê her cûre diyardeyan analîz bikin hem jî nîşanekên zimanê û der-zimanê kategorîze bikin. Li gorî Peirce; nîşanek ew tişt e ku “ji bo kesekî, cihê tiştêkî, ji aliyekî ve yan jî bi regdêrekê cihê tiştêkî digire. Li hember kesekî ye, bi gotineke din di heşê vî kesî de nîşanekeke hevcot an belkî jî dikaribe nîşanekeke pêşketî biafirîne. Ev nîşaneka ku hatiye afirandin ez wê wek şîrovekerê nîşaneka yekem binav dikim. Ev nîşanek cihê tiştêkî digire. Wate, cihê bireserê (îng. object) digire”, li gor wî her çî qas gerdûn bi nîşanekan nehatibe dagirtin jî nîşanek jê difûrin (Elyıldırım, 2020: 30, Rîfat, 2018a; Rîfat, 2009, Yücel, 2020). Wek ku ji pênaseya Peirce jî tê fahmkirin wî sînore semiyotîkê gelekî berfireh kiriye û xwestiye hemû nîşanekan di vê çarçoveyê de binirxîne.

⁹ J. Lock di pirtûka çaran a vê berhemê de (Li Ser Perçekirina Zanistan) zanistan vediqetîne çar beşan û wan bi têngên yewnanî wisa binav dike: 1. Physike an jî felsefeya xwezayê; 2. Praktike (beşa herî girîng wek Etîk [Ehlaq] tê binavkirin); 3. Semeiotike an jî doktrîna Nîşanekan (Logike an go wek Mantiq tê binavkirin).

Têgihîna Peirce ya nîşanekan gelekî berfireh e, li gor wî pêkan e ku em bi çavekî semiyotîkê li hemû zanistan binêrin; ji ber vê sedemê ew semiyotîkê wek şaxê zanistekê gerdûnî dihesibîne ku hemû qadên jiyane dorpêç dike. Lewma jî Pierce nîşanekê wek pêvajoyê sê lêlatî (îng. triadic; tr. düzlem) pênasê dike. Di lêlataya yekem de ku wek “pêştîni (îng. fitness; tr. ilklîk) bi nav dike, em li şiklekî şênber (representamen) diqelibin”. Di vê lêlatê de em tiştên ku xîtabî sehekên me dikin dibînin; wek bihîstin û dîtine. “Ev tiştê şênber ku em lê diqelibin di eslê xwe de tiştêkî din temsîl dike. Ji bo ev têkilî pêk were divê tiştê ku tê temsîlkirin (thing, object) jî hebe. Di navbera yê/a ku temsîl dike (representamen) û tê temsîlkirin (object) de peywendiyek, pevgirêdanek heye ku ev têkilî qonaxa duyem e (secondness).” Lêbelê ji bo ev têkilî bê danîn hewcehî bi qonaxa sêyem (thirdness) heye ku di vir de ya girîng; pêvajoya şîroveyê ye, da ku bê çî tê temsîlkirin ji bo têgihîştin û nasîna vê têkiliyê. A sêyem jî pêvajoya şîrovekariyê (interpretant) ye (Erkman Akerson, 2019: 62-63).¹⁰

Peirce ku têgihîna wê ya semiyotîkê berfireh bû, dixwest senifandineke nûwaze ya diyardeyên semiyotîkê çêke û bi vê armancê jî di dawiyê de navnîşekên ku têkildarî sêhanyê ye pêk tîne û di qonaxa dawî de jî pergala nîşanekan disêwirîne ku ji 10 sêhanyan û 66 kategoriyan pêk tê (Rifat, 2020a: 117, Çevirme, 1999). Wek ku ji pênasêya wî ya semiyotîkê (ku me li jor eşkere kiribû) jî diyar dibe ji bo dîzayna Peirce têgînên wek nîşanek (representamen), şîrovekar û obje gelekî girîng in. Ev hemû pêvajoya senifandina semiyotîkê ku Peirce dixwaze pêk bîne toeriya wî hinekî tevlihev dike ku Tahsin Yücel ji bo xwesteka Peirce ya ku hewl dide hemû objeyan (zanîn) bike mijara semiyotîkê, ji bilî berfirekirina sînorên vê zanista ku nû pêk tê, wek şolîkirinê mijarê dibîne. Her wiha vê hewla Peirce semiyotîkê ne wek zanistekê ku xwedî qadeke taybet, lê wek zanistekê gelemperî dihesibîne (Yücel, 2020: 111).

2.2. Ferdinand de Saussure

Ferdinand de Saussure (1857-1913) Swîsreyî ku wek pêşengê zimanzaniya modern tê hesibandin, cara yekem di pirtûka xwe ya bi navê “Cours de Linguistique Générale” (Dersên Zimanzaniya Giştî) de têgîna “Semiyotîkê” (sémiologie) bi kar tîne. Ku ev pirtûk piştî mirina wî ji aliyê xwendekarên wî ve notên dersên wî wek pirtûk hatine çapkirine (Uçan, 2016a: 95, Rifat, 2009). Saussure, di vê xebata xwe de bi tevahî di du beşan qala semiyotîkê dike lê li hember vê pêşniyazên wî yê ji bo vê zanista ku nû derdîçe wî jî bi Peirce re dike pêşengekî


¹⁰ Lêbelê ev pêvajoya şîrovekariyê ne hêsan e. Şîrovekirineke ku ji yê/a ku temsîl dike ber bi yê/a ku tê temsîlkirin ve diçe, lê tiştê ku tê temsîlkirin di eslê xwe de nîşanekê ku ji berê ve hatiye şîrovekirin, ne objeyekê ku rasterast ji dinyaya derve tê îdraq kirin.

mezin. Ew ziman wek “pergaleke nîşanekan ku têgihan amaje dike” pênase dike ku “ji ber vê sedemê, dibe ku bi nivîsê, bi alîfbêya kerr û lala, bi merasîmên pîroz yên bi sembolên wesfdar, bi tevgerên ku wek nîşaneyên zarîftiyê tèn hesibandin, bi diyardekên leşkeran, wd., were berawirdkirin. Lêbelê, ziman pergala herî girîng e ji wan” (Saussure, 1998: 46). Û ji ber van sedeman jî Saussure diyar dike ku “zanistek dikare were avakirin ku di navenda jiyana civekê de li jiyana nîşanekan lêbikole”, lê hêj jî zanistekê wisa tune ye. Her wiha Saussure erka semiyotîkê jî diyar dike, li gor wî semiyotîk ew zanistekê ku dê fêrî me bike bê ka nîşanek çî ne û girêdayî kîjan rêgez in. Heta gavekê bi pêş ve diçe û zimanzaniyê wek beşeke semiyotîkê dibîne ku li gor wî rêbazên ku ji aliyê semiyotîkê ve dê bîn dîtin dikarin li zimanzaniyê jî werin sepandin (Saussure, 1998: 46).


Saussure, li hember wê fikrê derdikeve ku ziman wek pergala navdêran dibîne. Li gor wî nîşaneka ziman bireserekê (object) û navdêrekê nake yek, lê tênginekê û îmajê bihîzê dike yek (Saussure, 1998: 110). Wek ku ji vê destnîşanê jî diyar dibe nîşandêr û nîşanbar ji hev venaqetin, bo nimûne; di kurdî de nîşandêra peyva ‘sterkê’ bilêvkirin ango dengê ‘stêrkê’ ye, nîşanbara wê jî têngîna ‘stêrkê’ ye. Kesekî ku vê bibihîze ji bilî stêrkeke rasteqîn têngîna strêkê di heşê wî/wê de peyda dibe. Yanî wate ji îmajê deng û nîşaneka maddî ya têngîna û nîşanbera ku hinartina têngîna zêhnî dike, pêk tê (Elyıldırım, 2020: 27).

Nîşanek, di eslê xwe de erka temsîlkirinê, girtina cihê tişteki pêk tîne. Em li ser vê meseleyê sekinibûn (bnr. Wate û Pênaseya Semiyotîkê). Saussure Saussure li pey wê yekê nakeve ka nîşanek cihê çî digirin an jî çî temsîl dikin; vê wek karê zimanzan nabîne, li gor wî nîşanek ji tênginekê û derbirîna wê pêk tê (Erkman Akerson, 2019: 88). Yanî têngîna û îmajê bihîzê nîşanekê pêk tînin. Nîşanek di zêhna me de ye û bi bilêvkirinê yan jî bihîstinê ew rû dide.

Têgihana Saussure ya nîşanekê ji cotek binyatê (dyadic) pêk tê ku ew jî ji nîşandêr û nîşanbarekê pêk tê. Têngîna di zêhna me de bi ziman re rû digire û derdiçe û ev têngîna razber e (Erkman Akerson, 2019: 89). Yanî têngîna pênûsa di zêhna me de ne pênûseke rasteqîn e, ev pênûseke îdeal e dibe ku me berê ew dîtibe jî yan me nedîtibe jî ev pênûseke çawalêhato ye. Ev her du hêman yanî têngîna pênûsê û derbirîna wê (îmajê bihîzê) nîşanekê pêk tîne. Û derbirîna vê têngîna di heman demê wê dike têngîneke şênber. Ji ber ku mirov dikare xwe bi xwe jî bi xwe û tişteki ku berê ji ber kiribe di dilê xwe de dubare bike Saussure nîşaneka ziman wek xwebûneke du layen û zêhnî pênase dike û wê bi şemaya jêrîn xêz dike (Saussure, 1998: 110).



Xaleke din a girîng jî bê sedemiya nîşanekê ye, li gor Saussure; nîşaneka ziman bê sedem e. Bo nimûne, ti pêwendiya têtîna “bira” bi rêzkirina dengê b-i-r-a re ku nîşandêrê wê ye tune. Rêzkirineke cûda yan jî guherîna van tîpan jî dikare heman wateyê pêk bîne ku hebûna zimanên cûda vê piştrast dike. Bo nimûne, di kurdî de ‘kuçik’, di tirkî de ‘köpek’, di farisî de ‘seg’ di îngilîzî de ‘dog’, û di almanî de jî dibe ‘hund’. Wek ku me li jor jî gotibû, Saussure diyar dike ku nîşandêr û nîşanbar ji hev venaqetin, lê ev têtîliya di navbera wan de ne têtîliyeke misoger e ku ji berê ve hatiye danîn. Li ser wateyê ji aliyê axevêrên wî zimanî ve lihevhatinek heye ku vê têtîliyê sererast dike û ev nîş bi nîş tê veguhaztin lewma jî Saussure nîşaneka ziman bê sedem dibîne (Saussure, 1998: 112, Erkman Akerson, 2019: 90). Li gor wî peyvên ku objeyan pênase dikin ji kuderê hatine û bi çî armancê li wan objeyan hatine kirin ne mijara nîqaşê ye.



2.3. Berawirdkirina Peirce û Saussure

Ev her du lêkolîner ku wek pêşengên semiyotîkê tên hesibandin, di sedsala 20an de xebatên gelek girîng li ser vê zanistê kirine ku nû derdîçe. Lêbelê têtîghana wan a semiyotîkê

¹¹ Şemaya Saussure ji du hêmanan pêk tê; nîşanbar û nîşandêr. Lê ji bo mijar baştir were fahmkirin Erkman Akerson hin detay li vê şemayê zêde kirine. Di şemaya resen de şandêr û hilgir tune ne.

ji hev cûda ye. Têgihana Peirce xwe dispêre bastûreke sêhaniyan û şîroveyan ku li ser vê bastûrê kirine, heta ku ev zanist nekemilî nehatin fahmkirin. Bi gotina Yücel ev tenê mijarê şolî dike (Yücel, 2020: 111), lewra zanista semiyotîkê wek qadekê hê nû di nav zanistan de xwe cîbicî dike, lê şîrove û senifandina Peirce sînoren qada lêkolînên li vê zanista nû berfireh dike û ji bo serdema xwe fahmkirina wê zehmet kiriye. Brevajî wî, Saussure li ser nîşanekên zimanî xebitiye û modeleke nû û sepanî bipêşxistiye. Her wiha Peirce têgihîştineke berfireh ya semiyotîkê ku hemû diyardeyan dorpêç dike ava dike, lê Saussure bi bikaranîna helwesta semiyotîkê sepanên ragihanê yên ku tên ravekirin diyar dike (Elyıldırım, 2020: 35, Rifat, 2020a). Di heman demê de Peirce semiyotîkê hevberî zanista mantiqê dibîne û mantiqê wek doktrîna şiklî ya navekî semiyotîkê dibîne û wê wek “*sémiotique*” binav dike, lê Saussure wê wek “*sémiologie*” pênase dike (Uçan, 2016b: 122).

Ev pênase ji pênaseyan yekem yan ve zanista nû ne û bi awayekî berfireh û gişgir in. Lêbelê, bi qewlê J. M. Klinkenberg îroro “*sémiologie* dîsîplîna ku her cure zimanan di hewîne îfade dike (zimanên mirovan û zimanên qadeke taybet, bo nimûne; îngilîzî, almanî, zimanê futbolê, zimanê tibê û wd.) lê *sémiotique* îfadeya birêserê/obje ye ku ji aliyê vê dîsîplînê ve tê şixulandin”. Bi gotine din *sémiologie*, semiyotîkeke gelemperî, *sémiotique* jî îfadeya hin cure qadên ve dîsîplînê dike (bo nimûne, semiyotîka wêjeyî, semiyotîka reklamê û wd. (Uçan, 2016b: 122).

Ev her du lêkolîner her çî qas bi helwestên cûda nêzî ve zanista nû bûbin jî, Saussure ku li ser nîşanekên zimanî ketibû rê hemû nîşanekan bê sedem û keyfî dibîne (nemaze jî nîşanekên zimanî) û wek hêmanên ku têkiliya nîşandêr-nîşanbarê pênase dikin wan rave dike. Peirceê nîşanekên keyfî wek sembolê binav dike û di navbera diyarker û remzê de du cure nîşanekên bisebeb ji hev vediqetîne û du re jî wek encama modela Saussure dawî lê tîne (Elyıldırım, 2020: 35).

3.Semiyotîka Vegêranî: Wêje

Li gorî pênaseyan li jor yan semiyotîkê, ji zanistên siruştî bigirin heta yan beşerî semiyotîk xwedî qadeke berfireh e. Di vê çarçoveyê de semiyotîk bi zanistên wek felsefe, tib, matematîk, mîmarî, resm, wêje û wd. di têkiliyê de ye. Ev têkilî ji serdema antîk û vir ve hatiye nîqaşkirin û li ser van zanistan hewla pênaseya rêzikên semiyotîkê hatiye dayîn da ku rêbazeke xwerû ji bo semiyotîkê bê xêzkirin. Qada sereke ya ku tehlîlên tekûz yan semiyotîkî pêk hatine metnên nivîskî ne. Di vê qadê de lêkolînerên wek Algirdas-Julien Greimas, teşenasên rûsî yan wek Vladimir Propp û Roman Jakobson û Roland Barthesê ku bi gotara

xwe ya bi navê “Destpêka Tehlîla Binyadî ya Vegêran” ku balê dikişîne ser mijarên wek, zimanê vegêr, fonksiyon, kiryar, vegotin û pergela vegêr ku em dikarin wek pêşengên semiyotîka vegêranî bihesbînin. (Günay, 2020: 72-73). Di vê wateyê de li gor Gérard Genette vegêran bilêvkirina devkî yan jî nivîskî ye ku barê neqilkirina ragihana vegêr, îfadeya bûyereke yan jî ya rêzebûyeran hildide ser milê xwe (Genette, 2020: 13).

Em ê di bin vî sernavî de bi kurtasî behsa rêbaza semiyotîkê bikin ya ku ji bo tehlîlên metnên nivîskî guncav dibîne ku bi taybetî jî rêbaza tehlîla helbestê, lewra helbest xwedî rêbazeke cûda ye ji cûreyên din yên wêjeyê.

Beravajî rêbazên din yên ku gava metneke nivîskî tehlîl dikin hêmanên der-metnî dikin navend, semiyotîk di vê wateyê de metn dike navend û tehlîla xwe bêyî ku hêmanên der-metnî tevî tehlîlê bike pêk tîne. Di tehlîleke metnnavendî de çarçoveyê dahûrînî tê diyarkirin ku di vê çarçoveyê de cudatiya metnî û dermetnî tê kirin û metn dibe navenda vê dahûrînê. Tevahiya deng/peyv/hevok û hevokên ku li dûv hev tîne û tevahiya sererastkirinên zimanî yên ku di derbarê van hêmanan de tîne kirin wek “metn” tê pênasekirin. Bi gotineke din metn, “bi destpêk û dawîya xwe binyateke girtî pêk tîne ku dikare wek binyateke watedar were pênasekirin ku nîşanekên zimanî li dûv hev tîne” (Güzel, 2012: 31). Di vê çarçoveyê de semiyotîk ew teorî ye ku di metnê de, hevok û tîkiliya di navbera wan de, remz û sembol, sazûmana metn û tîkiliya di navbera van hemû hêmanan de dinirxîne û bi vî awayî jî dixwaze bigihêje binyata kûr a metnê.

Di çarçoveya semiyotîkê de ji bo nirxandinê helbest cureyê gelek baş e. Lewra helbest di kîjan dîrokê de, bi kîjan zimanî yan jî ji aliyê kîjan helbestvanî ve hatibe nivîsandin jî, her tim dikare ji nû ve û bê sînor were hilberandin û her tim ji nû ve dikare were ‘xwendin’(Gökalp, 1989: 363). Bi vê layena xwe helbest ji pexşanê û ji cureyên din yên wêjeyê vediqete. Lêkolînerên wek A. J. Greimas ku li ser binyatgerî, semiyotîk û tîkiliya wê ya bi helbestê re lêkolîn kirine di derbarê cûdahiya di navbera tehlîleke semiyotîk ya li ser vegêr û helbestekê wisa rave dike:

- a) Helbest û tîgiha nivîsê ne di heman qadê de ne.
- b) Wek rêgezeke serbixwe ye ji zimanê ku jê derçûye.
- c) Hestkirina wê ya ku hem “helbestî” hem jî “pîroz” dixuye, girêdayî sinifa bilêvkirinên xwedî çawaniyê xwerû ne ku bandora wateyî pêk tînin (Gökalp, 1989: 363).

Di vê peywendê de ji bo tehlîleke helbestê divê nirxandinên xwerû û cuda ji yên cûreyên din yên wêjeyê bê sepanandin. Di vê çarçoveyê de Gonca Gökalp pênase û qonaxdanîna Roland Barthes ya bi navê “têgihîştina vebêjekê” ji bo sepanîna helbestê pêkan dibîne. Ji bo têgihîştina helbestekê divêti bi

- 1) Çavdêriya pêvajoya hûrnêrîna helbestê,
- 2) Dîtina tebeqeyê helbestê,
- 3) Berawirdkirina wate û şikil (Gökalp, 1989: 364, Aykanat, 2013:)

heye. Bartes, çar hêmanên bingehîn pêşniyaz dike ji bo dahûrandina helbestê; rêgeza ‘şêwedanê’ li ser şiklê berhemê lédikole. Rêgeza ‘veqetînerî’ wateyê dike bingeh û her cûre girêdanên metnî û der metnî vedigire. Rêgeza ‘gelejmarî’ jî di metn de li wate û derfetên wateyê digere. Û rêgeza dawî jî ‘kirariyên sazîkirinê’ ye ku pêşniyaz dike ku metn di sê qonaxan de were dahûrandin. Ev qonax; ‘beşkirin’ veqetîna metn a yekeyên xwendinê, ‘kitekit’ destnîşankirina kodên metn e, ‘sererastkirin’ diyarkirina têkilî û erkên yekeyan, destnîşankirina têkiliyên matnî û navmetnî (Gökalp, 1989; 364).

4.Ekola Semiyotîkê ya Parisê

A. J. Greimasê (1917-1992) Lîtvani wek semiyotîkzanê fransîzî tê zanîn ku avakerê semiyotîka mantiqî-matematîkî ye, her wiha ew seroka Ekola Semiyotîkê ya Parisê ye ku ev ekol li derdora wî hatiye avakirin (Rifat, 2020b: 334). Ji bilî Greimas çar nûnerên vê ekolê yên girîng hene.

5.Wate û Semiyotîk

F. de Saussure bi cihdana têgihên wek nîşandêr û nîşanbar di berhema xwe (Dersên Zimanzaniya Giştî) de ji bo lêkolînên li ser semiyotîkê û zimanzaniyê rê li bergehên cûda vekir. Her wiha wî nîşanek veqetande du hêmanên bi navê nîşandêr û nîşanbar û di vê çarçoveyê de pênaseya erka semiyotîkê kir.

Teşenasê rûsî V. Proppe bi lêkolînên li ser çîrokên gelêrî, derxiste meydanê ku di çîrokan de karaktêr diguherin lê rêza qewimîna bûyeran û erka karaktêran naguhere û bi vî awayî hêvî kir ku şixulîna navxweyî ya vegêran derxe holê. Piştî V. Proppe, A. J. Greimas jî di pirtûka xwe ya bi navê *La Sémantique Structurale* (Watenasiya Binyadî) cara yekem teşeya şixulîna navxweyî ya metnekê û pêvekirina binyada wateyî di pergala nîşanekan de derxiste holê. Greimas, di vê pirtûkê de 6 kiryanan destnîşan dike, fonksiyona van kiryanan tê

diyarkirin û li gorî vê modelê (Modela Kiryarvanan, tr. Eyleyenler Modeli) çend heb tehlîlên semiyotîkê tên kirin. (Uçan, 2016: 95, Günay, 2020). Her wiha bi diyarkirina qada têtîni ya semiyotîkê Greimas ev zanist wek rêbazeke tehlîlê ava kir. Semiyotîka Greimas çavkaniya xwe ji zimanzaniyê digire û bi têtîni û rêzikên zimanzaniyê tevdigere (Uçan, 2016b: 123).

Armanca sereke ya semiyotîkê lêkolîna pêvajoya pêkhatina wateyê ye, bi vê mebestê, tehlîla ku rêziman di asta sentaksî de dike, semiyotîka wêjeyî di asta vegêran de vê dike û bi diyarkirina binyada di vêtêranê de jî dixweze bide nîşandan bê ka çawa wate pêk tê û di encamê de jî dixweze rêzimana vegêran derxe holê (Uçan, 2016b: 124).

Semiyotîk li pey wateyê ango li pey danûstandinê diçe, cihê ku wate lê tune be danûstan din jî lê tune, ji ber vê sedemê li gor Greimas mijara bingehîn ya semiyotîkê wate ye, lewma jî bi Greimas re pîrsgirêka semiyotîkê wek “pîrsgirêka wateyê, ji bo mirov wateya dinyayê û wateya mirov” ku were teqezkirin dê ne çewt be. Semiyotîk hem li ser şertên pêkhatinê û fahmkirina wateyê fikrîneke giştî ye hem jî di pêvajoya tehlîla bireserên watedar yên şênber de kome-rêbazeke sepîner e û bi vî awayî jî wek zanistêke serbixwe ye (Yücel, 2020: 126, 127). Di tehlîlên semiyotîkê de armanca bingehîn lêhûrbûna wate û pêkhatina wateyê ye. Ji ber vê sedemê jî biresera ku bûye mijara lêkolînê divê xwedî binyadeke temambûyî û hevgerî be. Ev biresera temambûyî ku tê dahûrandin ji hilgir re dibe xwedî peyamekê û bi amrazên semiyotîkê jî armanca û amraza pêkhatina wateyê tê destnîşankirin.

Li gorî Greimas ji bo gerdûn li gor me bibe xwedî awayekî an jî wateyekê divê em di wê de hinek cudahiyan ferq bikin û ferqkirina cudahiya jî,

- 1) herî kêma du heb bireser-terma wek bireserên bi hev re tê bigihê,
- 2) têtîhiştina di navbera terman (an jî bireseran) de jî, pêkvekirina wan a bi awayekî ye.

Hebûna du terman an jî hebûna peywendiyê di navbera wan her du terman de. Û wek encama neyekser a di navbera wan de,

- 1) bireserek-termek bi tena serê xwe ne xwedî wateyekê ye ku,
- 2) em dikarin bibêjin ku wate her tim peywendiyekê ferz dike, lewma jî bi teqezî şerta heyîna wateyê peywendiya di navbera terman de ye,

Ku ev qebûl vê bi me dide destnîşankirin:

- 1) ji bo ku du bireser-term bi hev re werin têtîhiştin divê aliyekî wan yê hevpar hebe,

2) her wiha ji bo du bireser-term ji hev werin cudakirin divê bi awayekî ji hev cuda bin (Yücel, 2020: 129).

Bi gotineke din ji bo ku bireserék-termek ji hev werin cudakirin an jî şibandin şerta aliyê wan yên ji hev cuda û yên ku dişibin hev divê werin destnîşan kirin û peywendiya di navbera van aliyan de.

6. Modela Kiryarvanan

Di semiyotîka A. J. Greimas de modela kiryarvanan (tr. eyleyenler modeli) wek binyada serkî ya metnê nîrxandin. Wek ku tê zanîn cara yekem zimanzanê fransî Lucien Tesnière têgîna *kiryarvan* (actant/eyleyen) bi kar anîye ku têgîna *kiryar* di îfadeyê de “di qewimîna ku kiryar wê amaje dike de heyîn an jî biresera ku bi awayê lebatî an tebatî beşdarî wê qewimînê dibe” îfade dike. Bi gotineke din, “kesê ku kiryarê dike yan jî di bin bandora wê de dimîne” (Yücel, 2020: 146, Uçan, 2016b).

Bo nimûne:


Mîrze Mihemed sêv xwar.

Sêv xwar/in.

Di hevoka yekem de kiryar ji aliyê Mîrze Mihemed ve û bi îradeya wî hatiye kirin lewma jî ev hevok lebatî ye, beravajî wê di hevoka duyem de kiryar ji aliyê kesekî/kesên ne diyar ve hatiye pêk anîn ku ev jî wê dike hevoka tebatî. Lebelê ji ber ku kiryar ji aliyê heyîn an jî bireserê ve hatiye kirin girîng e têgîna kiryarê ji têgîna kes berfirehtir e, dibe ku ev mirov be, an ajalên dirinde an bireserêk be. Her wiha dibe ku ev yekjimar an pirjimar jî be û razber an şênber jî be. Ji aliyekî din ve ji ber ku kiryar an jî fonksiyon li pêş tê hêmana ku di lêlata vavêrê de wek heyînekê an jî bireserêkê tê pênasekirin di lêlata naverokê de dibe ku çend fonksiyonên kiryarê li xwe bigire. Bi gotineke din dibe ku beramberî çend kiryarên be (Yücel, 2020: 146).

Şemaya kiryarên ji têgîna “fonksiyon” a V. Propp hatiye wergirtin û bipêşxistin. Li gor Propp her çî qas kesên di vegêranê de biguherin jî fonksiyonên wan naguherin. 31 fonksiyonên ku Propp destnîşan kiribûn ji aliyê A. J. Greimas ve di sala 1966an de tîn berfirehkirin û wek şeş kiryarên ji nû ve tîn destnîşankirin (Uçan, 2016b: 145, Rifat, 2020a). Her wiha nivîskarê fransî Etienne Souriau jî di berhema xwe ya bi navê *Les 200 000*

situations dramatiques de heman helwestê dişopîne û hemû lîstikan bi şeş “fonsiyonên lîstikî” pêname dike. A. J. Greimasê encamên ku ji aliyê van her du lêkolîneran ve hatibûn destnîşankirin bi pêş dixê û modela kiryarvanan ya li jêr pêk tîne (Yücel, 2020: 147, Kıran, 2007):



Di serî de em ê van têgihan û cihê wan yê di vê rêbazê de bi mînakên yek bi yek rave bikin:

Şandyar:

Derbirîna dide dertpêkirin. Biresera lêgerînê diyar dike û ji bo dîtina vê bireserê bi hesta ku ji ber kêmasiya wê peyda bûye lehengekî dixê rêya wê;

Bireser:

Mijara lêgerînê, kiryara ku di derbirînê de tê lêgerîn;

Kirde:

Di derbirînê de li gor bangewaziya şandyar tev digere û pê re peymanekê datîne û li dû biresera ku bûye mijara lêgerînê diçe da ku wê bibîne û bîne;

Astengêr:

Ew kiryar (eyleyen) e ku dixwaze lêgerîna kirdeyê asteng bike. Bi gotineke din Dij-Kirde.

Alîkar:

Ew kiryar e ku di pêvajoya lêgerîna Bireserê de karê Kirdeyê hêsan dike.

Hilgir:

¹² Di hin çavkaniyên tirkî de ji dêvila *hilgir*, têgîna *rewandar* (gönderilen) tê bi kar anîn. Lêbelê li gor ancama vê lêkolînê me tesbît kir ku têgîna *hilgir* bêtir tê bi kar anîn lewma jî me ew tercîh kir.

Ew kiryar e ku Biresera bûye mijara lêgerînê, bi encama lêgerîna kirdeyê bi dest dixê û kirdeyê xelat dike. Her wiha li hember têkçûna kirdeyê li gor peymanê ku di serî de danîbûn ceza dike (Rifat, 2020a: 204).

Di çîrokeke Mîrze Mihemed de padîshahekî hêzdar heye (Şandiyar); erkekê dide wezîr (hilgir); Mîrze Mihemedê ku di vir de kirde ye li tiştêkî (dibe ku ev mirov be, qîza periyên be yan jî biresereke bi qîmet be) digere û dixwaze bigihêje vî tiştî (Bireser); yê ku li hember vê xwesteka wî radibin (Astengêr); yê ku ji bo dîtina vî tiştî jî alikariyê didinê (Alîkar) hene. Di encama vê lêgerînê de heke Kirde bi ser bikeve li gor peymanê ku di serê çîrokê de hatibû danîn dê were xelatkirin, heke bi sernekeve dê were cezakirin.

Di metnekê de dibe ku li ba Kirdeyê, Dij Kirdeyek hebe, her wiha du kirdeyên ku li dû heman bireserê diçin li gor hev dij kirde ne û di heman demê de erka astengêr jî pêk tînin (Uçan, 2020b: 146). Li gor destpêkê û encama metnê kirde xwe nîşan dide, lêbelê di metnekê de kirdeya ku di serî de wek kirdeyê xuya bike dibe ku di dawîya metnê de wek astengêr bimîne. Ev taybetî bi gelemperî di metnên dûdirêj yê wek romanê de dixuye. Di çîrokên gelêrî ev taybetî kêm e, piranî çîrok bi kîjan kirdeyê derketibe rê bi wî dide xelaskirin û li gor encama vê xelaskirinê jî kirde yan tê xelatkirin an jî cezakirin.

7. Eksenên Fonksiyonê

Ev eksên fonksiyonê kiryanan û qada kiryarê rave dike. Em ê van hemanên modela kiryarvanan di sê eksana de rave bikin û divê em di serî de diyar bikin ku ev ne hemanên rêziman in:


1. Eksena Ragihanê: Ev eksên di navbera şandiyar, bireser û hilgir de pêk tê. Hemû diyardeyên wek ragihan, veguhaztin û hilgir di vê lêlatê de pêk tên. Di vê eksenê de fonksiyonê şandiyar diyarkirina bireserê ye bo hilgir ku kêmasiya wê li dar e. Di heman demê de di vê eksenê de armanca ragihanê ji şandiyar bo hilgir heye. Bireser di vê eksenê de ew tişt e ku şandiyar radigihîne yan jî ew tiştê ku hilgir jê bê par e (Yücel, 2020: 147). Bo nimûne di çîrokên me de padîşah her tim rola şandiyar dilîzin.

Bireser di vir de ew tişt e ku kirde yan jî leheng dixwaze bi dest bixe, ew tişt dibe ku şênber jî be yan jî razber jî be. Di tevahiya çîrokê de mijara vegotinê ev lêgerîn e, lêgerîna kirdeyê ye ku kirdeyê bê bireser an jî biresereke bê kirde nîne (Kıran, 2007: 273).

2. Eksena Xwestekê: Ev eksen di navbera kirde û bireserê de pêk tê. Ev eksen ku ji ber xwestekên lebatî pêk tê. Di vir de çavkaniya ragihanê ne kirde ye lêbelê bi pêkanîna tevgerên xwe û xwesteka li hember bidestxistina bireserê dike ku bireser bigihêje hilgir. Bo nimûne di destana Memê Alan de Memo kirde, Zîna ku bi salan lê tê gerîn ji wek bireserê tê pênaskirin.
3. Eksena Lebatî: Ev eksen jî di navbera alîkar, kirde û astengêr de pêk tê. Kirdeya ku êdî ji xwestekê ber bi pêkhatinê ve diçe di vê lêlatê de tê nirxandin. Ango kirde êdî hemû hêza xwe hilgirtiye û xwe li hember hemû astengan parastîye (Yücel, 2020: 147, 148). Ev hêz dibe ku tiştêkî şênber be (şûr, xencer, ajal û wd.) jî yan jî razber be (agahî, sehr û wd.). Ev hemû fonksiyon di alîkar de dicivin û bi xêra wî pêk tên.

Di hin rewşan de dibe ku **şandyar** bibe **kirde**, **alîkar** jî bibe **astengêr** û dibe ku çend leheng rolekê tenê ya kiryarî werbigirin. Ji kiryarên bi rengî re **kiryarên hevpar** tê gotin (Kıran, 2007: 272).

Rewşa van eksenan em dikarin bi şemayekê bidin nîşan:



Wek ku li şemaya jorîn jî dixuye Hilmi Uçan (2016b: 147) pênaseya Tahsin Yücel ya eksenan bi detay kiriye.

Di modela kiryarvanan de dibe ku hemû hêman bi hev re nexuyîn. Carina di hin çîrokan de her şeş kiryar bixuyîn jî di hinan de dibe kêmtir derbikevin. Carina hêmanek çend heb kiryarên fonksiyonê hildide ser xwe û hem dibe şandyar hem jî dibe hilgir. Tahsin Yücel diyar dike ku ev problemekê pêk nayîne; lêbelê heke ku em qala sazgerîneke kiryarî bikin, herî kêrî divê her du kiryarên (eyleyen) bingehîn angê divê kirdeyek û bireserek bîn teqezkirin (Yücel, 2020: 149).

8. Îfade

Îfade û hevok têgihên ji hev cûda ne û ji dêvila hev re nayên bikaranînan. Îfade beriya her tiştî şênber e û divê ji aliyê kesekî ve hatibe gotin an jî nivîsandin... bi gotineke din îfade diyardeyeke zimanî ye ku nivîskî yan jî devkî ye û li cihekî diyar, di demeke diyar de ji aliyê kesekî diyar ve hatiye bilêvkirin (Kıran2007: 125). Her wiha îfade wek têgîneke semiyotîkî, di zimanzaniyê de binyada tîprêziyî ya herî piçûk e û di lêlata naverokî de beramberê hevoka bingehîn e ya ku ji kirde û pêveberekê pêk tê. Di vê binyadê de li gor cihê kirde û pêveberê em dikarin qala du îfadeyên bingehîn bikin; îfadeya rewşê û îfadeyaa kirinê. Heke em van cûre îfadeyan bi mînakên A. J. Greimas ve rave bikin:

Ev cil baş lê tê

Ev zarok tê dibistanê

Ji van hevokan ya yekem îfadeya rewşê, ya duyem jî îfadeya kirinê ye. Wek ku ji van hevokan jî diyar dibe di hevoka yekem de rawestinek, seknek heye, lê di ya duyem de tevgerê heye. Ev rewş bi *pêkvebûn* an jî *jêkvebûnekê*, yan jî taybetiyeke ku bireser xwediyê wê yan ne xwediyê wê yan jî kesek ka xwediyê birserê ye yan na dikare were ravekirin (Yücel, 2020: 149). Ev taybetî hema bibêje di binyada hemû çîrokan de heye, heta em dikarin bibêjin ku çîrok li ser vê binyadê tên avakirin. Kirde ji ber ku ne xwediyê wê bireserê ye derdikeve rêwitiyekê (me li jor diyar kiribû ku ev bireser çî ye yan çî ne) û di encama vê rêwitiyê de vê bireserê bi gelemperî bi dest dixê. Lêbelê dibe ev rewş bi heman awayê din jî pêk were, bi gotineke din di encama vê rêwitiyê de dibe kirde ji biresera xwe dûr jî bikeve û têkeve rewşa *jêkvebûnê*. Wê demê du cure îfadeya rewşê hene ku yek jê; îfadeya *pêkvebûyî* ya rewşê, ya duyem jî îfadeya *jêkvebûyî* ya rewşê ye (Yücel, 2020: 150).


Di îfadeya *pêkvebûyî* ya rewşê de kirde û bireser bi hev re ne ku ev bi sembola “ \cap ” tê nîşandan. Bo nimûne: Memê Alan xwediyê bozê rewan bû ($K \cap B$), Mîrze Mihemed bi sira jinê hisiya ($K \cap B$), Siyabed gihaşte Xecê ($K \cap B$). Beravajî vê di îfadeya *jêkvebûyî* ya rewşê de kirde û bireser ji hev cihê ne. Bi gelemperî di seriyê derbirînê de ev rewş li dar e, lê di dawiya derbirînê de bi gelemperî ev rewş diguhêre û kirde digihêje biresere. Di rewşa ku kirde ji bireserê dûr e bi sembola “ \cup ” tê bişandan. Bo nimûne: Mem ji Zînê dûr e, yan di dawiya derbirînê de Zîn dimire ($K \cup B$), Mîrze Mihemed bi pey sira ku jê re bibû merak ket ($B \cup K$), Siyabend ji çiyayê Sîpanê ket û mir û Xecê tenê ma ($K \cup B$). Meriv dikare mînakên bi vî awayî zêde bike.

9. Bernameya Derbirînê

Bernameya derbirînê di çarçoveya tehlîlên semiyotîkê de di lêlata serkî de wek têgiheke derdikeve hemberî me ku ev bername ji îfadeyên rewş û kirinên pêk tê. Di her derbirînê de beşên wek “pêşî”, “navbeyn” û “paşê” hene (Uçan, 2016a: 113). Ango beşa destpêkê, beşa ku bûyer diqewime û beşa encamê heye. Metn bi îfadeya kirinê dest bi tevgerê dike, lewma jî kiryar li gor vê rewşê û li gor bikaranînan îfadeyên kirinê veguherînek di wan de pêk tê. Kirde dikeve pey bireserekê, bi gotineke din ji bo ku bigihêje rewşa pêkvebûnê yan jî jêkvebûnê kirineke veguherker pêk tîne (Uçan 2016b: 142, 143). Bi van kirinan îfadeya rewşê bi îfadeya kirinê re cih diguherîne. Ji vê veguherînê û rewşa nû re bernameya derbirînê tê gotin. An jî dikare wek “veguherîna rewşê ku ji aliyê kirdeyekê (K_1) ve hatibe pêk anîn û bandor li kirdeyê (K_2) din kiribe” were pênasekirin (Yücel, 2020: 151).

10. Eksena Wateyê û Veguherîn

Di çarçoveya binyada giştî ya derbirînê de em dikarin qala du xalên girîng bikin: Eksana Wateyê û Veguherîn. Greimas binyada giştî ya derbirînê li ser eksana wateyê bi vî awayî xêz dike:



Têkiliya di navbera /mezin/ û /piçûk/ de hem têkiliya pêkvebûnê hem jî ya jêkvebûnê ye. Hevpariya ven her du têgihan ev e ku her du jî li ser eksenê wateyê (E.W.) ne û /mezinahî/ nîşan dide ku ev jî ji ber pîvana nirxên din (a_1, a_2) yên ku her yek li aliyekî eksenê ne pêk tê. Ev her du têgih beravajî hev in, lewra mezinahiya wan ne yek e. Têkiliya pêkvebûnê ($a_1 \cap a_2$) û jêkvebûna ($a_1 \cup a_2$) van her du têgihên (a_1 û a_2) ku li ser eksenê wateyê ne, binyada bingehîn ya wateyê pêk tînin (Kıran, 2007: 102). Heke em mînakeke şênber bidin dê mijar baştir were fahmkirin, dîsa em bi nimûneya Greimas a qezaya trafikê dewam bikin:

Derbirîn

E.W.(Eksena wateyê: Rewşa erebê)

a₁ _____ a₂

saxlem

xisardîtî

Rewşa erebeyê ya duyem veguherînek (v) e, ev veguherîn di demeke (eksena demê) diyar de pêk tê. Heke ev qeza bibûna mijara derbirînekê dê wisa bibûna: Vegêran qala erebeya xwe ya saxlem (naveroka ku hatiye wergêrê), qezaya ku hatiye serê wê (veguherîn) û xesardîtina wê (naveroka ku tê pêşkêşkirin) dike (Kıran, 2007: 103, 104). Li gor Yücel, her pêvajoya ku bi veguherîna rewşekê bi encam dibe wek derbirînekê tê pênasekirin (Yücel, 2020: 151). Wek ku me berê jî diyar kiribû, vegêran pêşkêşkirina bûyeran ya ji nû ve ye. Lewma jî qezeya erebeyekê ne vegêranek e lê pêşkêşkirina wê ya ji nû ve û veguherîna wê vê pêk tîne.

Bi mînakên Tahsin Yücel em ê bernameya derbirînekê û veguherînan rave bikin:

- 1) Padîşah keça xwe da şivan;
- 2) Şivan dev ji jina xwe berda;
- 3) Zarok fêrî dersa xwe bû;
- 4) Tirs berpirsariyên wî da jibîrkirin.

Her hevok rewş an jî bûyereke cûda vedibêje lê dîsa jî dikare wek bernameya derbirînekê werin nirxandin:

- 1) BD: [K_1 (padîşah) \rightarrow (K_2 (şivan) \cap B (keç))]
- 2) BD: [K_1 (şivan) \rightarrow (K_2 (Şivan) \cup B (jin))]
- 3) BD: [K_1 (zarok) \rightarrow (K_2 (zarok) \cap B (ders))]
- 4) BD: [K_1 (tirs) \rightarrow (K_2 (ew) \cup B (berpirsariyê))]

Diyardekên ku me li vir ew bi kar anîne wisa tînin ravekirin:

BD: bernameya derbirînekê

K_1 : kirdeya kirînekê (a ku kiryarê pêk tîne)

K_2 : kirdeya rewşê

B: bireser

[]: îfadeya kirinê

(): îfadeya rewşê

→: fonksiyona kirinê yan jî veguherîn

∩: pêkvebûn

∪: jêkvebûn (Yücel, 2020: 151, 152).

Wek ku ji van her çar mînakên jî diyar dibe pêkvebûn gihaştina tiştêkî yan jî nirxekê ye û jêkvebûn jî veqîftin an jî dûr ketina ji vî tiştî yan jî nirxî ye. Di mînaka yekem û duyem de kirdeya ku ketiye rewşa pêkvebûn û jêkvebûnê “kes” e. Beravajî van mînakên di mînaka duyem û sêyem de bireserên wek “ders” û “tirs”ê hene. Wek ku di mînakên de jî dixuye ev tişt her tim ne bireserêk maddî ye, dibe ku ev tişt nirxên manewî yên wek; eşq, tirs û wd. be jî. Her wiha çî qas di mînaka duyem û sêyem de du kirde bixuyîn jî ev nayê wê wateyê ku her tim du kirde hene, lê tê wateya ku kirdeyekê du heb erk hilgirtine. Di vê mînakê de şivan bi keça padîşan re di rewşa pêkvebûnê de ye û bi jina xwe re jî di rewşa jêkvebûnê de ye.

11. Beşkirin û Sînorên Beşkirinê

Ji bo di derbirînekê de binyada gişgir derkeve meydana beşkirina metn mecbûrî ye. Ev helwest dê xêzên sereke yên derbirînekê derxe holê ku bi xêra wê “pêşkêşkirina bûyeran û derbirîna vegêr sererast dibe” (Uçan, 2016a: 112) Her wiha beşkirin ji bo xwîner û lêkolîner fersenda dîtina destpêk û dawîya metn peyda dike ku bi vî awayî veguherînen di metn de baştir dê werin ferqkirin.

Lê sînorên vê beşkirinê çî ne?

Bi gelemperî ev sînor hin nîşanekên demê yên wek “îro”, “sibê”, “êvarî” û wd. û yên mekan yên ku veguherînan pêk tînin; “gund”, “bajar”, “newal”, “şikevt” û wd. û tevlibûna karakterên nû ya derbirînekê; keçeke xweşik, marekî mezin, hûtên qirase, padîşahê bajêr û wd. Ev hêmanên/kiyar herî girîng yên derenceya veguherînekê ne ku bi xêra wan bûyer di çîrokên de tên sererastkirin.

BEŞA SÊYEM

1.Çîroka Yekem: Alpiz û Zemmê¹³

Bi navê Alpiz û Zemmê mêr û jinek hene. Zemmê ji Alpiz dixweze ku here diziyê lê Alpiz kesekî gelek tirsonek e. Bi darê zorê ji alizê Zemmê ve diçe diziyê. Gava ku Alpiz diçe diziyê ji berku şev e ji tirsê re xwe li şikevtekê digire. Di vê şikevtê de heft hût hene, her çiqas hût jê bitirsin jî Alpiz ji wan ditirise û bi hileyan wan ji xwe bêtir dide tirsandin. Hût baweriyê bi Alpiz tînin ku ew kesekî derasayî ye û ji bo ku xwe jê xelas bikin zêrê xwe lê para dikin û wî dişînin mala wî.

1.1.Beşa Yekem: Rewşa Destpêkê

Beşa yekem ku bi hevoka “Hebû, kes ji Xwedê mestir tine bû”¹⁴ dest pê dike û bi hevoka “go ma te yê negotana welleh tê herî” bi dawî dibe beşa ku bûyeran dide destpêkirin û di derbarê dem û cih de agahiyên piçûk dide ji bo destpêkê.

Di vê beşê de pêvxistina bûyerê bi kurtasî tê vegotin “go heydê here diziyê, heydê!” Di vir de yê ku erka şandyar bi cih tîne jina Alpiz yanî Zemmê ye (em ê wisa nîşan bidin: K₃) û Alpizê ku erka kirdeyê bi cih tîne jî (em ê wisa nîşan bidin: K₁) ku ji bo pêkanîna bernameyê (kiryarda diziyê) K₁ ji aliyê K₃ ve tê erkdarkirin. Heke ji hêla sentaksî û mantiqî em li kirdeyên binêrin K₃ (Zemmê) K₁ê (Alpiz) bi daxwaza xwe tevdigerîne. Ya ku çîrokê dide destpêkirin jî ev xwesteka K₃ (Zemmê) ye. K₁ mecbûr e vî karî bike lewra ti hikmê gotina wî tune ye, her wiha K₃ karaktereke serdest e. Lewra K₁ zilamekî “ti dinêrî dengê wîrîqîniya rêvi tê min ez ji tirsê re dimirim” tirsonek e û li hember fermanên K₃ nikarî serî rake û gotinê wê pêk neyîne. Di vê çarçoveyê de K₃ bandordar û K₁ bandorgir e yanî di bin tesîra K₃ de ye. Bi vî awayî bernameya derbirînê tê destpêkirin û herikîna bûyeran tê ser xetêke diyar û beşa yekem bi vî awayî bi dawî dibe.

Têkiliya ku di navbera yekeyên vegotinê de pêk tê em dikarin wisa xêz bikin:

<u>Şandyar</u>	<u>Kirde</u>	<u>Bireser</u>	<u>Hilgir</u>
(K ₃)	(K ₁)	(B)	(K ₄)

¹³ Tevahiya çîrokan wek pêvekê di dawiyê teze de hene, em ê li vir ji bo ku mijar baştir were fahmkirin kurteya çîrokan bidin.

¹⁴ Çîrok, çawa ku hatine gotin bi vî awayî hatine berhevkirin û ti sererastkirinên zimanî li ser wan nehatiye zêdekirin an jî rastkirin.

(Zemmê)

(Alpiz)

(Zêr û wd.)

(Dizî)

K_3 (Zemmê) ji bo pêkanîna Diziyê (zêr û wd.) K_1 (Alpiz) erkdar dike û K_1 ji mecbûrî vî karî qebûl dike.

K_1 di destpêka çîrokê de di rewşa jêkvebûnê de ye, yanî ji B yê (Bireser) dûr e ku em ê vê wisa nîşan bidin:

$$K_1 \cup B$$

Her wiha K_1 dema ku li malê bû, ango berî ku ji malê were derxistin di rewşa xweşî û aştîyê de bû. Lê belê piştî ku ji mal hat derxistin ev rewş guherî û kete rewşa xetereyê/xemgîniyê.

1.2.Beşa Duyem: Xweveşartina K_1 ê

Beşa duyem bi hevoka “Go Alpiz derkete derve, go newêribû go çû kete koxa mirîşka, nav mirîşka” destpê dike û bi hevoka “Go hinek arvan jî dayê, xiste tûrikê xwe û çû” diqede. Di vê beşê de K_3 piştî ku li dû K_1 ê derdikeve derve ji kiryara xwe poşman dibe. Lê K_1 xwe ji tirsê re vedişêre û bi awayekî neyekser li hember fermana K_3 yê ango li hember bernameya derbirînê ya K_3 yê serî radike.

Cihê ku K_1 xwe tede veşartîye, yanî “koxa mirîşka” di vê beşê de erka alîkar bi cih tîne. Ji bo K_1 vê kiryarê pêk neyîne wî vedişêre ku ev ji bo K_1 dibe alîkar lê belê ji bo K_3 ya ku dixwaze ev kiryar pêk were di rola astenker de ye. Ev rewş bi lixwemikurhatina K_1 bi dawî dibe. Ev lixwemikurhatin bi awayê hestiyarî dide diyarkirin ku K_1 ji bo vê kiryarê pêk bîne êdî amade ye. Guherîna cih yanî derketina K_1 ji malê û ketina wî ya “koxa mirîşka” vî ji bo kirina vî karî amade kir. Yanî serboriya ku hêza pêkanînê¹⁵ bi K_1 ê re çêkir. Ji bo vê kiryarê pêk bîne “kox” ev tecrûbe pê re çêkir. “...go hinek hêk mêk xiste tûrikê xwe go ka hinek arvan jî bide min”.

1.3.Beşa Sêyem: Beşdarbûna Kirdeyeke Nû

Ev beş bi hevoka “Go bişev e, wê rebeno ça bike” destpê dike û bi hevoka “Go vana rebena kir nekirin hût bûn, go jixwe jê navqetandî bûn” diqede. Ev beş bi beşdarbûna Hûtan (em ê wisa nîşan bidin: K_2) destpê dike. Em ê Hûtan bi tevahî wek K_2 nîşan bidin lewra di derbirînê de taybetiya wan a komî dixuyê. Di çîrokê de her çî qas heft kes jî bin, heman erkê bi cih tînin. K_1 ji bo ku kiryara xwe pêk bîne, armanca xwe bibe serî dest bi fêlebaziyan dike.

¹⁵ Ev serborî ji bo pêkanînan kiryarekê bi kirdeyê qabiliyetan dide çêkirin.

Ya ku van fêlebaziyan pê dide kirin tirs a ji K_2 ne. Ev tirs dibe ku ji ber tiştêkî din jî bûya, lewra K_1 jî “dengê wîrîniya rêvi tê min ez ji tirs a re dimirim” ji ajalên dirinde jî ditirise. Lê belê beriya ku derkeve diziyê amadehiya wî “hinek hêk mêk xiste tûrikê xwe go ka hinek arvan jî bide min” dide nîşan ku ew ê li mirovan an jî candarên ku bi taybetiyê mirovan hatine xemilandin rast were. Jixwe ew bireserên ku berî ji malê derkeve rahiştibû wan, dide nîşandan ku ew hê di koxa mirîşka de ev plan saz kiriye. Her wiha K_2 piştî van kiryanan jê jî ditirisin.

Armanca K_1 ê dizî ye û ji bo ku vê kiryarê pêk bîne jî hewcehî bi wêrekiyê heye lewma jî bernameya xwe ya derbirînê saz dike. Hêk û arvanê ku ji malê anîbû jî ji bo pêkanîna vê fêlbaziyê wek amûrekê bi kar tîne. Ev rewş hêk û arvan ji bo pêkanîna kiryara diziyê dike alîkar. Hûtên ku li hember kirina vê kiryarê sekinîne jî dike astengê.

K_1 jî bo kiryara xwe pêk bîne di serî de hêkên ku ji “koxa mirîşka” derxistibû wek “kevir” bi K_2 (Hût) dide zanîn “Go hêkek di destê wî de bû, go ev ne kevir e?” û di destê xwe de dipirçiqîne “go di nav destê xwe de wiha kir û kir av” û dike av. Dû re ji bo gumana K_2 jî ser xwe rake arvanê ku ji mal anîbû jî wek kevir “go ez karim kevira bi arvan jî kim” nîşan dide û wî jî dike arvan. Bi van fêlebaziyan hem dixwaze K_2 bitirsinê hem jî dixwaze zora tirs a xwe bibe û xwe wekî yekî hêzdar bide nasîn. Ev beş ji hêla K_1 ê ve ji bo ku bernameya derbirînê ya xwe saz bike, beşa plan û fêlbaziyê ye. Her wiha K_2 (Hût) ku wek karakterên xirab tî zanîn ji ber fêlbaziyên K_1 ê tî tirsandin.

Ev kiryarên K_1 ê (hêk=kevir=av, arvan=kevir=arvan) ku K_2 pê tî xapandin bi ‘Hûtbûna’ wan ve tî girêdan. Hût ku her çî qas di çîrokan de wek karakterên xetere werin sêwirandin jî di vê vegotinê de “rebena kir nekirin hût bûn” ehmeqîya wan jî tî destnîşankirin. Naxwe hêk li her derê hêk e û li her derê jî hene. Bi vî awayî K_1 karaktera xwe ya rastî vedîşêre. Li hember tirsonekiya xwe, xwe wek yekî hêzdar û mîstîk dide nîşan. Ev hemû bûyer, yanî xwe hêzdar nîşandana K_1 dide nîşan ku hê jî ew di pêvajoya destbikariyê de ye. Ev ast ji bo ku ew kiryarê (dizî) bi cih bîne hewce ye.

1.4.Beşa Çaran:

Ev beş bi hevoka “Go wele serê sibê, go birê min tî taştêya me û şîva me çêkî em ê herine seyde.” dest pê dike û bi hevoka “Go çû av kirin anîn.” diqede. Ev beş beşa berdewamiya fêlebaziyên K_1 (Alpiz) e da ku kiryara xwe ya eslî (dizî) pêk bîne. Di heman demê de em di vê beşê de dibînin ku K_2 (Hût) ew (K_1 ‘Alpiz’) wek birayê xwe qebûl kiriye/ne. Di vê beşê de bûyerên ku dê rûyê rastîn yê K_1 derxin maydanê (vala hiştina kûnê avê) bi zîrekiya xwe K_1 jî heqê wan derdikeve û bi fêlbaziyêke piçûk ve wan berevajî dike û

nasmayeya xwe vedişêre ku ev fêlbazî bi kêrî wî jî tên. Kûnê avê bi pifa (hilm) xwe dadigire qaşo tije av kiriye û devê xwe dixwe davê kûn û wî vala dike qaşo ew av wî hemû vexwariye. K₁ dizane ku “zanibû vana li diyar li qarşiya wî ne” K₂ wî dibînin. Gava ku K₁ (Hût) li avê dipirisin jî wan sûcdar dike “go mala we xera nebe bi ser we de”. Hût, ji ber ku “hût bûn”¹⁶ ango ehmeq bûn rastiya bûyeran fahm nekirin.

1.5.Beşa Pêncan:

Ev beş bi hevoka “Go bû sibê” dest pê dike û bi hevoka “Yawo qey ev çawa çêbû wele ez im me bi vir de rast kirin” diqede. Di vê beşê de em li rastî detayan tên ku dem û mekan “sibe, newal” diyar dikin.

Di beşa çaran de erka “xwarinçêkirinê” spartibûne K₁ lê di vê beşê de ev erk ji aliyê Hûtên piçûk ve tê pêk anîn û K₁ê bi xwe re dibin seydê. Lewra K₂ (Hût) di vê beşê de bi temamî bawerî bi K₁ê anîn. Bi gotineke din bawerî bi kesayeta wî ya derasayî anîn. Lê belê di eslê xwe de K₁ karakterekî “tirsonek” e û ji tirsê re gava ku heywanên ku dê seyda wan bihata kirin dibîne “hilkişiya ser serê dera go ji tirsê re Alpiz bi xwe de derrî”. Lê li ser darê qijakeke ku xwe li “guyê” wî dîtine digire. Ev dike ku K₂ (Hût) bêtir jê bitirisin, lewra “ma kes kare qijakê bigire wî çûye qijak girtiye”. Ev kiryar ji bo K₂ asta dawî ya tirsê ye.

1.6.Beşa Şeşan:

Ev beş bi hevoka “go hatin malê wî anîn” destpê dike û bi hevoka “got beraqetê bavo go va em ji xwer jê xelas bûn wele wê me tev bikûşt.” diqede.

Di vê beşê de êdî K₂ dixwazin ji K₁ê xelas bibin “ti naçî malê, ti adiz nebûyî?” lewra tevgerên wî (K₁) yê derasayî yan jî rûyê wî yê sexte ev bawerî bi wan re çêkir ku bi van pirsan xwesteka xelasiya jê digihêje lûtkeyê. Wek encama vê tirsê jî ji bo wî bişînin malê zêrê xwe pê re parve dikin. Ev kiryar bi daxwaza K₂ pêk tê û hewcehî bi diziyê namîne.

Ji bo zûzûka ji K₁ xelas bibin wî tevlî elba zêran li ser piştê birayê piçûk dikin ku ji bo karên bi vî rengê di malê de her tim “birayên piçûk” tên şixulandin. Gava digihêne malê K₁ (Alpiz) ku ji ber hilma K₄ (birayê piçûk yê Hût) li ber qaça dikeve. K₄ ku ji ber vê kiryara wî ecêbmayî dimîne bi bersiva ku distine êdî dest bi revê dike.

¹⁶ Di beşa duyem ya çîrokê de ev îfade heye.

2. Bergeha Karakterên Çîrokê

Gava ku em beş bi beş li çîrokên hûr bûn me têkiliya di navbera kirdeyan de û sererasrkirina bernameya derbirînê nirxand. Di bin vî sernavî de jî em ê cih bidin bergeha karakterên çîrokê û di vê çarçoveyê de em ê pêkanîna karakteran ji aliyê dem û mekan ve binirxînin.

Di bernameya derbirînê de çar cûre bergeh xuya dikin:

1. Bergeha Zemmê: Zemmê kesayeteke xwînsivik û serdest e. Ev taybetiyên wê di tevgerên wê de nakokiyan derdixin holê. Xwesteka şandina Alpiz ya diziyê ya ji nişka ve û poşmanbûna li vê biryarê xwînsivikbûna wê, guhnedana îtirazên Alpiz jî serdestbûna wê nîşan dide.
2. Bergeha Alpiz: Alpiz di tevahiya çîrokê de armanca xwe vedişêre. Her çi qas kesayetekî tirsonek jî be ew bi îlîzyonên ku pêk tîne xwe wek kesayetekî mîstik nîşan dide ku ev jî keysa pêkanîna armancê dide wî. Di vê wateyê de ew kesayeta xwe ya tirsonek vedişêre ku ev ji bo pêkanîna plana wî dibe bingeh.
3. Bergeha Hûtan: Beravajî fikra gelemperî ya di derbarê Hûtan de, Hût di vê çîrokê de wek kesayetên tirsonek û “bêaqil” hatine sêwirandin. Ji aliyê Alpiz ve zû tîn xapandin û ji tirsana ku dê bîn kuştin ew bi xwe parvekirina zêran dikin.
4. Bergeha Vegêr: Di derbarê kesayeta Alpiz û Hûtan de agahdar e (dizane ku Alpiz yekî tirsonek e) û di navbera herîkîna bûyeran de bi nîşeyên kurt guhdervan bi van rastiyan dihisîne.

3. Pêkhatina Mekan di Çîrokê de

Di vê çîrokê de heft mekanên fonksiyonel hene.

Mekanê Yekem: Mal. Di beşa yekem de raste rast neyê binavkirin jî em têdigihên ku Alpiz û Zemmê xwedî malekê ne (di beşa şeşan de, yanî di dawîya çîrokê de tê bilêvkirin) ku ev mal ji bo Alpiz erka ewlehiyê bi cih tîne. Mal ji bo Alpiz nîşaneyê bextewariyê ye.

Mekanê Duyem: Derve. “Derve” ku der-mal, derveyî-mal tê qestkirin, cihê ku tirsên Alpiz derdikevin maydenê ye. Ev der ji bo Alpiz cihê tirsê ye ku li derve ew ne dilşad e.

Mekanê Sêyem: Koxa Mirîşka. Ev cih rola stargehekê dibîne ku Alpiz li vir ji derve û xetereyên li derve tê parastin. Alpiz di “koxa mirîşka” de jî bextewar e. Her wiha “koxa mirîşka” ji bo alpiz dibe destpêka plan û fêlebaziyan.

Mekanê Çarem: Riya Hola.¹⁷ Ev rê destpêka tirsên Alpiz e ku ji ber vê sedemê dibe destpêka xemginiya Alpiz jî. Her wiha çîrok bi çûna vê rêyê re ji hêla vegetinê ve dikeve qonaxeke din.

Mekanê Pêncem: Şikevt. Şikevt ji bo Alpiz rûbirûmayîna tirsan e, tirs li vir dibe xwedî şikil ku ev şikil jî Hût in. Her wiha şikevt ji bo pêkanîna planên Alpiz û pêkanîna bernameya derbirînê ya Alpiz dibe mekanê ewil. Lê belê, piştî ku zora tirsên xwe dibe şikevt jî ji bo wî ji rewşa xemgîniyê derdikeve û dibe cihê bextewariyê.

Mekanê Şeşem: Ber Çem. Ev mekan cihê berdeamiya qurnaziya Alpiz e.

Mekanê Heftem: Newal. Ev mekan ji bo Alpiz piştî xemginiyeke kurt dibe cihê bextewariyê. Bi dîtina ajalên dirinde re tirs/xermgînî û bi hilkişîna serê darê re jî bextewarî lê payda dibe. Alpiz ji bo ku kiryara xwe pêk bîne gava dawî di vî mekanî de davêje. Vê jî bi xêra qijakeke dike ku li ser darê digire. Di heman demê de ji bo vê kiryarê bike careke din rûyê xwe yî rast vedişêre.

4.Sererastkirina Demê di Çîrokê de

Bûyerên di çîrokê de diqewimin di navbera 2 şev û 2 rojan de pêk tên. Di beşa şeşan de vegêr jî vê “go sê çar rojan li wir mabû” êşkere dike. Dema ku Alpiz ji bo diziyê ji mal derket dem şev e (di heman demê ev diyar dike ku dizî bişevê tên kirin). Her wiha di heman şevê de li Hûtan rast tê. Roja din, sibê Hût diçin seydê û wî ji bo çêkirina xwarinê li mal dihêlin û bûyerên ku ji sibê dest pê dikin heta wê şevê didomin. Siba din Alpiz jî bi xwe re dibin seydê û piştî ku ji seydê vedigerin ji bo ku jê xelas bibin wî dişînin mal.

Di vê çîrokê de ji hêla demê ve tiştê ku herî balê dikişîne sererastkirina wê ye. Bi gotineke din kronolojiya wê ye. Bûyerên ku hev dişopînin bi awayekî zelal di 2 şev û 2 rojan de pêk tên. Bi gelemperî bûyerên ku di çîrokan de diqewimin bi awayekî rojekê yan jî şevêkê tên şixulandin, lê belê di vê çîrokê de dem bi awayekî kronolojîk didome. Xwîner/guhdarvan fahm dike ku kîjan sibe, piştî kîjan şevê hatiye. Bûyerên ku di çîrokê de derbas dibin ne di

¹⁷ Hola gundekî girêdayî Bismila Diyarbekirê ye ku cîranê gundê Xanoserê ye, ku ev çîrok li Xanoserê hatine berhevkirin. Bi gotineke din ev rê (rêya Hola) rêyeke rasteqîn e.

demeke tevlihev de lê di demekê de diqewimin ku ji bo van bûyeran bi taybetî di çîrokê de hatiye diyarkirin. Bi gotineke din dem di vê çîrokê de ne wek xemlekê lê xwedî roleke xwe ya taybet e.

2.Çîroka Duyem: Kurê Pîra Cina

Di vê çîrokê de kal û pîrek hene rojekê yek tê û sêvekê dide kalo. Kalo nivê sêvê dixwe û yê din jî dide jina xwe û bi vî awayî kurek ji wan re çêdibe. Kurik çawa ku çêdibe diaxive û dixwe ku qîza Nûriyê Arif ku axayê gund e jê re bixwazin. Kalo bi qebûlkirina qelenekî giran qîzê jê re dixweze û tîne. Şeva yekem zave peymanê bi bûkê re dêtîne. Li gorî vê peymanê heke bûk qahwa xwe bifûrîne dê zava wê biterkîne. Piştî demekê bûk qahwê difûrîne û zava wê terk dike. Qîz bi salan li mêrê xwe digere û talî wî dibîne, lê di navbera wan de diya kurik heye. Kurik jina xwe direvîne û diya wî jî bi pey wan dikeve û talî mecbûr dimîne û devj ji wan berdide.

2.1.Beşa Yekem: Rewşa Destpêkê

Beşa yekem bi hevoka “Go kal û pîrek hebû” dest pê dike û bi hevoka “go yanî henekê xwe pê kir” diqede. Ev beş di derbarên rewşa karakteran de agahiyên dide û her wiha wan bi me dide naskirin. Di heman demê de dibe destpêkeke piçûk ji bo bûyerên derasayî yên ku dê di çîrokê de biqewimin û xwîner/guhdervan ji bo van bûyeran dide amadekirin.

Di rewşa destpêkê ya çîrokê de bernameya derbirînê derdikeve meydanê: “here qîza mala Nûriyê Arif ji mir bixwaze”. Di vir de yê ku erka şandiyar pêk tîne ku di çîrokê de navê wî nayê gotin û wek Kurik (em ê wek: Kirde₂=K₂ nîşan bidin) tê pênaskirin. Kirdeya me ya din jî Kalo ye (em ê wek Kirde₃=K₃ nîşan bidin) ji bo xwestinê tê erkdarkirin. Bi gotineke din ji bo pêkanîna bernameya derbirînê ji aliyê K₂ (Kurik) ve tê erkdarkirin.

Têkiliya sentaksî û mantiqî ya di navbera kirdeyan de wisa pêk tê: Yê ku bandordar e K₂ û K₃ jî bandorgir e. Lê ji bo pêkhatina vê têkiliyê di çîrokê de ti agahî tune ne. Yanî em fahm nakin ka ji bo çi K₃ (Kalo) daxwaza K₂ (Kurik) qebûl dike. Lê dîsa jî K₃ wek ku jê hatiye xwestin diçe mala Nûriyê Arif (em wek: Kirde₅=K₅ nîşan bidin) da ku qîza wî bixwaze, lê cesaret nake lewra “reben e”, “gavan e”, “eyb dike” û wek encama van taybetiyên xwe jî “li binya şekala rûnişt”. Piştî du sê teşebûsan talî Qizê (em ê wek Qiz₁=K₁ nîşan bidin) dixwaze her wiha K₁ ji bo K₂ bireser e ku dixwaze wê bi dest bixe. Lê K₅ (Nûriyê Arif) wek astengêrekî derdike pêşiya me û şertên dijwar li K₃ dike giran: “tê çil qamtirî tevli barê wan û

dîkekî zêrînî li ser pişta heywanê, tê serê sibê bi nimêja sibê re li devê deriyê me hazir bin, gereke dîk azan bide” dike. Bi gotineke din K_5 wek dij-kirdeyekê li pêşiya K_3 û bi awayekî ne yekser ev dij-kirde ji bo pêkanîna kiriyara K_2 yê jî di heman rolê de ye.

Di beşa yekem de tşkiliya ku di navbera yekeyên vegotinê de pêk tèn em dikarin bi vî awayî nîşan bidin:

<u>Şandyar</u>	<u>Kirde</u>	<u>Bireser</u>	<u>Hilgir</u>
(K_2)	(K_3)	(B)	(K_5)
(Kurik)	(Kalo)	(Qîz)	(Nûriyê Arif)

Kiriyara ku Şandyar (Kurik) dixwaze pêk were (xwestina Qîzê) bi erkdarkirina Kirdeyê (Kalo) tê destpêkirin.

Rewşa destpêkê ya kirde û bireserê em dikarin bi vî awayî nîşan bidin:

$$K_2 \cup B$$

2.2. Beşa Duyem: Beşdarbûna Alîkarekî

Beşa duyem bi hevoka “go vîya jî hat malê” dest pê dike û bi hevoka “go xelkê jî go heyra me tê kurê pîrê nedîtine ev çawa çêbû” diqede. Di vê beşê de dîsa K_2 ji bo gihastina armanca xwe rola şandyar pêk tîne.

Ji bo bicîhanîna şertên K_5 ji yekî ku navê wî di çîrokê de nayê vegotin û wek “nizam çîko” derbas dibe alîkarî tê xwestin. Û dîsa yê ku vê erkê pêk tîne K_3 ye. Tam jî lo gorî şertê ku K_5 li pêşiya wan danîbûn, “çil qamtirî tevlî barê wan dîkekî zêrînî jî li serê” li ber deriyê wî tèn amadekirin. Di serî de K_5 ku bawerî bi K_3 yê neanîbû heta henekê xwe pê kiribû “go yanî henekê xwe pê kir”, her wiha giranbûna şertan jî vê derdixe meydanê, mecbûr dimîne ku Qîzê (K_1) bide.

Di dawiya vê beşê de K_1 (Qîz, Bûk) tê amadekirin û ber bi mala K_2 (Kurik, Zava) ve tê şandin. Rewşa K_2 di destpêkê de, ji ber ku ji bireserê jêkvebûyî bû em ê wisa nîşan bidin:

$$K_2 \cup B$$

Lê em di dawiya vê beşê de dibînin ku ev rewş guherî: “go vana jî rabûn bûk siwar kirin o cilê bûkê jî tede ne xemla wê lê kirin û bûk siwar kirin ji kurê pîrê re anîn”. Em ê vê rewşa nû ya pêkvebûnê wisa nîşan bidin:

$K_2 \cap B$.

2.3. Beşa Sêyem: Şertê K_1 ê yê bi hev re mayînê.

Beşa sêyem bi hevoka “go anî go nert wa qumatkek li wir e” dest pê dike û bi hevoka “go wele ez nahêlim qehwa min bifûre” diqede. K_2 ku heta niha zarokekê di qumatkê de bû bi hatina Bûkê (K_1) re guherî bû “xortekî ku ti newêrî lê binêrî” ku “dilê jinikê bi heft dila ketiyê”. Bi vê guherînê re û bi şertê ku divê tu car “gereke qehwa te nefûre” re K_2 (Kurik, Zave) bernameya derbirînê ya xwe pêşkêş dike. Divê ji niha û pê ve tu carî “qehwe nefûre” lewra dilê Jinikê¹⁸ (K_1) “bi heft dilan ketiyê” û lewma jî serî li ber bernameya wî ranake.

2.4. Beşa Çaran:

Beşa çarem bi hevoka “Go rokê didiwa sêya, hat henek bi mêrên xwe kir go qehwê go firrr fûriya” dest pê dike û bi hevoka “Go çû, mêr çû, go ew jî ma ma” diqede. Di vê beşê de soza ku K_1 dabû bi cih nanî, ev jî bû sedema ku K_2 wê biterkîne. Lewra di navbera wan de peymaneke bi vî awayî hebû. Çûna K_2 rewşa K_1 diguherîne, bi gotineke din dilşadiya ku bi K_1 re çêbibû bi çûna K_2 cihê xwe ji xemginiyê re hîşt.

2.5. Beşa Pêncan: Bi destxistina tecrûbeyê ji bo pêkanîna kiryarê.

Ev beş bi hevoka “Go çû xaniyek, wê jinikê ha, li serê cada golê ava kir”¹⁹ dest pê dike û bi hevoka “Ez ê sibê bi te re werim” diqede.

Di vê beşê de em li rastî destkeftina K_1 tên. K_1 (Jinik, Bûk) piştî ku ji aliyê K_2 ve hate terikandin, ji bo lê bigere, yanî kiryara xwe pêk bîne li “cada golê” xaniyekî ava dike. Sedema hilibijartina vî mekanî “go kîja însanê ku di berê çû go heta ku win neyên çirokekê, serpêhatiyekê ji min re nebêjin ez nahêlim win herin” çûnûhatina zêde ye. Ji ber ku “cada golê” wek têteta gund e mala xwe li wir ava dike da ku di derbarê Mêrê (K_2) xwe de agahiyekî bi dest bixe. Ev kiryara K_1 ê wê ji bo lêgerîna mêrê wê dide amadekirin (ev amadehî di çîrok, serpêhatî û wd. de beriya ku kirde kiryara xwe pêk bîne wî/wê dike xwedî

¹⁸ Berî ku bibe xwedî mêr, an jî berî ku bizewice vegêr wê wek “Qizê” pênase dike, lê piştî ku dizewice ev pênase diguhere û têgiha “Jinê” tê bilêvkin. Ji bo ku tevlihevî çênebe di vê nivîsê de em ê jî li gor pênase û binavkirinên vegêran tev bigerin.

¹⁹ Di vê çîrokê de vegêr/çîrokbêj di navbera çend hêmanên çîrokê de û çend hêmanên ku di jiyana wê (çîrokbêj) ya rastin de hene têtikilî ava kiriye. Wek ku me li jor jî destnîşan kiribû, Nûriyê Arif kesekî bi nav û deng e li herama ku ev çîrok lê hatine berhevkin. Her wiha “cada golê” jî mekanekî rasteqîn e. Ev hêmanên rasteqîn ku di çîrokan/berhemên folklorîk de cih digirin me nirxandina wê di beşa yekem de kiribû. Di vê çarçoveyê de ev minakeke serkeftî ye ya ji bo (bê hemdê xwe, ango ji bilî peywenda wê bi mijara çanda devkî hebe me ev çîrok hilibijart) di çanda devkî de hêmanên ku hem jiberê hem jî bîrê bi hêz dikan.

tecrûbe, yanî ji bo pêkanîna kiryarê, hêz, agahî û wd. bi kirdeyê re dide çêkirin) da ku wê pêk bîne.

Piştî demeke “go wele rokê ma, salekê, di sala, bê çi qasî ma” gavanê gund û kurikek dibin mêvanê wê. K_1 bi awayekî neyekser ji gavan dipirise “we ti carî tişteke neditiye? Win li çola digerin, li çepela digerin” ka gelo tişteke dîtine yan na (di çîrokê de nayê diyarkirin bê ka ji bo çi di vir de K_1 bi awayî neyekser ji gavan dipirise, tu dibê qey hewla veşartina vê derasayîbûnê di gotinê wê de heye), sedema hilbijartina gavan jî ev e; gavan li çol û çepelan digerin û îhtîmala ditina rewşeke derasayî ji kesekî din pirtir e. Her wiha K_1 gavan bi navê “xalê sofi” bi nav dike ku di vê binavkirinê de hem zanînekê hem jî cesaretê didi yê hemberî xwe. Di heman demê de “kurik” bi veguhaztina serboriya xwe ya derasayî bi awayekî yekser rola alîkar bi cîh tîne.

Di vê beşê de hin hêmanên çîrokê diguherin, keçika/qîza ku di beşa yekem a çîrokê de fonksiyona bireserê bi cîh tanî di vê beşê de vediguhere kirdeyê û kurikê ku erka şandyar jî bi cîh tanî piştî ku dibe mijara lêgerîna K_1 ê vediguhere û dibe bireser. Vê rewşa kirde û bireserê em ê wisa nîşan bidin:

$$K_1 \cup B$$

2.6. Beşa Şeşan: Tevlîbûna Astengêr

Ev beş bi hevoka “Go wele keçik pê re çû” dest pê dike û bi hevoka “Go wele wer hasilî diya wî û birê wî razan o go ji jinêkê re go heydê em herin, derketin” diqede. Ev beş bi derketina astenkerê dest pê dike ku sedema terikandina K_2 yê (Zava) bi vê astengêrê eşkere dibe. K_1 gava ku K_2 dibîne bernameya xwe ya bingehîn (kêliya gihînê) bi paş dixwe; lewra, di şikeftê de “dê û bavê” K_2 hene ku hê nizana ew ê li hember bernameya wê çi bertekê nîşan bidin. Lê ji bo ku armanca xwe bi cîh bîne qurnaziyêke piçûk dike û xwe dixwe “bin textê mênê xwe”. Hebûna K_1 ya li şikeftê bala astenkerê jî û bala K_2 jî dikişîne. Diya wî diyar dike “Go wele weke hawê pêjina tişteki, bêhna tişteki ji mala me tê” lê ew diya xwe dixapîne û wê dixwe xew. K_2 piştî ku diya wî dikeve xew, radije “saz” û wek aşiqan “lê dixwe” bi vê kiryarê dixwaze gumanên diya xwe bide jibîrkirin. Lêxistina saz hem bo diya wî hem jî ji bo jina wî peyamek e, ku dixwaze bibêje ku wî, ew ji bîr nekiriye. Dê vê peyamê rast dixwîne û diyar dike ku ew “cin in” û keçik jî “ins e” û wek astenkerê bingehîn afrîneriya wan a ji hev cûda dike hincet. Lê belê piştî razana wê, Kurik û Keçik ji wir direvin.

2.7. Beşa Heftan: Rola Astengêr

Ev beş bi hevoka “Go derketin, hatin qistekê birê hatin” dest pê dike û bi hevoka “Çîroka min ji te re xweş” diqede. Ev beş, piştî K_1 ku lêgerîna wê bi dawî bû û gihaşte armanca xwe, beşa serkeftina kiriyara wê ye ku ew jî pêkvebûna wan e.

K_2 ji ber ku dizane diya wî li hember pêkvebûna wan e, radije K_1 û dest bi revê dikin û bi vî awayî di vê beşê de kiriyara xwe ya yekem pêk tîne. Her wiha bi vê kiryarê serî li ber bernemaya derbirînê ya diya xwe radike. Lê belê diya wî dev ji wan bernade û bi pey wan dikeve, ev dibe yekem kiriyara dê (astengêr) û ya bernemeya derbirîna wê. K_2 di vê beşê de çar kiriyaran pêk tîne li hember bernemeya derbirînê ya astengêr. Kiriyara yekem reva ji malê bû. Gava dê (astenker) ku bi pey wan dikeve bi awayê herî bilez tev digere û “sêhrê li xwe dixwîne” û dibe “babîsokek”. K_2 gava ku babîsokê dibîne dizane ku ew diya wî ye û jina xwe (K_1) dike “parêz” û xwe jî dike “nahtorvanî”. Ev kiriyara duyem ya K_2 ye. Kiriyara sêyem jî; gava ku dibîne astenker dîsa bi pey wan ketiye jina xwe (K_1) dike “aş” û xwe jî dike “qiraş”. Lêbelê di berî ku astengêr gelekî ji wan dûr bikeve hay ji planên/kiryarên K_2 çêdibe “go wele xelasiya me ji ber diya min tineye” û bi vî awayî jî kiriyara xwe ya çarem (performans, serkeftin) pêk tîne jina xwe dike “darekê van darên bilind ên hewr” û xwe jî dike mar û “go xwe li darê pêça pêça pêça heya serî, go serê xwe li ser danî” da ku astenker keysa kuştina jina wî nebîne û mecbûr dimîne ku vegere. Her wiha astengêr li hember vê hewla K_2 vê rewşa nû ya kurê xwe (K_2) qebûl dike.

Piştî van çar (kiriyareke destpêkê û sê kiriyarên serkeftinê) kiriyarên K_2 bi awayekî serkeftî çîrok bi dawî dibe. Lê divê neyê ji bîr kirin ku K_2 ji bo astengêr rola bireserê bi cih tîne. Çawa ku K_1 di serê çîrokê de wek biresereke ku bi armanca bi destxistinê dihat xwestin, K_2 ji bo astengêr rola bireserekê bi cih tîne û heke astengêr bi ser biketana dê astengêr-dijkirde raste rast wek kirdeya vê çîrokê bihata pênasekirin.

3. Bergeha Karakterên Çîrokê

Di vê çîrokê de em rastî heft bergehên tên:

1. Bergeha Pîrê: Pîrê di çîrokê de tenê erka veguhaztinê pêk tîne, yanî Kalo (mêrê wê) di derbarê qewimînan de agahdar dike.
2. Bergeha Kalo: Kalo kesayetekî şermokî ye ev, sedema vê şermokî ye “rebenbûn” û feqîrî ye. Bi zora kurê (K_2) xwe diçe xwestina qîzê, lê tu baweriya (wê kî qîza

mala Nûriyê Arif bi te de) wî tuneye ku wê qîzê bidinê. Lewra qîz, “qîza mala Nûriyê Arif e”.

3. Bergeha Kurik: Bi têkiliya di navbera sedem-encamê de dizane, ango bi rûyê bûyera yê veşartî dizane, ji ber vê sedemê jî bi israr ji Kalo dixwaze da ku here qîzê bixwaze. Li hember îtîraza Kalo “ti do çêbûyî” ji bo xwestinê israra xwe didomîne. Her çî qas wek zarokekî di qumatkê de xuya bike jî di eslê xwe de “xortek e”.
4. Bergeha Nûriyê Arif: Bi rûyê bûyeran yê veşartî nizane, ji ber vê sedemê jî ji Kalo qeleneke mezî “here tê çil qamtirî tevî barê wan û dîkekî zêrînî li ser piştê heywanê tê serê sibê bi nimêja sibê re li devê deriyê me hazir bin” dixwaze ku bi vî awayî henekê xwe pê dike.
5. Bergeha Qîzê: Qîz bi têkiliya di navbera sedem-encamê de nizane û fahm nake bê ji bo çî mêrê wê ew terk kiriye (hey wax hey wax..., min çî xwelî li serê xwe kir) û heta dawîya çîrokê jî tu agahî tune bê ka sedema wê hatiye fahmkirin an na. Ji bo dîtina wî dest bi lêgerînê dike û ji kesên ku potansiyela wan a dîtina bûyerên derasayî heye, alîkariyê dixwaze.
6. Bergeha Diya Kurik: Bi têkiliya di navbera sedem-encamê de dizane, her çî qas bixwe ku bernemaya derbirînê ya xwe bi kurê xwe bide qebûlkirin jî ev pêk nayê.
7. Bergeha Vegêr: Vegêr di çîrokê de ji bilî çend agahiyên piçûk “...go yanî henekê xwe pê kir, ...go xelkê jî go heyra me ti kurê pîrê nedîtine ev çawa çêbû”, ... sêhrê li xwe dixwîne” bêtir tu agahiyan nade û xwîner/guhdarvan di derbarê bûyeran de agahdar nake. Tenê bûyeran neqil dike.

4. Pêkhatina Mekan di Çîrokê de

Mekanê Yekem: Mal. Mala Kalo û Pîrê ye, cihê destpêka bûyeran e, li vî mekanî ji bo pêkhatina kiryarên Kurik bernameya derbirînê tê amadekirin. Her wiha ev mal ji bo Kalo cihê bextewariyê ye. Di heman demê piştî hatina Bûkê ev mal dibe cihê bextewariya Kurik û Qîzê jî. Lê piştî ku Kurik bû kebokekê û ew terikand ji bo Qîzê ev der dibe cihê xemgîniyê.

Mekanê Duyem: Dîwana Mala Nûriyê Arif. Ew mekanê ku şandiyar, Kalo ji bo xwestina qîzê erkdar kiriye û şandiyê, ev mekan e. Di vî mekanî de şert û merc ji bo dana Qîzê tê dayin. Ev mal bi awayekî xwezayî ji bo Nûriyê Arif cihê bextewariyê ye, lê ji bo Kalo cihê xemgîniyê ye (ayb kir rebeno, go çû Diwana Mala Nûriyê Arif, li binya şekala rûnişt).

Mekanê Sêyem: Neqeba Berehê.²⁰ Ev mekan cihê pêkanîna şertan e ku wek “qelen” li hember dana Qîzê hatine danîn. Li vî mekanî şert bi cîh tîn û tiştên ku tîn xwestin li vî mekanî bi cîh tîn. Her wiha di vî mekanî de Kalo tiştên ku ji bo xwestina Qîzê hewce ne bi dest dixê, bi gotineke din ev mekan Kalo ji bo pêkanîna vê kiryarê amade dike.

Mekanê Çarem: Xaniyê li Ser Cada Golê. Ev mekan ji bo Qîzê dibe cihê amadehiyê. Ji bo pêkanîna kiryara xwe, yanî bi lêgerîna mêrê xwe di vê malê de dikemile û ku ev wek pêvajoya bi destxistina agahiyên/qabiliyetan ji bo pêkanîna van kiryanan.

Mekanê Pêncem: Newal. Ev mekan ancama lêgerîna Qîzê (K₁) ya bi salan e (salekê, di sala), li vî mekanî rastî bûyereke derasayî tê ku “demekê” lê geriyabû û li vî mekanî kiryara wê nêzî serkeftinê dibe. Bi vê taybetiya xwe Kalo li vî mekanî di rewşa bextewariyê de ye.

Mekanê Şeşem: Şikevt. Di çîrokê de sedemên ku ji aliyê vegêran ve hatine veşartin di vî mekanî de bi axaftinên astengêr (Diya K₂) tîn eşkerekirin. Her wiha di vî mekanî de Qîz kiryara xwe ya dawî (kiryara performansê, ya serkeftinê) ‘bi çûna mekan re’ pêk tîne, bi terikandina Kurik re Qîza ku bi awayekî aktîf rola xwe berdewam kiribû, di vî mekanî de bi dawî dibe û pasîfîze dibe. Beravajî Qîzê, Kurikê ku rola wî di mala Kalo de bi dawî bibû, di vî mekanî de dîsa dest pê dike û bi awayekî aktîf heta dawiya çîrokê didome. Di vî mekanî de astengêr peyda dibe ku di serê çîrokê de (ji aliyê vegêran ve hatibû veşartin) naxuye. Bi van hemû taybetiyên xwe ev mekan di çîrokê de mekanê herî girîng e. Di vî mekanî de veguherîna rewşan jî bi carekê re diguhere; berî ku Qîz were mekan Kurê ku di rewşa xemginiyê de bû, bextewar dibe ku heman rewş ji bo Qîzê jî “min hewqa bêriya wî kiriyê” derbasdar e. Lê astengêr-dijkirdeya di vî vir de ji ber ku haya wê ji Qîzê tune, bextewar e. Ev bextewariyeke dem kurt e û xapandinê e, astengêr li vir tê xapandinê.

Mekanê Heftem: Derve. Ev mekan ne bi awayekî taybet di çîrok de hatiye destnîşan kirin, tenê em dizanin ku derveyî şikeftê ye. Armanc û sê kiryarên Kurik di vî mekanî de bi ser dikevin. Ev mekan ji bo Kurik û Qîzê rêya revê ye ji astengêr. Di heman demê de ji bo Kurik (kiryara performansê) di vî mekanî de pêk tê û bi encam dibe. Ev mekan bi têkçûna astengêr-dijkirdeya jî girîng e, beriya vê derê astengêr-dijkirdeya ku di rewşa bextewariyê de bû êdî di rewşa xemginiyê de ye.

²⁰ Ev mekan jî bingeha xwe ji rastiya heremê digire ku me ev çîrok lê berhev kiribû. Li jêrenota beriya vê bnr.

5.Sererastkirina Demê di Çîrokê de

Di pêvxistinekê de heke em qala mekan bikin bi awayekî mecbûrî divê em qala demê jî bikin, lewra bêyî demê tu mekan nikare were avakirin. Di vê çîrokê de pêvxistana demê wek mînakên din yên çîrokan e, bi gelemperî qalibên wek “rojekê, serê sibê, sibê û wd.” tên bikaranîn.

Heta ku Kurik, Qîz terikand em dibînin ku qalibên demê wek “rojekê, di rojan, sê rojan û wd.” tên bikaranîn. Lê piştî terikandinê em dizanin ka Qizê çi kiriyê lê di vê pêvajoyê de, em nizanin Kurik çi kiriyê, ji aliyê vegêran ve nehatiye gotin.

3.Çîroka Sêyem: Teyrê Sîbeg / Çîroka Çil Bira²¹

Çil kurê padîshahekî hene, rojekê difikirin ku temenê wan gihaştîye zewacê û ji bavê xwe destûra zewacê dixwazin. Bav, pişrî du sê şîretan destûrê dide wan.

Ev çil bira ji bo dîtina çil qîzê ji bavekî dikevin rê û şevê li mêrgeke ku şop pêneketîye ligel îtirazên birayê piçûk (Mîrze Miheme) konê xwe dîtînin. Mîrze Miheme ji wan dûr dibe, nîvê şevê ji aliyê pîrekê ve ji bilî Mîrze Miheme hemû bira tevî kon û hespên xwe dibin kevir. Mîrze Miheme vepîrê dişopîne û xwe wek zarokê piçûk pê dide naskirin. Pîrê jê bawer dibe. Talî Mîrze Miheme ji pîrê hîn dibe ku çareya başkirina birayên wî ancax şewitandina pîrê ye û wê dişewitîne û bi vî awayî birayên xwe baş dike.

Mîrze Miheme û birayên xwe tene bajarekî û li gor dilê xwe bi çil qîzên ji bavekî re dizewicin. Lê dema ku Mîrze Miheme dike here ba jina xwe jina wî şertekî dêtîne pêşîya wî: li gor vî şertî divê Mîrze Miheme meseleya Mihemedê bajarê Kengê hîn bibe naxwe dê jina wî tiştêkî giran bîne serê wî. Mîrze Miheme bi pey vî bajarê ku nas nake dikeve. Talî li Teyrê Sînbeg rast tê û Teyr wî digihijîne bajarê Kengê. Li bajarê Mihemedê Bajarê Kengê jî nas dike û meseleya wî ya ku têkildarî jina wî ye jî jê hîn dibe.

3.1.BeşaYekem: Rewşa Destpêkê

Beşa yekem bi bi hevoka “Go padîşak hebû, çil kurê wî hebû” dest pê dike û bi hevoka “go binêre lawo, mêrgê ku şop lê neketibin win li wan mêrgan nesekinin, herin” diqede. Ev

²¹ Ev çîrok li gor çîrokên din gelekî dirêj e; hem tede zêde karakter derbas dibin hem jî hin ji van karakteran xwediyê çîrokê xwe ne ku ev çîrok, çîroka van karakteran jî dorpêç dike. Lewma jî her çiqas me ew beş bi beş ji hev veqetandibe jî aliyê wê yê komplike di navbera beşên ewil de girêdaneke kûr pêk aniye. Lê ev nayê wê wateyê ku ev çîrok ne li gor rêbaza semiyotîkê hatiye beşkirin, lê ev beşkirin heke bi çîrokên din re werin berawirdkirin dê bê dîtîna ku komplikebûna bûyeran di beşên dawî de bi karakter, mekan û cih tevlihevîyek kûrtir pêk aniye.

beş bi agahiyên piçûk dest pê dike yê ku xwîner/guhdervan di derbarê rewşa karakteran de û di derbarê dem û cih de agahdar dike.

Bav û kur ku di rewşa vegêranî de bi têngîna kiryarvan (eyleyen) tên diyar kirin. Di vir de du kirde diyar in:

Lêlata vegotinê	Lêlata Vegêran
“Padîşe/Bav”	K ₅
“Çil Bira”	K ₄

Di navbera van kirdeyan de têkliyêke pêkvebûyî ya xwezayî heye ku ji bav û kurbûnê tê, em dikarin vê têkiliya pêkvebûnê wisa nîşan bidin:

$$K_4 \cap K_5$$

Ev têkiliya wan a xwezayî nahêle ku K₄ bi tena serê xwe biryara xwe bide ku ev di çîrokê de bi vê hevokê tê diyarkirin; “destê we ji we re, herin” ku raste rast wateya destûrekê ji vê hevokê tê derxistin.

Di destpêkê de bernameya derbirînê ya çîrokê tê pêşkêşkirin; “heydê mê herne malê. mê dawa jinê ji bavê xwe bikin”. Di vir de ya/ê ku fonsksiyona şandyar bi cîh tîne “Çil Bira” (em ê wisa nîşan bidin; K₄ lewra navê komekê ne û bernameyeke hevpar a derbirînê dimeşînin) bi xwe ne. Bi gotineke din yê ku xwe motîve dikin ew in û di pêkanîna bernemaya derbirînê de ew xwedî gotin û biryarê ne. Bavê wan (K₅) jixwe li hember vê xwesteka wan dernavekeve “jî çavê xwe digerinim nagerînim, çil qîzê ji dê û bavkî ez ê dibêim belkî ez bibînim ji we re bînim, hê min nedîtiye”. Bavê wan her çiqas raste rast erka şandyar bi cîh neyine jî bi awayekî neyekser bernameya derbirînê ya xwe bi ‘hêviya’ xwe (çilqîza ji dê û bavkî) û şîreta (mêrgê ku şop lê neketibin win li wan mêrgan nesekin) xwe dixwe pêşiya wan. Lê belê wek ku em ê di beşên din de jî bibînin bernameya derbirînê ya K₅ (Bav/Padîşe) sedî sed pêk nayê.

3.2. Beşa Duyem; Pêkbûyîna Kirdeya Sereke

Beşa duyem bi hevoka “go wele çûn qonaxek hılanîn yek danîn” dest pê dike û bi hevoka “wax wax bi ser wan de giriya heya bû sibe” diqede. Ev beş bi derketina astengkarekî dest pê dike ku bernameya derbirînê ya K₄ (Çil Bira) dikeve xetereyekê. Sedema vê xetereyê jî ew e ku K₄ guh nedane şîreta bavê xwe (K₅) û serî li ber bernameya derbirînê ya bavê xwe

rakirine. Lê belê ji “Çil Bira”yî, “birayê piçûk” ango Mîrze Miheme (em ê wisa nîşan bidin K_1) şîreta bavê (K_5) bi cîh tîne; “helbet talokak tê hebû loma bavê me ji mer go” û dûrî wan dibe. Di çîrokê de tu agahî tune ne bê ka ji bo çî K_1 (Mîrze Miheme) beravajî birayê xwe tev digere. Lê bi vê tevgerînê wek kirdeyê serbixwe ji yên din tevlî bernameya derbirînê dibe û bi vî awayî em dibînin ku bernameya derbirînê ya wî di çîrokê de serdest dibe. Di vê peywendê de birayên ku bi hev re wek kirdeyê dixuyan û têkiliya wan a pêkvebûyî xera dibe. Em dikarin vê jêkvebûyînê wisa nîşan bidin:


Mîrze Miheme

Çil Bira/Birayên din

$$K_1 \cup K_4$$

Her çiqas di çîrokê de ev neyê diyarkirin jî ji aliyê mantiqî ve bi jêkvebûna Mîrze Miheme (K_1) ya ji birayên xwe êdî fonksiyoneke wan a pêkvebûnê naxuyê. Bi gotineke din “Çil Bira” dibin “Sî û Neh Bira”. Ev jêkvebûna ramanî di beşên din yên çîrokê de bi awayekî yekser derdikeve holê û tu bandora birayên din namîne û bi tevahî derdikevin derveyî bernameya derbirînê.

Beravajbûna Mîrze Miheme û Birayên wî em dikarin di çarçoveya eksena berevajbûnê de wisa nîşan bidin:



Di rewşeke normal de divê bandora “mezin” li “piçûk” bibûna, lê Mîrze Miheme di vê peywendê de vedigere çavkaniyê û şîreta bavê xwe bi bîra xwe dixê. Têkiliya di navbera Mîrze Miheme (K_1) û Bav (K_5) de jî bi vê tevgera Mîrze Miheme wek berê dimîne:

$$K_1 \cap K_5$$

Astengê ku bi pênaseya “tiştêkî çavê wî weke alatrîka” bû di çîrokê de derdikeve pêşiya me û temamê candar û bêcanên “temamê birê wî kevir in di bin çadiran de û çadir kevir û hespên wan tev kirine kevir” dike kevir. Bi vî awayî jî bernameya derbirînê ya K_4 (Çil Bira) bi awayekî neyekser tê bi dawîkirin.

Piştî ku birayê wî dibin kevir berteka K_1 (Mîrze Miheme) “wax wax bi ser wan de giriya heya bû sibe” ya li hember vê rewşê wî ber bi lêgerînekê ve dibe ku ev nîşaneka veguherînekê ye. Di heman demê de piştî vê bûyerê Mîrze Miheme jî bernamêyeke din a derbirînê ava dike û dev ji (ji bo demekê) armanca xwe ya sereke berdide. Ev veguherîn ji xwedîbûnê (ya tiştêkî) derbasî rewşa nexwedîbûnê dibe ku di vir de “sî û neh” birayên mayî fonksiyona bireserê bi cîh tînin:

$$(K_1 \cap B) \rightarrow (K_1 \cup B)$$

3.3. Beşa Sêyem: Xapandina Astengêr û Temamkirina Kêmasiyê

Ev beş bi hevokerê ku demê nîşan dide “serê sibê go hema berê xwe da wê newala ku çû” dest pê dike û bi hevoka “ti vêya nedî, wê te bikujin” diqede.

Di vê beşê de K_1 (Mîrze Miheme/d) ji bo ku bernamêya derbirînê ya sereke bi cîh bîne divê kêmasiya temam bike. Ew kêmasî jî birayê wî ne ku bi hev re ji bo heman bernamêyê derketibûn rê. Divê ew vê kêmasiyê temam bike lewra bi hev re derketibûn rê û xwedî heman bernamêyê bûn. Di vê peywendê de dest bi lêgerîna wî “tiştî” dike ku birayê wî kiribû kevir. Di vê beşê de Mîrze Miheme rastî astengêr tê “pîreke aha çîçikeke xwe avêtiye vi alî milê xwe yek avitiye ser vî milê xwe”. Rewşa astenker ya acêb wî ditirîsîne “welehî wê vêya min bikûje” ku ji ber vê sedemê li hember vê hêzê dest bi fêlebaziyan dike. Ev rewşa ku dide diyarkirin ku hesta dêbûnê bi vê “pîrê” re heye aliyê wê yê qels jî nîşan dide ku Mîrze Miheme bi xêra vê wê dixapîne “devê xwe xiste çîçika wê” û xwe piçûk (bê hêz) nîşan dide, lewra yekî ku hê hewcehiya wî bi mijandina şîrê dê hebe dê nikaribe tiştêkî ji vê mezintir pêk bîne. Lewra ew piçûk e, kurekî piçûk dê bikaribe çi bike?

K_1 (Mîrze Miheme) piştî ku ji birayên xwe jêkvebû wek ku me li jor jî diyar kir “sî û neh” birayê wî mabûn. Wek ku di vê beşê de ji aliyê astenker (pîrê) ve tê diyarkirin (wer çil kêma kurekî min ti li ser çilê temam) bi hatina wî dibin “çil” kurê astengêr. Di vir de hêmana temamker K_1 e.

Di heman demê de ji aliyê peyv-wateyî û mantiqî ve jî gava em li çîrokê binêrin, peyvên wek “pîrê” yan “kur”/“kur” an jî “pîrê” hev temam dikin. Ev peyv hem hev temam dikin û hem jî wateyê li hev bar dikin. Peyva “pîrê” bi peyva “kur” tê watedarkirin û ya “kur” jî bi “pîrê”. Her çiqas kirde û pênaseya van kirdeyan di çîrokê de eşkere be jî, ango têgînên wek “pîrê” û “kur” hatibin diyarkirin jî hebûna kirdeyeke ku wek “pîrê” hatibe pênasekirin hewcehî bi kirdeya “kur” tê kirin. Di derbirîneke bi rengî de û di nirxandineke semiyotîkî de

têkliya têtînên dijber û yên watedar ji bo sererastkirina wateyê di derbirînê/metn de gelekî girîng e. Di vê derbirînê de jî ji aliyê wateyî ve heke pîrek hebe û taybetiyên wê yên ‘mêti’yê hatibin diyarkirin ji bo ku ev taybetî watedar bibin hewcehî bi kirdeyeke ku bikaribe van taybetiyan bikar bîne heye ku ev jî di vê çîrokê de “kur” e.

Di bin van hemû wateyan de K_1 di vê beşê de xwe bi astenker (pîrê) ve wek “kur”ê wê dide naskirin û bi vî awayî jî destpêka bernameya derbirînê ji nû ve ava dike. Her wiha di vê beşê de em rastî veguherîna astenker jî tîn, di serî de “pîr”a ku wek astengêrekî derketibû holê bi beralîkirinên K_1 ê û bi awayekî neyekser dibe alîkar ku K_1 bernameya xwe ya sereke didomîne.

3.4.Beşa Çarem: Kiryara Yekem

Ev beş bi hevoka “go wele viya çû çû, nert birao wa çil bira di şikevtakê de ne, çil hût, weke hûta ne” dest pê dike ku bi vî awayî hin karakterên din tevli çîrokê dibin û bi hevoka “go rabû hat, ew tamam gûh xistine kîsekî û xistine bin kevirekî û heta ba diya xwe ba pîrê” diqede.

Di vê beşê de ev karakterên ku derdikevin pêşiya K_1 ê bi awayekî neyekser pê re dibin alîkar ji bo ku bigihê armanca xwe. Ji ber ku ev karakter wek komekê tîne pênasekirin em ê wan wisa nîşan bidin: K_6 (hût). Ev hût bi tizbiya diya (pîrê) xwe wî nas dikin, wek ku “pîrê” jî diyar dike “tizbîka min nîşana min e” naxwe “wê te bikujin”. Di vê peywendê de em dikarin vê veguherîna karakterên me wisa nîşan bidin:

$$(K_1 \cup K_4) \rightarrow (K_1 \cap K_6)$$

Wek ku me di beşa borî de jî destnîşan kir K_1 xwedî fonksiyona tamamkirinê ye.²² Ne birayên wî yê rastî (K_4) bêyî wî dikarin bernameya xwe ya derbirînê ava bikin û ne jî “hût” (K_6). Bi hevoka “wele mê herine ser bajarekî. Çil qîzê padîşe heye. Em dibê qey em ê herin wan ji xwe re bînin o her şev em diçin dora wan” K_6 bernameya xwe ya derbirînê eşkere dikin ku K_1 jî xwedî heman bernameyê ye. Di vir de taybetiyeke her du koman heye (ya her du kom-birayan), her du kom jî xwedî heman bernameyê ne, her du jî bi armanca qîz dîtîninê kiryarên xwe pêk tînin. Ji aliyekî din ve her du kom jî xwedî heman hejmarê (sî û neh) ne û rola K_1 ya tamamkirinê di vir de bêtir eşkere dibe. Her du kom jî bêyî K_1 (Mîrze Miheme) nikarin armanca xwe bibin serî, “em dibê qey em ê herin wan ji xwe re bînin o her şev em

²² Di beşa yekem ya vê tezê de em li ser girîngiya hejmaran di çanda devkî sekinî bûn. Di çîrokê kurdî de jî hin hejmarên girîng hene ku 40 (çil) jî yek ji wan e. Di vi çîrokê de kêmasiya hejmarê 39 (sî û neh)ê bi texmîneke der-metnî girêdayî pîroziya hejmarê 40 (çil) e.

diçin dora wan” ku di vê hevokê de tiştê ku balê dikişîne îfadeya “her şev” e, naxwe ev kiryar gelek caran hatiye ceribandin, bi gotineke din teşebûsên bi vî rengî gelekî pêk hatine lê encam nedane.

Di vê beşê de îfadeya “çil qîzê padîşe heye” lê beravajî vê sî û neh hût hene, yanî “qîzek” zêde ye ku di beşên şûndetir de em ê bibînin ku ew “qîz” bernameyeke derbirîne bi pêşiya K_1 ê dixê. Ev hemû taybetî hewcehiya bi temamkirina çil birayî destnîşan dikin ku K_1 vê fonksiyonê bi cîh tîne.

K_1 (Mîrze Miheme) bi kuştina hûta yekem kiryara xwe (performans) bi cîh tîne. “Heta ku her çil hût jî serê wan jêkir” (heta ku serê her çil hûtî jî jêkir); ev îfade wek xetayeke vegêran derdikeve holê di çîrokê de, naxwe beriya wê em dizanin ku ew sî û neh bira ne.

3.5.Beşa Pêncem: Kiryara Duyem

Bi guherîna cîh ve ev jî bi awayekî mecbûrî dibe beşeke din ku ev beş bi hevoka “go lawo birê te çawa bûn?” dest pê dixe û bi hevoka “go di dilê xwe de go erê xew bû, win di xewê de bûn” diqede.

K_1 divê beşê de li hember pîrsa “pîrê” (lawo birê te çawa bûn?) ji bo hûtên ku serê wan jêkiribû derewan dixe û dibêje; “wele yadê baş bûn, sebra min bêyî te nehat” û bi vî awayî jî rola “zaroktiyê” didomîne. Lewra pîrê (astenker-dijkirde) bi vî awayî hatibû xapandin, bawerî bi “piçûkahî/zaroktiya wî anîbû. Ev rêbaz ji bo dabînkirina kiryara duyem a K_1 ê keysekê peyda dixe.

Di vê beşê de em dibînin ku encama şîreta (mêrga ku şop lê neketibe win lê dênenin) K_5 (bav-padîşe-şandiyarê neyekser) derdikeve holê û sedema kevirbûnê jî ev bi xwe ye.

Mîrze Mihemeyê ku ji pîrê çareya başbûna birê xwe hîn dibe kiryara duyem (perpormans-serkeftina kiryarê) pêk tîne. Ev kiryar dê bi şewitandina pîrê bi encam bibe. Mîrze Miheme nikare kaloşkê bavêje firnê “yadê e newêrim ka wer tê bavêjiyê” lewra ew hê “piçûk” e, pêsirê dimije û “bêriya diya xwe dixe” û jixwe “ma kî kare te bişewtêne”. Ev hemû hêman serkeftina wî ya performansê dide diyarkirin.

3.6.Beşa Şeşem: Encama Kiryaran

Ev beş bi hevoka ku guherîna cîh nîşan dide “Go wele rabûn, hatin, hatine bajêr” dest pê dixe û bi hevoka fermana şadyar “go li kur be tê herî bînî, e nizanîm” diqede. Di vê beşê de

K_1 (Mîrze Miheme) û birayên xwe digihine armanca ku çîrok dabû dest pê kirinê. Bi gotineke din bernameya derbirînê ya ku wan xistibû rê di vê beşê de bi dawî dibe.

Kiryarên K_1 ê yên performansê ev ancama peyda kirin û tam jî wek xwesteka bavê wan bi “çil qîzên ji bavekî” re dizewicin. Lêbelê qîza piçûk (em ê wisa nîşan bidin K_3) ya ku bi K_1 dizewice bernameya xwe ya derbirînê ber bi wî (Mîrze Miheme) dixê, ji ber vê sedemê em dikarin bibêjin armanca destpêkê sedî sed pêk nehatiye. Bi vê layena xwe K_3 ji ber li hember vê encamê disekine em dikarin wê wek astengêrekî jî bihesbînin lê ev astengkirin neyekser e, lewra girêdayî şertekî ye (go here mesela bajarê Mihemedê Kengê ti ji min re tînî bîne, ti naynî niha zê cêbeke giran bênim serê te). Her çiqas di çîrokê de rast rast neyê gotin jî em dikarin vê wateyê jê derxin. Ji ber ku şert li hember têkiliyê du alî tîn dayîn. Ango Mîrze Miheme heke ku şert neyîne cih ku nexwaze dikare neyê jixwe ku bi vî awayî dê gefa K_3 bê wate bimîne. Bi gotineke din divê Mîrze Miheme lê vegere da ku gefa K_3 watedar bibe. Di bin van hemû hêmanan de Mîrze Miheme mecbûr dimîne ku here lewra heke serî li ber bernameya derbirînê ya K_3 yê rake “niha zê cêbeke giran bênim serê te” û di heman demê de ev serhildan dê bibe sedema nebicihatina xwesteka bavê wî jî.

Di vê beşê de em dikarin têkiliya mantîqî û sentaksî ya di navbera kirdeyan/kiryaran de wisa nîşan bidin:

<u>Şandyar</u>	<u>Kirde</u>	<u>Bireser</u>	<u>Hilgir</u>
(K_3)	(K_1)	(B)	(K_2)
(Bûk/Qîza piçûk)	(Mîrze Miheme)	(Mesele, serpêhatî, nepenî)	(Mihemedê Kengê)

K_3 (şandyar) ji bo bidestxistina mesela Mihemedê Bajarê Kengê (Hilgir) K_1 (Kirde) dişîne.

Têkliliya Mîrze Miheme û birserê di destpêka vegotinê de em dikarin wisa nîşan bidin:

$$(K_1 \cup B)$$

3.7. Beşa Heftem: Yekem Alîkar û Yekem Kiryara Performansê

Beşa heftem bi hevoka “go viya derî girt û vejeriya çû çarçiyê” dest pê dike û hevoka “go tamam” diqede. Ev beş ji bo ku K₁ bernameya derbirînê ya K₃ yê bi cîh bîne beşa amdehiyê ye. Di vê peywendê de bi astengêrên neyekser re di çarçoveya eksena berxwedanê/iqtidarê de dikeve şer.

K₁ê ku bi pey “mesela Mihemedê Bajarê Kengê” dikeve li cihekî din li mala Pîrekê (alîkar) dimîne û ji Pîrê sedema tunebûna avê hîn dibe. Tunebûna avê (ava vexwarinê) dike ku K₁ bernameya xwe ya derbirînê ava bike ku ev bername jî çareserkirina tunebûna avê ye. Ev pêvajoyê (berxwedana bi zîyayê ku rê li ber avê girtibû û talî kuştina ziya/mar) Mîrze Miheme ji bo pêkanîna (çûyîna Bajarê Kengê) kiryara wî amade dike û wek ku (hînbûna mesela Mihemedê Bajarê Kengê) em ê di beşa heştem de jî bibînin piştî kuştina zîya, Pîrê (alîkar) ji bo bernameya wî ya derbirînê alîkariyê pê re dike ku em dikarin vê di eksena alîkar û kirdeyê de binîrxînin.

Her wiha ev beş wek qonaxa bidestxistina agahiyan/kiryaran tê binavkirin. K₁ dixwaze Mihemedê Bajarê Kengê bibîne, lê belê ji bo ev xwastin bi cîh were divê bizanibe ka Bajarê Kengê lu ku derê ye. Ji bo ku vê pêk bîne jî divê hewceyên vê kiryarê bi cîh bîne.

Ji aliyekî din ve kiryara performansê (kuştina ziya) ya Mîrze Miheme ji bo wî alîkarên din jî peyda dike (go îro ti çi ji min dixwazî zê bidime te) ku ew jî padîşahê wî bajarî ye.

3.8. Beşa Heştem: Encama Lêgerînê


Ev beş bi hevoka “go dîsa hate mala pîrê” dest pê dike û bi hevoka “qamtira kirin anîn bin darê danîn” diqede.

Pîrê piştî hîn dibe ku K₁ (Mîrze Miheme) ziya kuştîye vê kiryara wî dicibîne “lawo ma ti vî mîrxasê hana yî” û li pîrsa “pîrê ma tu nizanî ma Bajartê Kengê li kur e?” jê dike. Ev ji bo amadehiya pêkanîna bernameya derbirînê lûtkeya dawî ye. Lewra sedemek lazim bû da ku K₁ bikaribe vê pîrsê bike ku mîrxasiya ku bi kuştina ziya re derketibû holê ev sedem ava kir û zemîn ji vê pîrsê re çêkir. Her çiqas di çîrokê de bi awayekî yekser neyê diyarkirin jî Mîrze Mihemeyê ku bi pîrskirina vê pîrsê re derketibû rê gava ku li mala pîrê bû mêvan ev mijar (pîrs) di navbera wan de nehate axaftin heta ku mîrxasiya wî peyda bû.

Bi xêra vê (kuştina ziya) mîrxasiyê Pîrê (alîkar) ji K₁ ê re qala serboriya (her sal her sal wê çêçikê xwe mezin bike. Çêçikê wî bigihîne firrê û go ziyak diçe wan çêçika dixwe û wilo dimîne. Ew jî sar dimîne. Her sal karê wî ew e) Teyrê Sînbeg (alîkarê yekser) dike û her

wiha ji bo tevgerîna wî kopî jî didiyê (de wekî ku wilo de here, ti vî zilamê jêhatî ku ti wî ziyayî bikujî belkî ew tiştêkî ji te re bibêje). Di vê peywendê de Pîrê bi axaftinê xwe rê bir bi wî dixê. Her wiha baweriya ku di derbarê axaftina Teyrê Sînbeg de bi Pîrê re çêkiriye jî dîsa kuştina ziya ye ango kiryara performansê ya K_1 ye. Ji ber ku “kes newêre” here ba Teyrê Sînbeg, ancax mêrxasekî “ti vî zilamê jêhatî” dikare vê kiryarê pêk bîne.

Ev raza (xwarina çêçikên Teyrê Sînbeg ya ji aliyê ziya ve) ku her kes pê dizane lê Teyrê Sînbeg pê nizane ji bo demeke kurt ji aliyê Teyrê Sînbeg ve K_1 wek astengêrekî xuya dike, astengêrekî ku Çêçikên wî dixwe. Di heman demê de K_1 di vê beşê de fonksiyona alîkar jî pêk tîne:



Lêbelê ziman dikeve devê Çêçikan (taybetiyeke mirovatiyê) û mijarê (ti were. E vî mêrkê bin (darê) ew ê go ziya kir were kir me bixwe û go ew ya ew kuşt va me têr xwariya va me para te jî hîştîye) ji diya xwe re dibêjin. Teyrê Sînbeg (alîkar) ji bo vê qenciya K_1 ê qebûl dike ku wî bibe Bajarê Kengê. Di pêvajoya qebûlkirinê de Teyr taybetiyên mîrovî (axaftin, bibîranîna serboriyan û sozdayîn) nîşan dide. Lê şertan “de here heft kûn av, heft dûvê berana, heft tenûr nan ji min re bîne û were” datîne pêşiya wî. Pêkanîna van şertan wek ku me berê jî diyar kiribû, di beşa borî de ku wek beşa amadehiyê ji bo pêkanîna kiryara sereke me nirxandibû. Yekem kiryara bernameya derbirinê ya K_1 ê kuştina ziya bû ku bi kuştina vî ziyayî jî kiryara duyem pêk anî. Ev her du kiryar ji bo gihaştina armanca xwe bi awayekî yekser rol dilîzin em dikarin wan wek kiryarên serkeftinê/performansê binirxînin.

3.9. Beşa Nehem:

Ev beş bi hevoka “Go de were ser baskê min dêne û ti jî li ser siwarê û hema xwe bigire ti nekevî” dest pê dike û bi hevoka “Go gava ku li te bû pêsertengî go pirtikê min li hev xe, ez ê ji ter werim, xwedê bê herê” diqede. Di vê beşê de şertên ku Teyrê Sînbeg li ber K_1 ê danîbûn bi cîh tînin û ji bo derketina rêya Bajarê Kengê hemû amadehî tînin kirin.

Ev beşa ku em ji tevgerên Teyrê Sînbeg tê derdixin ku tebeqeyeke din (dinyayeke din) e, ji bo gihaştina vê dinyayê jî hewcehiya Teyrê Sînbeg bi xwarina heft tenûr nar, heft kûn av

û heft dûvê berana heye. Di peywenda çîrokê de hejmara “heft” gelekî girîng e, her çiqas bi awayekî yekser neyê gotin jî em ji herîkîna çîrokê tê derdixin ku Teyr bi vê xwarina (tenûrek nan, kûnek av û dûvekî berana) qatek asîman bilind dibe. Ev di çîrokê de bê îstîsna wisa derbas dibe:

- “Çiqa dinya ji te ve xuya ye?
- Wele hîn dinya teve ji min xuya ye.
- De ka tenûreke nan û dûvkî berana û kûnek av bavê bin zimanê min.

Go wele vîya dayê, dîsa bilin bû bilind bû. Go dîsa;

- Dinya çiqas ji te ve xuya ye?
- Wele dinya baş xuya ye hê.
- Dîsa ka tenûrek nan û dûvkî berana.

Werhasilî ew jî dayê, xwar. Dîsa bilin bû bilind bû;

- Wele yanî gund hew xuyanîne.
- Dîsa ka bide min.

Werhasilî dayê, heta ku bû taristan.

- Çiqa dinya ji te ve xuya ye?
- (E)z derkê nabênim, bûye taristan ji te pê ve (e)z kesî nabênim”

Wek ku ji vê pasajê jî xuya dike mekan bi tehavî diguhere ku ev jî nîşan dide bê ji bo çî “mesela Mihemedê Kengê” di çîrokê de xwedî cihekî girîng e û bidestxistina wê çî qas zahmet e. Di vê peywendê de tercîha şandyar (K₃, Bûk, Qîz) bi mêrxasiya (kiryara performansê/kuştina ziya) K₁ê (Mîrze Miheme) ve girêdayî ye.

Derasayîbûna vê “mesele” û derasayîbûna “mekan” (Bajarê Kengê) du babet in ku di navbera wan de peraleltî heye. Di çarçoveya vê derasayîbûnê de rêwîtiya vî bajarî jî bi Teyrê Sînbeg tê kirin ku ev erk û kirdeya vê erkê di heman rengî de dikarin werin nirxandin. Bi gotineke din rêwîtiyeke derasayî bi amûreke derasayî dikare were kirin. Helbet çîrok bi tevahî ji derasayîbûnê pêk tê lê girîngiya “mesela” ku di çîrokê de derbas dibe ancax bi amûrekî weke “Teyrê Sînbeg” dikare were bidestxistin. Lewra ev ajal ji ber bastûra xwe xwedî hêzeke taybet e di çîrokê de.

Di çarçoveyeke der-metnî de hejmara “heft” asta bilindbûna teyrî simbolîze dike (heft qatê asîman) û talî gihaştina bajarekî “xerîb”.

K₁ gava digihêne bajêr Teyrê Sînbeg (alîkar) du pirtikan ji baskên xwe jê dike û didiyê da ku wextê gazî wî bike pê ve were (Gava ku li te bû pêsertengî go pirtikê min li hev xe, ez ê ji ter werim).

3.10. Beşa Dehem: Kiryara Yekem a Vê Beşê

Ev beşa bi hevoka “Go wele hat hat li ber dikanekê, nêzîkî dikanekê rûnişt ji xwer” dest pê dike û bi hevoka “Go mesela te çi ye?” diqede.

Ev cih (dinya/tebeqe) ne wek yên din e, lewma jî K₁ ji aliyê kesê yekem (wek xwediyê dikanê di çîrokê de tê pênasekirin) yê ku lê rast tê “Go wele ti ne weke xelkê van darî yî” tê pênasekirin. Ev babet piştrast dike ku ev der/cih ji cihên din cûda ye. Di vê beşê de beravajî beşê din K₁ ne bi mêrxasiyeke (kuştina ziya û wd.) derasayî, lê bi kiryareke ji rêzê xwe amade dike û vê jî bi “lêxistana saz û gotina dîroknê xweş” dike. Ev babet nîşan didin ku ev cih li gor yên din xwedî derasayîbûnekê ye. Di navbera vî cihê ku wek “Bajarê Kengê” tê pênasekirin û cihên din de beravajiyek heye. Leheng dema ku ji cihê xwe (ev cih, cihê yekem yê derbirînê ku tê zanîn) dûr dibe derbasî cihekî biyanî (cihê duyem yê derbirînê) dibe. Beravajîtiya di navbera cihê nas û cihê biyanî de ji aliyê wateyê ve xwe dispêre vê duhaniyê:

/ nizm / ≠ / bilind /

Têgîna *nizm* taybetiya cihê nas pêk tîne û têgîna *bilind* jî di derbarê cihê biyanî de ye. *Bilindahî* gerdûneke derasayî simbolîze dike (Rifat, 2018b: 136) ku Mîrze Miheme çawa ku giha vî bajarî ji aliyên “dikan”dar ve wek kesekî “xerîb” hat ditin. Destpêka derbasbûna cihê biyanî/*bilind* hê li ser “Teyrê Sînbeg” dest pê kiribû. Derketina wî ya asîmana û windabûna/tarîbûna dinyayê nîşaneka derasayîbûnê ye. Ev derasayîbûn taybetiya çîrokan ya herî diyar û xurt e.

Guherîna cih bandorê li ser lehengan jî dike, derasayîbûn dê K₁ê biguherîne, yanî dê Mîrze Miheme ji rola aktîf derbasî rola pasîf bibe, ji kiryar derbasî guhdervan bibe. Lewra li vê derê kirdeyê sereke dibe Mihemedê Bajarê Kengê (yê ku bûyera bi rêve dibe û sererast dike), (ku em ê wî wisa nîşan bidin: K₂) ye. Ew “axa” ye xwediyê Bajarê Kengê ye. Lewma jî derasayîbûn/mêrxasî tenê wek para wî hatiye dîtîn. Yê ku di vê beşê de dê rê bide bûyeran ew (K₂) e, ji ber van sedeman jî giraniya çîrokê li ser wî hatiye avakirin û rê li ber “mêrxasiyên” K₁ ê hatiye girtin. Ev pêvajoya bi awayekî xwezayî K₂ dike bandordar jî.

K_1 kiryara xwe ya yekem bi lêxistan saz dike û bi vî awayî jî ji bo hevdiîtina bi K_2 yê re xwe amade dike. Bi vî kiryarê navê wî “Go temamê bajêr lê civiya li dirokê wî û sazê wî hingî ku xweş kir” li tevahiya bajêr belav dibe heta ku Mihemedê Kengê tê diîtina wî û wî vexwendeyî mala xwe dike. Di vî beşê de Mîrze Miheme hem bandordar e hem jî bandorker e. Bandordar e lewra bi kiryarên xwe kir ku K_2 were diîtina wî. Lê ev pêvajoyê heta ku K_2 dest bi “mesela” xwe dike didome. Piştî wê K_2 (Mihemedê Kengê) bandordar K_1 (Mîrze Miheme) bandorker e. Bi vî awayî kirdeya sereke ya vî beşê diguhere. Têkiliya di navbera bireser û kirdeyan de jî em dikarin wisa nîşan bidin:


$$(K_2 \cap B) \rightarrow (K_1 \cup B)$$

K_2 , wî (Mîrze Miheme) vexwendeyî “Go kerem ke ti îşev mêvanê min î” mala xwe dike. Mîrze Miheme pê dide zanîn ku heta ew meseleya xwe jê re nebêje ew ê şîva wî nexwe. K_2 her çiqas di serî de nexwaze meseleya xwe bibêje jî (mesela çê?) têkiliya di navbera wan de ya mêvantî û mazûvantiyê wî mecbûr dihêle lê gotina “mesela” xwe girêdayî şerta “Go binêre ez gava mesela xwe ji te bêjim, ez ê serê te jêkim” dike lewra “kesek bi mesela min nehisiya ye, min ji kesî re negotiye, ti kes pê nizane”. Bi vî awayî di navbera kirdeyan de peymanek tê danîn. K_1 vî qebûl dike ku em ê sedema vî qebûlkirinê di dawîya çîrokê de hîn bibin.

Têkiliya di navbera kirdeyan de ya mantiqî raste rast bi vî awayî li ser “mêvantî-mazûvantî”yê ye. Qewîbûna vî têkiliyê di çîrokê de bi nexawrina xwarinê ve hatiye girêdan, K_1 diyar dike heta ku K_2 “mesela”²³ nebêje ew ê xwarinê nexwe. Ev îsrar ne wek kiryareke zorakî dixuye, beravajî vî di çîrokê de wek xwestekeke dilsoj xuya dike. Ji ber vî sedemê jî K_2 xwesteka (gotina meselê) K_1 bi cîh tîne. Hevoka “ya tê bêjî ya jî şîva te naxwim” di xwediyê malê de şermekê peyda dike û dibe sedema gotina “meselê”. Her çiqas di çîrokê de peyva mazûvan derbas nebûbe jî, ji aliyê mantiqî ve heke “mêvan” hebe divê li hember vî “mazûvan” jî hebe. Mazûvan dawet dike û mêvan jî îcabetî vî dawetê dike, yanî têkiliya wateyî ya di navbera van peyvan de di çîrokê de dikare bê diîtin. Li ser van peyvan raste rast dijberiyek peyda nebe jî ji aliyê wateyê ve têkiliyek heye; ji bo mazûvan, yê ku dawet dike, ji bo mêvan jî, yê ku tê dawetkirin em dikarin bibêjin. Ev têkilî bi pêkvebûna van morfeman di derbîrînê de hatiye nîşandan.

²³ Ev îfade û îfadeyên wek vî raste rast ji çîrokê hatine wergirtin, bêtî ku sererastkirinek lê bibe.

Eksenên Fonksiyonên di çîrokê de yên kirdeyan em ê wisa xêz bikin, ev eksen ji fermana K_3 (şandyar) dest pê dike heta gihîna Bajarê Kengê ango dîtina Mihemedê Kengê û hînbûna meselê didome, di vê peywendê de em ê fonksiyona kirdeyan li ser şemayê wisa nîşan bidin:



K_3 (şandyar) ji bo hînbûna mesela (bireser) K_2 yê (hilgir) K_1 (Mîrze Miheme) erkdar dike, ew mecbûr dimîne “ti naynî niha zê cêbeke giran bênim serê te” ku vê qebûl bike ku ev di eksena peymanê de tê nirxandin. K_1 di vê peywendê de ji bo bidestxistina vê meselê (bireser) dest bi lêgerînê dike. Di vê lêgerînê de biawayekî neyekser du alîkar (Pîrê û Padîşe) û astengêrek (Ziya/mar) û bi awayekî yekser jî alîkar (Teyrê Sînbeg) derdikevin pêşiya wî, lê ev her du alîkarên neyekser ji bo dîtina alîkarê yekser alîkariyê pê re dikin. Lê belê alîkarê yekser (Teyrê Sînbeg) raste rast ji bo bidestxistina bireserê alîkariyê pê re dike. Ev têkilî di eksena alîkariyê de tê nirxandin.

Her wiha neyekserbûna astenker jî di vê lêgerînê de ne li hember bidestxistina bireserê ye, lê wek ku me li jor jî diyar kiribû kuştina ziya (astengêr) K_1 ê ji bo bidestxistina birserê (meselê) amade dike. Di heman demê de “mêrxasiya” ku di kuştina ziya de nîşan dabû bibû sedem ku pîrê (alîkarê neyekser) pê re alîkariyê bike. Têkiliya dinavbera K_1 û astenker (Ziya/mar) de di eksana berxwedanê de tê nirxandin.

4. Binbeşên Çîrokê: Dûvbûyera (tr. Olunut, İng. Artifact) Çîrokê²⁴

4.11.1. Beşa Yekem: Rewşa Destpêkê

Ev beş bi tevlîbûna karakterên nû û çîrokeke din “Go rokê mala xalekî min hebû, go dûrî me bû” dest pê dike û bi hevoka “her wê ji xwer bibe, bavê pişt xwe bibe” diqede.

Ev çîrok ew “mesele” ye ku K₁ li gor benameya derbirînê ya K₃ yê (Bûk, Qîz/Jina wî) bi pey ketibû. Ev “mesele” di heman demê de aliyekî din yê derbirînê derdixe holê. Ji du armancan (a yekem bernameya derbirînê ya K₅ (bav)ê / zewaca bi çil qîzên ji bavekî) ya duyem e ev ku çîrokê tam jî ji aliyê bernameya derbirînê ve dike du beşan. Bernameya derbirînê ya yekem ji serê çîrokê dest pê dike heta zewaca “çil birayî” bi “çil qizî” re ya duyem jî ji zewacê dest pê dike heta dawiya çîrokê didome.

Ev beş destpêka yekem diyarkirinên di derbarê honaka bûyeran, dem û cih de ye ku wek beşa amadehiyê, ya destpêkê ye.

Di destpêka çîrokê de bernameya derbirînê ya bûyeran tê destnîşankirin: “Go rokê çûme mala xalê xwe wa mala xalê mi bi made ne û xeber nadin” Di vir de vegêr fonksiyona şandyar xwe bi xwe bi cîh tîne, di çîrokê de sedema çûyina “mala xal” û fermanîdar (şandyar) tune ne. Sedema xemgîniya xalê (em ê wisa nîşan bidin: K₈) wî “go wele jinxala te welidiye û keçikê jê re çêbûye û jinxala te miriye û ew keçik maye, ez nizam mê çar bikine jê ve”. K₂ ji bo dawî li xemgîniya xalê xwe bîne “ez ê keçikê ji xwer bibim, ez bibim wê xwedî bikim ji we re” rêyeke bi vî awayî ber bi K₈ ê dixê û K₈ vê (wele ti bibî mala te ava) qebûl dike. Wek ku di vir de jî xuya dike hê jî şandiyarek li holê tune ye. K₂ li gor dilê xwe tev digere.

Piştî ku qîzê (em ê wisa nîşan bidin: K₇) mezin dike û wek ku berê gotibû li K₈ vedigerîne K₈ li hember vê rewşê şaş dimîne “vêga ew keçika çilîniye te aniye, vêga nemiriye?” û K₇ (Keçikê) dide K₂ yê ku bi vî awayî bernameya xwe ya derbirînê ya kurt ava dike. Heke em di derbirînê de li têkiliya mantiqî û sentaksî ya di navbera kirdeyan de binêrin K₈ (Xal) şandyar e ku K₂ tevdigerîne. Tevgera K₂ yê jî xwesteka K₈ e ku çîrok li gor vê xwestekê dest pê dike. Her wiha ev xwesteke ku çîrokê li herikîneke diyar de dide rûniştin. Bi vî halê xwe K₈ di vir de bandordar e û K₂ jî bandorker e. K₂ ji bilî ku teşneyî vî karî ye ew ji ber ku xwarzî ye (di bin tesîra bandordar de ye) vê xwestekê qebûl dike.


²⁴ Em ê vê çîroka nû di binbeşên çîroka sereke de binirxînin. Ev rêbaz dê ji bo nirxandina çîrokê hin hêsaniyan peyda bike û dê tevlîheviyê ji holê rake.

4.11.2. Beşa Duyem:


Ev beş bi hevoka “go wele ez hatim, qîza xalê xwe anî, mi li xwe mar kir” dest pê dike û bi hevoka “yanî çûme tewaletê û ez hatim” diqede. Zewaca K_2 û K_7 encama bernameya derbirînê ya K_8 (Xal) e. Bi vê binbeşê re K_1 bi temamî dibe kirdeyeke pasîf.

Di vê beşê de K_2 qala serpehatiya xwe û jina xwe (K_7) dike. Hevoka “rokê didiwa sisiya mehekê salêkê bê çi qasî li ba mi ma” pêkvejiyana bi hev re destnîşan dike ku ev ji bo demê girîng e. K_2 bi cûdatiya di navbera hespên xwe de “mi nert carekê hespê min î bahrînî xera dibe ê bayînî çêdibe” dest bi lêgerînê dike. Gava ku sedema vê ji “seyîsan” dipirise, bersiva “sûcê pîreka te ye” didin ku dê ev rêya lêgerînê nîşanî wî bide. Bi vî awayî K_2 yekem kiriyara xwe pêk tîne û wê şevê “tîliya xwe diqelîşîne” da ku ranekeve. Ev kiryar meraqa wî ya hînbûnê nîşan dide. K_2 bi vî awayî dixwaze ku kiryarên jina xwe (K_7) hîn bibe û bi fêlebaziyeke piçûk xwe li xew dêfîne.

K_7 piştî ku mêrê (K_2) wê radizê dest bi sepana bernameya xwe ya derbirînê û di heman demê de ya “nepenî” dike. Di eslê xwe de ev “nepenî” ye ku bûye mijara vê “meselê”, wek ku me li jor behs kiribû û çîrok kiribû du beşan; ev nepenîbûn ji beşa duyem (piştî zewaca K_1) a çîrokê û vir ve li dar e. K_7 kiriyara xwe bi “hespê bahrînî” dike û K_2 jî bi “hespê bayînî” bipey dikeve, taybetiya van hespan di peywenda çîrokê de ev e; yê bahrînî (derya) di bahrê de xurt e û beravajî vê li bejê jî qels e, lê belê “hespê bayînî” li bejê xurt e. Ev encam dike ku K_2 bikaribe di kiriyara wê de bigihêje wê. Bi vê taybetiya xwe “hespê bahrînî” wek alîkarekî ye ji bo K_2 yê, beravajî vê ji bo K_7 jî di fonksiyona astengêr de ye. Em rewşa hespan wisa nîşan bidin:



Di vir de bijartina hespan ya bi hişmend dibe encama serfketina K_2 yê di kiryara xwe. K_7 hespê bahrînî bi kar dianî “ê bayînî xurt bû, newêribû li wiya pir siwarê”. Her çiqas di çîrokê de nebeje ku “hespê bahrînî” hêdî be jî di layena mantiqî de heke hespek wek “xurt” , lezgîn hatibe pênaskirin divê beravajtiya vê “hêdî” be. Di vê peywendê de hespê K_7 bi awayekî yekser ji bo wê astenkerek e û ji bo K_2 bi awayekî neyekser alîkarek e. Têkiliya/bandora kirdeyan ya li ser hespan bi van her du têngînên dijber xwe nîşan dide:



Ev bandor/têkilî di navbera K_7 û “hespê bahrînî” de li ser hesta “baweriyê/ewlehiyê” pêk tê. “Hespê bahrînî” bi “hêdîbûna” xwe wek hespekî ewle tê dîtîn. Heman têkilî di navbera K_2 û “hespê bayînî” de jî heye, “hespê bayînî” jî bi “xurtbûna” xwe wek hespekî ewle tê dîtîn.

Di vê beşê de jî em li hejmara “çil”î rast tîne ku ev çil kes wek “çil heb hût” hatine pênasekirin. Ev rast hatin di çîrokê de hejmara komên ku wek “çil” hatine pênasekirin dike çar. Du heb kom wek “mirov”an (Mîrze Miheme û birayên xwe/Çil qizî ji bavekî; Çil hûtê kurê pîrê/Çil hûtê ku K_7 diçû dîtina wan) û du kom jî wek “hût”an hatine pênasekirin. Ev di çîrokê de beravajtiya bingehîn pêk tîne ku li hember “mirovan” “hût” disekinin. Hûtên “kurê pîrê” jî aliyê K_1 ê (Mîrze Miheme) ve hatibûn kuştin û ev “hût jî ji aliyên K_2 (Mihemedê Bajara Kengê) ve tîne kuştin. Wek ku me li jor jî behs kiribû derasayîbûn di çîrokê de di vê beşê de bi hebûna “hût”an li dar e yanî bi xuyanîbûna wan derasayîbûn peyda dibe.

“Mi bi çavê serê xwe dî her çil çû ba pireka min” dibe sedema kuştina van hûtan. Piştî ku K_7 jî vê derê dîr dibe K_2 kiryara xwe ya duyem, (performans, serkeftin) bi kuştina hûtan pêk tîne. Berî ku K_2 jî “şikevtê” derkeve karakterekî (yek wa bi qaça ve girêda ye) nepenî yê nû bi pîrsa “wa Mihemedê Bajarê Kengê ma tê min li vir bihêlî?” tevî bûyerê dibe û piştî ku K_2 wî rizgar dike “dîna ku min dî hinda bû. Min wî nedî. Hema ku min çawa dest û nigî wî vekirin min hew wî dî”. Sedema kirina vê kiryarê ya piştî çûna K_7 nîşaneke berdewamiya vê “mesela” nepenî ye. Heke beravajî vê berî ku jina wî biçûna ev kiryar pêk bianiyana dê tu têkilî di navbera her du beşên bingehîn yê çîrokê de nemana û bi awayekî xwezayî jî

hewcehî bi serpehatiya K_1 ê nedima. Derketina vî karakterê nû yê derasayî taybetiyeke cihê *bilind* e ji aliyê K_1 ê ve.

K_7 ji van hemû kiryanan bê xeber dikeve riya malê, lê K_2 bi “hespê bayîni” beriya wê digihêje malê û li benda wê dimîne.

4.11.3. Beşa Sêyem: Guherîna K_2 yê

Ev beş bi hevoka ku rewşa karakter nîşan dide “go ma serê sibê, ê de ez beecî me” dest pê dike û bi hevoka “heydê derê derve û go ez derketime derve” diqede. K_2 li hember vê “beecîn” a xwe heya ku bûyer nekemilin tiştêkî bi jina xwe nade hisandin. Ev nîşaneka xwesteka hînbûna aliyên nepenî yên bûyeran e.

K_2 “Sibê adine rojê, go mi xwe zûka li xew danî” da ku K_7 herê “şikêvtê” ba “hûtan”. Ev kiryar peymaneke yekalî di navbera kirdeyan de pêk tîne wek ku me li jor jî diyar kiribû ev nîşaneka xwesteka hînbûna têkiliya di navbera K_7 û hûtan de ye. K_7 “zûka vegeriya” lewra bernameya wê ya derbirînî ya nepenî hatibû xerakirin û bi awayekî xwezayî ev kiryar (kuştina hûtan) wê; “min zanibû tife tîfê wê ye, min zanibû raneza” aciz kiribû. Di vê beşê êşa biresera (hût/karakterê derasayî) ku ji aliyê K_7 ve tê windakirin bi kuştina qestî “mi di hema nigê xwe li nigê cêriyê xist, cêrî go gûmm di qesrê werkir” xwe nîşan dide. Di vê peywendê de “cêrî” fonksiyona alîkar bi cîh tîne. Bi mirina wê re K_7 “girî”yê ku nikaribû (a ti li ser viya digirî, ma ti li ser cêriyê digirî) li ser “kuştina hûtan” bike bi vî awayî cîh ji xwe re didît. Ev ji bo K_2 yê wek kiryareke xapînok xuya dike. Lê K_2 jiber ku bi eslê bûyerê dizane naxape û avakirina bernameyê nû ya derbirînê ya K_7 ê bi derxistina bernameya xwe ya derbirînê re (min go wa ka wî cihirû hespa bîne şebeşek têde mê ji xwe re bişkînin, tê bixwî. Go wele mi dî carekê şebeş anî..., ...Go mi dî gava ku serî anî, vala kir go min go a ti li ser viya digirî, ma ti li ser cêriyê digirî) serobino dike. Wek encama vê kiryarê “mi dî şivek ji ber xwe derxist go çelep di nava guhê mi de. go mi dî go heydê kûçik û go hema mi dî ez bûme kûçik” bi vî şiklî tê cezakirin. K_7 a ku di serê derbirînê de ji kirdeya xwe dûr bû, di dawiya derbirînê de jî rewşa wê neguherî:

$$(K_7 \cup B) \rightarrow (K_7 \cup B)$$

4.11.4. Beşa Çarem: Danîna Peymanê Yekem

Ev beş bi hevoka “ez çûme vir de bêhna însana ji min tê, vir de diçim kûçik tene min” dest pê dike û bi hevoka “mi go tamam” diqede. Di vê beşê de K_2 ji ber kiryara xwe ya

performansê hatiye cezakirin û bûye “kuçik”. Guherîna wî ya “kuçik” dibe ku wek awayekî piçûkxistinê bê xwendin lewra ew “heram” in.

Ev beş qala lêgerîna xelasiya ji rewşê “kuçikbûnê” dike. Di heman demê de ligel girêdana bi beşa din re ev rewş encama bernameya derbirînê ya K₇ ê ye. Wek ku ji hevokên destpêkê jî tê fahmkirin ji ser vê guherînê gelek dem derbas nebûye. Em dikarin rewşa “kuçikbûnê” wek kêmasiyekê jî bihesbînin ku ev lêgerîn ji bo temamkirina vê kêmasiyê ye. Li hember vê rewşa derasayî “pîrekek”e bi gotina “ji mêrê xwe re go ti vî kûçikî nas dikî..., ...go mi dî go mêrê qehpa xwîya min e” diyar dike ku bi eslê bûyerê dizane. Lê di çîrokê de nayê gotin bê ka bi çi awayî û ji ku dizane. Tenê tê gotin ku ev “pîrek” xwişka K₇ ê ye. Ev “pîrek” di çîrokê de kirdeya ku veguherînê pêk tîne ye (em ê wisa nîşan bidin: K₉). Her wiha ji ber ku ev “pîrek” û “di zarok” û “mêr” heman erkê pêk tînin û di çîrokê de li ser hev “di heb zarok e zilamek û pîrekek di ber mi re çûn” tînin îfadekirin em ê wan bi heman kirdeyê nîşan bidin.

K₉ jî wek xwişka xwe (K₇) heman teybetiyên di xwe de dihewîne û ji ber vê sedemê jî diyar dike “ez ê çil şivî bi vê şivê li texim. Minê deng ji te were ti rihet nabî ku deng ji te neyê tê rihet bibî” û bi vî awayî di navbera wan de peymanek pêk tê. Lê belê gava dor tê darê dawî “go a dawî hingî ku janê da kezeba min go min go ûyyy” peymana wan sedî sed nayê cih û K₂ her çiqas bûbe “însan” jî “dûvê kûçik” pê ve dimîne. Lê bi vî awayî jî kêmasî bi tê temamkirin û lêgerîn bi dawî dibe.

Têkiliya di navbera van kirdeyan de li ser dijminatîyê pêk tê. Di çîrokê de ev yek raste rast nehatiye diyarkirin lê hem îfadeya K₉ “mêrê qehpa xwîya min e” û hem jî îfadeya K₇ “qehpa xwîya min te rihet kiriye ne?” (îfadeya K₇ di beşa pêncem de derbas dibe) vê têkiliyê derdixin holê. Lewma jî K₉ “şiva” derasayî dide K₂ yê da ku bi awayekî neyekser xisarekê bigihîne K₇ ê. Her wiha têkiliya di navbera K₂ û K₉ di eksena alîkar de pêk tê, K₉ wek alîkar xuya dike. Lê belê ji ber ku planekî ber bi wî dixe fonksiyona şandiyar jî bi cih tîne. K₂ di vê beşê de bernameyeke nû ya derbirînê derdixe holê planê tolhildanê saz dike

4.11.5. Beşa Pêncan: Peymana Duyem û Kiryara Performansê

Ev beş bi hevoka “go mi anî şiva xwe xiste paşila xwe û ez hatime malê” dest pê dike û bi hevoka “wele go mi go ka bise zê herim ser serê qesrê” diqede. Di vê beşê de K₂ ji bo plana wî here serî wek karakterekî pasîf derdikeve holê “ewilî xwe kêmbike, jêr bê keçê ba de ti çi bikî tê bikî e deng nakim” wek ku alîkara wî jê re gotibû. Bi vî awayî gava plana xwe saz dike bi fêlebaziya ku dê li gor plana wî encam bide tev digere. Ev fêlebazî bi kêrî wî tê û

wek ku jê re hatibû gotin “şivê” bi kar tîne û wê (K_7) dike “qamtir” ku ev kiryarê performansê (serkeftin) ye û bi “qamtirçiyekî” peymanê dêtînin da ku wê bixe bin barê giran.

Di vê beşê de çîroka (mesele) K_2 diqede wek ku peyman bi K_1 ê re danîbû dawê li serjêkirina wî dike.

4.11.6. Beşa Şaşem: Dawiya Çîrokê û Peymana “Serjêkirinê”

Ev beş ji bo fahmkirina nepeniya ku ji beşa duyem ya çîrokê û vir ve li dar e, girîng e. Di vê beşê de wek ku Teyrê Sînbeg jê re gotibû “her du pirtikên” teyr li hev dixê û teyr pê ve tê û bi vî awayî ji mirinê rizgar dibe û bi vî awayî K_1 li ser peymana xwe namîne. Lê belê ji teyr dixwaze ku wî bibe ber pacê da “xatir” jê bixwaze lewra wî “pir taab bi min re dît”. Di vê beşê de ji îfadeyên K_2 yê (ewî yê daleqandî, ew qahpa jina min diçû rica wî ya..., ... ew yarê a te bû, ew yarê a min bû) tê fahmkirin ku sedema hînbûna vê “meselê” çî ye.

K_1 ku di serê derbirînê de ji bireserê jêkvebûyî bû di dawiya derbirînê de ev rewş guherî:

$$(K_1 \cup B) \rightarrow (K_1 \cap B)$$

5. Bergeha Karakterên Çîrokê

Di vê beşê de em ê têkiliya di navbera karakteran de li gor dem û mekan binirxînin. Gava em vê bikin tenê em ê bergeha karakterên ku bandor li ser bernameya derbirînê ya çîrokê kirinê, binirxînin.

Bergeha Padîşe (Bavê çil kurî): Xwesteka çil kurên xwe (destê me bide) me qebûl dike, lewra “li çil qîzên ji bavekî” geriya ye lê nedîtîye.

Bergeha Çil Bira: Tenê ji bo armançeke hevpar derketine rê û ji ber hejmara wan a zêde tîrsa wan ji kesî tune ye. Xwe pir û “mêrxas” dihesibinin.

Bergeha Pîrê (Diya çil hûtî): Ji ber ku xwediyê kiryarên “sêhrebaziyê” ye bi xwe bawer e û her wiha kesayeteke xweperest e li hember kesên xerîb lewma ji K_1 wek kurê wê tevdiqere.

Bergeha Padîşe (bavê çil qîzî): Ji ber ku ji “hûta” xelas bûye amade ye ku her tiştî bike ku bi vê armancê qebûl dike ku çil qîzê xwe bide çil birayî.

Bergeha Qîza Padîşe (ya piçûk): Xwedî nepenîyekê ye ku di çîrokê de nayê gotin û ancax di dawiya çîrokê de bi tîkiliya nepenî ya bi K_7 ê re em dikarin texmîn bikin. Tenê xweztekeke wê heye ew jî hînbûna “mesela Mihemedê Bajarê Kengê” ye ku bi hînbûna vê meselê em hîn dibin bê ka çi hêvî dike.

Bergeha Pîrê (alîkara neyekser): Piştî ku bi “mêrxasiya” K_1 ê dihise pê re ji bo armanca wî dibe alîkar.

Bergeha Padîşe (alîkarê neyekser): Ji ber ku ji ziya xelas bûye amadeye ku her cure alîkariyê bike û bi vê mebestê daxwazên K_1 ê bi cîh tîne.

Bergeha Teyrê Sînbeg û Çêçikan: Heft salan li ser hev çêçikên wî ji aliyê ziyayekî ve tîn xwarin ku ew pê nizane. Ji ber vê sedemê jî gava K_1 êli bin darê dibîne dixwaze wî bikuje lewra dikeve çewtiya ku K_1 çêçikên wê dixwe. Lê çêçikên wê jê re meselê dibêjin û dev ji vê kiryarê berdide. Di heman demê de ew jî û çêçikên wê ji xwedî taybetiyên mirovî ne di çîrokên de.

Bergeha Jina Mihemedê Keng: Xwedî nepenîyan e ku em di serê çîrokê de nizanin çi ne. Piştî ku “hût” tîne kuştin rûyê xwe yî rastî yanî kesayeta xwe ya xerab derdixe holê, lê heya hînga jî di derbarê armanca wê de em bi tiştêkî nizanin.

Bergeha Mihemedê Bajarê Kengê: Kirdeyê esil yê beşa duyem ya çîrokê ye ku tevahiya beşa duyem li ser serboriya wî hatiye sazkirin. Ew xwediyê Bajarê Kengê û “mesela” xwe ye. Heya niha ev mesele ji kesekî re negotiye û ji bo gotina vê meselê jî peyman “serjêkirinê” dîtîne. Di seriyê “mesele”ya xwe de kesayetekî bihêz, lê li hember derasayîbûna jina xwe (K_7) xwe pasîf dike û talî jina xwe ceza dike.

Bergeha Mîrze Miheme: Piçûkê çil birayî ye û hê di serê derbirînê de profîla karakterekî ku naxwaze bernamêyê xera bike, xêz dike. Her wiha kesayetekî mêrxas e ku ev taybetiya wî dihêle ku bigihêje her du armancên xwe jî (zewaca bi çil qîzên ji bavekî û hînbûna meseleya Mihemedê Kengê). Ji bo bernamêyê ya derbirînê ya birayên xwe pîrê dişewitîne û li hember xwesteka jina xwe serê xwe ditewîne ku bi vî aliyê xwe alîyekî wî yê îtaetkar jî derdikeve holê.

Di heman demê de li ser peyman ku bi K_2 yê re danîbûn jî nasekine. Lê belê heya ku meselê hîn dibe rûyê xwe yê rastîn vedişêre.

Bergeha Vegêr: Di beşa yekem ya çîrokê de di derbarê karakter, cih û armancê de agahiyan raste rast dide, lê ji destpêka beşa duyem û hata dawiya çîrokê di derbarê bernameya derbirînê de tiştekî bi me nade fahmkirin. Ji xeynî vegotina meseleya Mihemedê Kengê hemû bûyer ji aliyên vegêr ve tên gotin.

6. Pêkhatina Mekan di Çîrokê de

Di vê çîrokê de hijdeh mekanên fonksiyonel hene.

Mekanê Yekem: Cihê Seydê. Mekanê yekem yê derbirînê ye. Ev mekan destpêka bûyeran e. Çil Bira li vir destpêka avakirina bernameya derbirînê davêjin.

Mekanê Duyem: Mal (Mala Bav). Çil Bira di vî mekanî de destûra çûnê bidest dixin. Di peywenda karakter û mekan de ev der cihê biryardanînê ye. Bav, yekane biryara xwe li vir dide.

Mekanê Sêyem: Mêrg. Ev mekan xwediyê hukma ceza ye ku ev ceza ji ber ji şîretderketina bav pêk tê. Ev mekan layena bûyeran jî diguherîne û ji bo bernameya derbirînê ya Çil Bira wek cihê yekem astenker derdikeve holê.

Mekanê Çarem: Newal. Ev mekan ji bo Mîrze Miheme ew rê ye ku ber bi destpêka çareseriyê ve diçe.

Mekanê Pêncem: Şikevt. Di vî mekanî de Mîrze Miheme li yekem astenker diqelibe û ji aliyê Pîrê ve wek “kur” tê qebûlkin. Her wiha di vî mekanî Mîrze Miheme ji Pîrê (astengêr) çareya başbûna birayên xwe hîn dibe û bi vê helwestê Mîrze Miheme astenker ji holê radike û bi vî awayî kiriyara duyem a performansê pêk tîne.

Mekanê Şeşem: Şikevt û Sûr. Ev mekan ji ber çawaniya di peywenda çîrokê de em ê wan wek yek mekanî bihesbînin û nirxandina wan bi vî awayî bikin. Mîrze Miheme di vî mekanî de bi “hût”ên kurê Pîrê (astenker) hev nas dikin û kiriyara yekem a performansê li vî mekanî pêk tê. Di heman demê de li vî mekanî Mîrze Miheme bi vê kiriyara xwe keysa zewaca bi “çil qîzên ji bavekî” bi dest dixê.

Mekanê Heftem: Bajêr. Ev mekan cihê serkeftina bernameya derbirînê ya Çil Birayî ye.

Mekanê Heystem: Oda Pîrekê. Ev mekan, nexasim ji bo Mîrze Miheme dawiya bernameya derbirînê ye û bi vê layena xwe dawiya beşa yekem û destpêka beşa duyem a çîrokê ye ku di vê peywendê de Mîrze Miheme di vî mekanî de ji bo bernameya derbirînê ya Pîrekê ji aliyê wê ve tê erkdarkirin.

Mekanê Nehem: Çarçî, dikan û bajêr²⁵. Ev sêyek ji ber xwediyê heman temsîlîyetê ne, nemaze jî “çarçî” û “dikan” hêmanên bajara in em ê wan di nav heman mekanî de binirxînin. Ev mekan ji bo Mîrze Miheme dibe destpêka lêgerînê.

Mekanê Dehem: Gund, mala Pîrê, cihê avê, bajar. Ev her çar mekan jî em ê di bin çarçoveya heman mekanî de binirxînin lewra ev mekan jî xwediyê heman temsîlîyetê ne û ji bo heman kiryarê di çîrokê de cîh digirin. Di vî mekanî de Mîrze Miheme yekem kiryara xwe ya performansê ya beşa duyem a çîrokê pêk tîne. Di vî mekanî de Mîrze Miheme xwe ji bo bernameya derbirînê ya “Pîrek”a xwe amade dike û bi kuştina “ziya” dibe xwedî tecrûbeyên din. Li vir Pîrê “rêya” çûna Bajarê Kengê nîşanî wî dide. Her wiha ev mekan ji bo lêgerîna wî biçe serî du alîkarên neyekser dihewîne.

Mekanê Yazdehem: Newala bîrê²⁶, binê darê. Di vî mekanî de Mîrze Miheme kiryara xwe (kuştina ziyayê ku çêçik dixwarin) ya dawî pêk tîne û ji bo çûna Bajarê Kengê bi Teyrê Sînbeg re peymanê dîtîne. Her wiha di vî mekanî de alîkarek (Teyrê Sînbeg) tevlî derbirînê dibe.

Mekanê Duwazdehem: Bajarê Kengê, dikan. Ev mekan, cihê nîvserkeftina bernameya derbirînê ya Mîrze Miheme ye. Di vî mekanî de ew xwe ji bo dîtina Mihemedê Kengê amade (bilêxistana saz û gotina dîroknên xweş) dike.

Mekanê Sêzdehem: Mala Mihemedê Kengê. Di vî mekanî de Mîrze Miheme “mesele”ya Mihemedê Kengê dibihîze û bi vî awayî bernameya derbirînê ya wî li vir bi dawî dibe.

7. Mekanên Dûvbûyera Çîrokê

Mekanê Yekem: Mala Xal. Ev der mekanê yekem yê “mesele”ya Mihemedê Kengê ye. Destpêka bûyerên derasayî ye. Di heman demê de cihê tolhildana Mihemedê Kengê ye.

²⁵ Ev bajêr û bajêrê mekanê heftem yek in.

²⁶ Ev mekan, cihekî rasteqîn e ku çîrokbêj ji derdora xwe tevlî derbirînê kiriye.

Mekanê Duyem: Şikevt. Cihê pêhîsîna nepeniyên e. Mihemedê Kengê li vir bi bernameya derbirînê ya jina xwe dihise û yekem kiryara performansê ya ku dû re ji aliyê jina wî ve pê tê cezakirin li vir pêk tîne.

Mekanê Sêyem: Serê qesrê. Cihê ku Mihemedê Kengê ji ber kiryara xwe tê cezakirin û ji bo jina wî ji cihê pêhîsîna kujerê hûtan e ku bi vî awayî ev der cihê hilweşîna bernameya wê ya derbirînê ye. Her wiha Mîrze Miheme li vir ji serjêkirinê xelas dibe.

Mekanê Çaran: Hewş (mal). Ev der ew cihê ku Mihemedê Kengê lê baş dibe û ji bo tolhildanê planê xwe saz dike.

8. Sererastkirina Demê di Çîrokê de

Di çîroka Teyrê Sînbeg de qalibên wek “rokê, nîvê şevê, serê sibê, her sal, îsal heft sal, didiwa sisiya mehekê salêkê, dehkê, heştke” yên ku demê eşkere dikin û taybetiya dema çîrokê ne, hatine bikar anîn.

Di çîrokê de ji bilî mînakekê sererastkirina demê tevlihev e. Gava ku Mîrze Miheme dizewice û diçe ba jina xwe xwesteka jina wî dide nîşan ku bûyera/meseleya Mihemedê Kengî beriya zewaca wan qewimiye ku ev yekane mînak e di derbarê lidarxistina demê de.

ENCAM

Heta niha gelek cureyên tehlîlan li ser wêjeyê hatiye kirin ku semiyotîk jî yek ji wan e. Lê belê ji rêbazên din cuda, semiyotîk gava ku metnê tehlîl dike hêmanên der-metnî tevî çarçoveya tehlîlê nake ku ev jî taybetiya wê ya sereke ye. Di vê peywendê de semiyotîk di metnê de li wateyê, li îmkânên wê û li pêvajoya hilberîna wateyê digere. Di nav metnê de li metnê digere ku bi vî awayî jî dixwaze bigihêje binyata kûr ya metnê. Ev rêbaz di nav xwe de hewl dide ku wateyên ku di lêlatên cuda yên metnê de peyda dibin, têgînên ku bi hebûna hev wateyê temam dikin û tehlîl dibin, dorpêç bike.

Di vê tezê de bê guman hemû aliyên çîrokan neketine bin rêbaza lêkolînê, bêtî ku em zêde dakevin **binyata kûr** a metnê me bi pirahî hewl daye ku çîrokan di **binyata serkî** ya metnê de tehlîl bikin. Gava ku me ev çîrok tehlîl kirin, me ne bi tevahiya têgîn û şablonên mantiqî yên navbera hêmanên çîrokê ku hûnarîna vê rêbazê pêşniyaz dike lê li gorî beşeke vê rêbazê tehlîl pêk anî. Hêmaneke girîng ya hîlbijartina van çîrokan jî binyata wan a ku li gorî rê û rêzikên vê rêbazê bû ku di vê çarçoveyê de me destnîşan kir ku çîrokên me ji du hêmanên sereke (kirde û bireser) yê *modela kiryarvanan* zêdetir hêman dihewandin. Ji vî alî ve metnek/derbirîneke ji bo were tehlîl kirin herî kêr divê xwedî du kiryanan be (kirde û bireser) ku di vê peywendê de çîrokên me xwedî şeş kiryanan (şandyar, kirde, hilgir, bireser, alîkar, astenker) in. Di her sê çîrokan de jî me hebûna van kiryanan destnîşan kir. Di çîroka bi navê “Alpiz û Zemmê” de bûyer li derdora van her şeş kiryanan diqewimîn. Çîrokê hê di destpêka xwe de me bi hebûna van kiryanan dihisîne ku têkiliya di navbera van kiryanan de binyata çîrokê pêk tîne. Heman rewş di çîroka bi navê “Kurê Pîra Cina” de jî li dar e. Girêdanên mantiqî û sentaksî ya navbera hêmanên çîrokê ev her şeş kiryar bi teqezî di çîrokê de daye nîşandan. Lê ev rewş ji bo destpêka çîroka bi navê “Teyrê Sînbeg/Çil Bira” ne pêkan e. Ev çîroka ku ji rêzeçîrokan û katmanên cuda pêk tê di destpêkê de van şeş kiryanan nahewîne lê di beşên din yê çîrokê de em rastî van her şeş kiryanan tên.

Çîrokên ku me hîlbijartine ne bi awayekî yekser xwedî şîretan in ku fikareke wan a bi vî awayî jî tune ye. Ji ber vê sedemê lêgerîna wateyê di çîrokê de li gor gerdûna çîrokê, têkiliya karakteran û têgînên dijber û wateyan derdixe holê. Li gor normên civakî encamên ku me bi dest xistine ev in:

1. Nirxên wek fêlebazî, derewkarî, sixtekarî, dizekî, tirsonekî di çîroka “Alpiz û Zemmê” de taybetiyên sereke yê kirdeyê çîrokê ne ku bi vî şiklê xwe çîrok ji şîretê

dûr e. Her wiha tevî van hemû taybetiyên neyînî yên lehengê çîrokê, leheng bi ser dikeve û digihêje armanca xwe jî û li hember van neyîniyên xwe nayê rexnekirin.

2. Hezkirin, cudahî û dijwarî ku têgînên sereke yê çîroka “Kurê Pîra Cina” ne di çîrokê de li ser hestên wek “hezkirinê” berxwedanek heye û cudahiya navbera lehengan nabe sedema “zewaca” wan. Bi vî aliyê xwe ev çîrok xwedî hestên baş e.
3. Çîroka “Teyrê Sînbeg/Çil Bira” li gor van her du çîrokên ku me li jor bahs kiribû bêtir xwedî vegotîneke tevlihev û bûyerên kompleks e. Di çîrokê de nirxa “mêrxasî” ku bi taybetî wek ya kirdeyê sereke tê diyarkirin nirxa herî xurt e di çîrokê de. Ji aliyekî din ve di çîrokê de karakterên ku xwedî taybetiyên xerab (bi yarbûnî, sêhrebazî, xwepereştî) in di dawîya çîrokê de tîr cezakirin ku ev rewş ji aliyê guhdervan/xwîner ve peyameke eşkere dide. Lê em nikarin bibêjin ku ev peyameke salt e ku wê were fahmkirin.

Ji bo çarçoveya gelemperî ya çîrokan encamên ku me bi dest xistine ev in:

1. Di her sê çîrokan de jî nebûna bireserê bernameya derbirîne dide dest pê kirin.
2. Di her sê çîrokan de kiyar beriya ku kiryarên xwe yên performansê pêk bînin xwedî beşên amadehiyê ne. Bi gotîneke din leheng ji bo kiryara dawî ya çîrokê, qabîliyetên serkeftinê bi dest dixin û bi vî awayî biser dikevin. Ev qabîliyet carinan girêdayî pêşketina fikrî ya lehengan e, carina jî hebûna kirdeyekê an jî kiryareke din vê dide kirin.
3. Di her sê çîrokan de jî kirde ji aliyê alîkarên yekser û ne yekser ve alîkariyan dibînin û ji aliyên astengêrên yekser û neyekser ve jî tîr astengkirin.
4. Di çîroka yekem û duyem de fonksiyona şandiyar ji aliyê kirdeyekê ve tê kirin û bernameya derbirîne bi rêdana şandiyar pêk tê, yanî eksena xwestinê di navbera şandiyar û kirdeyê de li ser bireserê pêk tê. Lê belê di çîroka sêyem de şandiyarê ku bernameya derbirîne dide destpêkirin ne şandiyarekî derve ye, motîvasyona navxweyî ye.
5. Di çîroka yekem de biresera ku dihat xwestin tiştên wek zîv û zêr bûn ku di dinyaya maddî de xwedî nirx in ev. Lê belê di çîroka duyem û sêyem de ev nirx ne tişteki maddî bûn beravajî vê nirxên manewî yên wek xweşikahî, zewac û wd. bûn.

Di çîrokê de ji bo em bigihêjin wateyê û hilberîna wê em li ser hêmanên herî fonksiyonel û cuda rawestiyan û ji bo ku em vê encamê bi dest bixin jî me, ew veqetandin beşan ku bi vî awayî bernameya derbirîne derkete holê. Di çîroka yekem de rewşa ku di serê

derbirînê de jêkvebûyî bû ($K \cup B$), di dawiya çîrokê de guherî û derbasî rewşa pêkvebûyî ($K \cap B$) bû. Di çîroka duyem de jî heman rewş li dar e. Lê di çîroka duyem de “kirdeya ku dixwaze” di serê destpêkê de û di dawiya destpêkê de ne heman kirde ne. Di serê derbirînê de biresera ku bibû mijara vê “xwestinê” di nîvê çîrokê de dibe “kirdeya ku dixwaze” ku kirde jî dibe “biresera ku tê xwestin”. Di vê peywendê de rewşa wan a jêkvebûnê ($K \cup B$) û pêkvebûnê ($K \cap B$) jî vediguhere. Di çîroka sêyem de jî heman rewş li dar e. Kirdeya ku bernameya xwe ya derbirînê ava dike, rewşa wê ya serê çîrokê û dawiya çîrokê ji hêla jêkvebûyî û pêkvebûyî ve diguhere.

ÇAVKANÎ

Alan, R. (2015). Destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern. Stenbol: Weşanên Peywend.

Aydogan, Î. S. (2014). Guman II. Stenbol: Weşanxaneyê Rûpelê.

Aydoğdu, Y. (2015). Modern Zaza Hikayeciliği. Bingöl Üniversitesi. Teza Çapnebûyî ya Masterê.

Aykanat, T. (2013). Bir Şiiri Göstergebilimsel Açısından Okumak Ya Da Şeyhî'nin Bir Gazelinin Semiyotik Analizi. Uluslararası Sosyal Bilimler Dergisi. Cilt 6, Hej. 3.

Batu, E. (2018). Göstergebilimsel Bir Serüven: Üç Öyküsüyle Türkçe'de Oscar Wilde. Yıldız Teknik Üniversitesi, Teza Çapnebûyî ya Doktorayê.

Boratav, P. N. (2014). Halk Hikayeleri ve Hikayeciliği. Ankara: Tarih Vakfı Yayınları.

Çevirme, H. (1999). Murathan Mungan'ın Hikayelerinin Kültür Yapılarının Değerlendirmesi ve Greimas Göstergebilim Metoduna Göre Yapısal Özelliklerini İncelenmesi. Atatürk Üniversitesi, Teza Çapnebûyî ya Doktorayê.

Dervişcemaloğlu, B. (2005). Temel Göstergebilim (Semiyotik) Kavramları Üzerine Bir İnceleme. Ege Üniversitesi, Teza Çapnebûyî ya Masterê.

Dursun, A. (2017). Sözlü Kültürün Yazılı Kültüre Etkisi: "Toprak"ı Ekmek. Sosyal Bilimler Dergisi. Hej. 12.

Erkeman Akerson, F. (2019). Göstergebilime Giriş. İstanbul: Bilgi Kültür Sanat Yayın Dağıtım.

Elyıldırım, S. (2020). Göstergebilim Kuramları. Ankara: Bilgin Kültür Sanat Yayınları.

Genette, G. (2020). Anlatımın Söylemi. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Goody, J. (2009). Sözlü Kültür. Milli Folklor Dergisi. Hej. 83.

Gökalp-Alpaslan, G. G. (1998). "Göstergebilim Açısından Bir Şiir Değerlendirmesi: 'Bir Sözlükte Kitap Adları' ", Ankara: Prof. Dr. Dursun Yıldırım Armağanı Yayınevi.

- Gümüş, İ. (2015): Türk Masallarının Max Luthi Yaklaşımlarıyla Çözümlemesi. Gaziantep Üniversitesi, Teza Çapnebûyî ya Doktorayê.
- Günay, D. (2020). 21. Yüzyılda Göstergebilim. İstanbul: Papatya Yayıncılık Eğitim
- Güneş, Ömer, Ş. İ. (2019). Antolojiya Dengbêjan II. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Gürer, Z. (2014). Dengbêjî Di Peywenda Patronajê De. Zaningeha Mardîn Artukluyê. Teza Çapnebûyî ya Masterê.
- Güzel, E. (2012). Göstergebilimsel Bir Okuma Denemesi: Solgun Bir Gül Dokununca. İdil Dergisi. Hej. 1.
- J. Ong, W. (2020). Sözlü ve Yazılı Kültür Sözü'nün Teknolojileşmesi. Wer. Sema Postacıoğlu. İstanbul: Metis Yayınları.
- Kanca, E. (2020). Sözlü Kültür ve Yazı Takıntısı. Journal of Awareness. Hej. 4.
- Kıran, Z. A. (2007). Yazınsal Okuma Süreçleri. Ankara: Seçkin Yayıncılık.
- Lescot, R. (2013). Memê Alan. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Oğuz, Ekici, M. Ö., M. (2006). Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1. Ankara: Gelenksel Yayınları.
- Oğuz, Gürçayır Teke, M. Ö., S. (2019). Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 2. Ankara: Gelenksel Yayınları.
- Oğuz, M. Ö. (2013). Türkiye'de Folklorun İlk Makaleleri. Milli Folklor Dergisi, Hej. 99.
- Pertev, R. (2015). Edebiyata Kurdî ya Gelêrî Dîrok - Teorî - Rêbaz - Lîteratur - Berawirdî - 1. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Pertev, R. (2016). Xebateke Girîng di Dîroka Folklorê Kurdî de: Kemal Fewzî û Berhevkarîya Çîrokên Kurdî. Zaningeha Bîngolê, Kovara Enstîtuya Zimanên Zindî, Hej. 3.
- Polat, Ç. (1999). Başlangıçtan Günümüze Ülkemizde Derleme Çalışmaları. Ankara Hacettepe Üniversitesi. Teza Çapnebûyî ya Masterê.
- Rifat, M. (2009). *Göstergebilimin ABC'si*. İstanbul: Say Yayınları.

- Rifat, M. (2018a). Açıklamalı Göstergebilim Sözlüğü. İstanbul: Alfa Sözlük.
- Rifat, M. (2018b). Homo Semioticus ve Genel Göstergebilim Sorunları. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Rifat, M. (2020a). XX. Yüzyılda Dilbilim ve Göstergebilim Kuramları - 1. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Rifat, M. (2020b). XX. Yüzyılda Dilbilim ve Göstergebilim Kuramları - 2. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Sanders, B. (2016). Öküzün A'sı. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Subaşı, K. (2019). Tıpolojîya Vegêrana Çîrvanokên Kurdî/Kurmancî. Dicle Üniversitesi, Teza Çapnebûyî ya Doktorayê.
- Sussure, F. (1998). Genel Dilbilim Dersleri (Course de Linguistique Générale), Wer. Berke Vardar, İstanbul: Multilingual Yayınları.
- Tanrikulu, V. (2017). Kürtçe Masallar ile Grimm Kardeşler Masallarının Motifler Açısından Karşılaştırılması. Dicle Üniversitesi, Teza Çapnebûyî ya Masterê.
- Tekin, Ç. (2012). Di Kilamên Evînî yên Dengbêjan de Temaya Jinê. (Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî). Zanîngeha Mardîn Artukluyê/ Enstitûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn.
- Uçan, H. (2016a). Yazınsal Eleştiri ve Göstergebilim. İstanbul. İz Yayıncılık.
- Uçan, H. (2016b). Dilbilim, Göstergebilim ve Edebiyat Eğitimi. İstanbul: İz Yayıncılık.
- Uzdu Yıldız, F. (2011). Göstergebilim Kiplikleri Açısından Anlatı Kişilerinin İncelenmesi. Ege Üniversitesi, Teza Çapnebûyî ya Doktorayê.
- Yıldırım, Pertev, K., R. (2013). Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî, İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
- Yörür, F. (2013). Sözlü Kültür ve Sözden Yazıya Geçen İnsan ve Tarih. History of Communication.
- Yücel, T. (2020). Yapısalcılık. İstanbul: Can Yayınları.

PÊVEK

Çîroka Yekem: Alpiz Zemmê

Beşa Yekem:

Hebû kes ji Xwedê mestir tine bû. Go hebû carekê Alpiz û Zemmê. Go her du tenê bûn zarokê wan tine bûn. Go rokê Apiz derkete derve ku wa reş e ku ti tiliya di çavê hev rakî kes kesî nabîne. Go hat go:

- Zemmê Zemmê go wellehî îşev şeva diziyê ye.

Go:

- Heydê here diziyê heydê.

Go:

- Zemmê ez diwêrim herim diziyê, ti dinêrî dengê wîrqîniya rêvi tê min ez ji tirsarê dimirim, ma ez karim herim diziyê.

Go:

- Ma te yê negotana wellehî tê herî.

Beşa Duyem:

Go Alpiz derkete derve, go newêribû go çû kete koxa mirîşka, nav mirîşka. Go bû tûxe tûxê mirîşka, hêk di bin wan de hene. Go welle hebikî ma, go Zemmê derkete derve go:

- Lawo lawo ew Alpizê reben û hêsîr, min wî derxiste derve de ka bi ku de çû, gune bû.

Go nert carekê wan Alpiz di koxa mirîşka de dibê:

- Zemmê nekeve wê xemê, welle va e di koxa mirîşka de me çiyê min germ e.

Go:

- Ti di wir de yî, heyê derê derve heydê.

Go dar bi koxê de bir Alpizê reben derxist derve, go hinek hêk mêk xiste tûrikê xwe go:

- Ka hinek arvan jî bide min.

Go hinek arvan jî dayê, xiste tûrikê xwe û çû.

Beşa Sêyem:

Go bişev e, wê rebeno ça bike. Go da riya Hola û çû û çû û çû. Go nert carekê dû ji derekê, ji şikevtekê çû, go xwe lê girt, go çû nert wa heft hût tê de ne. Go hût çav lê kirin awha kirin, go:

- Êvar bi xêr (filan bêvan), wer rûnê, ti ji kurî ti kî yî (filan bêvan).

Go:

- Ez ez im, ê weke min tinin li dinyayê.

Go hêkek di destê wî de bû, go:

- Ev ne kevir e?

Go:

- Belê kevir e.

Go di nav destê xwe de wiha kir û kir av, go:

- Ê me ez kevira dikim av.

Go vana rahîştine kevira hûta wiha kirin wê çawa kevir bi av bin. Go:

- Ez karim bikme arvan jî kevira.

Go destê xwe bi hêdika xiste tûrikê xwe go arvan derxit, go:

- Ez karim kevira bi arvan jî kim.

Go vana rebena kir nekirin hût bûn, go jixwe jê navqetandî bûn.

Beşa Çarem:

Go wele serê sibê, go:

- Birê min tê taştêya me û şîva me çêkî em ê herine seydê.

Go vana çûne seydê, go Alpiz jî çû rahîşte kûnekî wan, go:

- Kûnê ava me ji me re bînî û şîva me çêkî û wekî din hew.

Go rahîşte kûn. go bi zor kûn birne ber çem, vala bi zor bi ber çem. go çû nikaribû û go zanibû vana li diyar li qarşiya wî ne, go pifkiriye, pifkiriye, pifkiriye mezin kir û go anî ser devê çem û devê xwe da berê go pif û go tamamê pifa wî jê hat o vala bû o go li wê derê hîşt û hat. Nikaribû avê têxê, bîne. Go hat go:

- Birê min ka te av aniyê ji me re?

Go:

- Mala we xera nebe bi ser we de, wî kûnê biçûk. Min vexwar têra min nekir min jî li wir hîşt.

Helbûkî nikaribû bîne. Go ji birê xwe yî biçûk re:

- Ti herê lo, here dije av bike bîne.

Go çû av kirin anîn.

Beşa Pêncem:

Go bû sibê go:

- Birê min em ê herin bera birê me yî biçûk şîva me çêke, ti jî were li binya newalê bisekine, çi tiştê ku me bi ser te de şand tê bigirî; gur bin, hirç bin, rêvî bin.

Go:

- Temam.

Go vîya li newalê sekinî go nert carekê gur hatin û hirç hatin û şêr hatin go karibû! Go hema hilkişiya ser serê dera. Go ji tirsê re Alpiz bi xwe de derrî. Go bi xwe derrî, go nert carekê qijakê hat ji şipare li guyê danî li çîmikê wî, go wiha destê xwe avîte qijakê, qijak girt û go wana jî tev tebarete derbas bûn hat go:

- Ka birê min te çi girtiye?

Go:

- Mala we bivirte bi ser we û virê we de. Min tiştekek negirtiyê, a vêya di ber perê ezman re derbas bûye min wê girtiye û wekî dinê min tiştekek nedîtiye.

Go vana li hev nertin go:

- Wellehî rast e, ma kes kare qijakê bigire wî çûye qijak girtiye. yawo qey ev çawa çêbû wele ez im me bi vir de rast kirin.

Beşa Şeşem:

Go hatin malê wî anîn. Hema dibê Xwedao em jê xelas bibin ka wê me bikuje bê wê çi bike. Helbikî Alpiz tirsonekekî derê ha ye. Ê go:

- Birê tu naçî malê, ti adiz nebûyî?

Sê çar rojan li wir mabû, go:

- Belê ez ê herim.
- Ê va heft heşt elb zêrê me hene, em ê li hev parê kin ti jî birakî me.

Go parê kirin. Go elbek para Alpiz ket. Ê go:

- Zê ka ê çawa!

Go newêre bişev here jî. Go wele danî ser pişte birê xwe yî piçûk go:

- Here, bera birê me ji te re bîne malê û bera vegere.

Li ser piştê wî kir û ew jî li ser piştê siwar bû, go:

- Heydê

Mala min ev e, ev e, go wele anî malê. Go hût betilî bû di bin de. Go gava rûnişt, go ji hilma devê hût go Alpiz li ber qaça ket. Go:

- Erre birê min çima tu çûyî.

Go:

- Wele şûrekî, kalanekî bavê min di vir de, di ber qaça de hebû. Min go ku ez daxim ez ê pê te bikûjim.

O go hût hema go xir, go çima benikê çaroxa wî di derî eliqî o gor xir xir derî li piştâ xwe bir heya ku çû şikevtê. Go vana ji tirsâ re rabûn ser xwe. Go:

- Ev çibû, te çi kir.

Go:

- Kirro ez bi zor ji nav lepê wî filitîm. Welehînê ez çûm go çû ber qaça digo şûrkî bavê min heye zê te pê bikujim. Ji tirsâ re benkê çaroxa min di derî eliqî bi xwedê derî jî li pey min hat.

Got:

- Beraqetê bavo, va em ji xwer jê xelas bûn wele wê me tev bikûştâ.

Çîroka Duyem: Kurê Pîra Cina

Beşa Yekem:

Go kal û pîrek hebû, go rebeno her ro ji xwe re diçûne ber dewara, go diçûne ber dewara. Go nert rokê yek hat sêvek da kalo. Go:

- Ji te tê nêvî bixwî wê pîreka te jî nêvî bixwî.

Go wela vana xwarin go bû serê sibê kalo ji ber heywanan hat. Go jinikê got:

- Wele kurikek ji me re çêbûye û to wa xeber dide.

Go:

- Wîî go xeber dide çawa?

- Wele wa xeber dide.

Go bavê wî hate malê go:

-Yabo!

Go:

- Hê?

- Ti here qîza mala Nûriyê Arif ji mir bixwaze.

Go:

- Ti ripka serê wî yî bigû. Wê kî qîza mala Nûriyê Arif bi te de.

Go:

- Ti here bixwaze.

Go wî ya ji ayb kir rebeno. Go çû diwana mala Nûriyê Arif, li binya şekala rûnişt. Go:

- Ti bi xêr hatî kalo (filan bêvan).

Rûyê wî negirt bêje. A dine rojê hat, go:

- Ka te got?

Go:

- E zê çî bêjim, ti do çêbûyî, ti dibê jinê ji min re bixwazin.

Go:

- Yabo here bixwaze her bixwaze.

A dine rojê çû dîsa nago, a dine rojê Nûriyê Arif jê re go:

- Ti hatî çê, ev îro sê rojê te.

Go:

- Welehî kurikekî me do çêbûye, dibê tê herî qîza mala Nûriyê Arif bixwazî.

Go:

- Naxwe wilo!

Go:

- Erê.

Go:

- Here tê çil qamtirî tevî barê wan û dîkekî zêrînî li ser piştê heywanê tê serê sibê bi nimaja sibê re li devê deriyê me hazir bin, gereke dîk azan bide ez ê qîza xwe bid me te.

Go yanî henekê xwe pê kir.

Beşa Duyem:

Go vîya jî hat malê, go:

- Serbiçilo go wa heqa pere ji min xwestine û heqa qamtir de ka zê tê?

Go:

- Wî ma ka çi dibe, li ba min ne tişte e jî.

Go wele bi serê bava kim, go:

- Here, here serê neqeba berehê, bêje wa nizam çîko; çil qamtirî tevî barê wan dîkekî zêrînî jî li serê, sibê li devê deriyê me ez dixwazim.

Go viya jî çû wilo. Go serê sibê rabû wextê li mêja sibê birao wa çil heb qamtir tevî barê wan dîkekî zêrînî li ser e. O go viya rahîşte serê qamtirê û bir deriyê Nûriyê Arif. Go Nûriyê Arif serê sibê rabû ku derê destmêje ku birao wa dora wan çil heb mehin e tevî barê wan dîkekî zêrînî dibê qirrr. Go:

- Wax wax go welehîne ev bar kalo anîn.

Go vana jî rabûn bûk siwar kirin o cilê bûkê jî tede ne xemla wê lê kirin û bûk siwar kirin ji kurê pîrê re anîn. Go xelkê jî go heyra me tê kurê pîrê nedîtine ev çawa çêbû.

Beşa Sêyem

Go anî go nert wa qumatkek li wir e. Bûk anîne hindir. Go hema yekê jî rahîşte wê qûmatkê xiste pacê. Go keçik jî bû êvar ji balê çûn ê zave were. Go keçikê go:

- Zave çi ye ka zave!

Go nert carekê xelkê derî li wan girt, go nert carekê qumatek go teq ji pacê ket bû xortekî ku ti newêrî lê binêrî. Go jinikê wiha lê nert dilê jinikê bi heft dila ketiyê. Go:

- Hîmet!

Go:

- Hê?

Go:

- Binêre ti qiza mala Nûriyê Arif î û ti bêyî qahwê naqedînî, ti qahwê bixwî binêre

(go rok du sê, go êvarî jê re go) go:

-Binêre gava ku tu qahwê bixwî, qehwa te bifûre ez û te hew ji hev re dibin. Gereke qehwa te nefûre.

Go:

- Wele ez nahêlim qehwa min bifûre.

Beşa Çarem:

Go rokê didiwa sêya. hat henek bi mêrên xwe kir go qehwê go firrr fûriya. Go nert carekê mêrê wê bû teyrikekî, kebokekê û di pacê re go gûr û derket. Hey wax hey wax. vir de diçe kebokê dibine, wirde diçe, pey keboka de diçe. Go:

- Îja em ça bikin. min çi xwelî li serê xwe kir.

Go çû, mêr çû, go ew jî ma ma.

Beşa Pêncem:

Go çû xaniyek, wê jinikê ha, li serê cada golê ava kir. Go kîja însanê ku di berê çû go:

- Heta ku win neyên çirokekê, serpêhatiyekê ji min re nebêjin ez nahêlim win herin.

Go wele rokê ma, salekê, di sala, bê çi qasî ma. Go rokê gavanê gund û kurikekî awha piçûçik pê re ye. Go:

- Wer xalo win ê îşev li mala me şîvê bixwin.

Go wele hat. Go:

- Vêga xalê sofî we ti carî tiştekek neditiye. win li çola digerin, li çepela digerin.

Go nert carekê wa kurikek li derê ha, go:

- Wele min îro tiştekek dî.

Go:

- Te çi dî?

Go:

- Wele hema mi dî şerpikek ji newalekê, ji qûlekê hat, go xir xir kete sarincê dije av bû û dîsa go xir xir ez jî bi peyde çûm, min dî kete şikevtekê. o min wilo dît.

Go:

- Temam. Ez ê sibê bi te re werim.

Beşa Şeşem:

Go wele keçik pê re çû. Go:

- Ka li kîja navê te şerpik dît.

Go:

- A li vê navê ez sekinîbûm. Min dît şerpik hat.

Go hebikekî ma go net şerpik go xir xir hat kete sarincê. Dije av bû û keçikê da pey. Go çû kete weke şikevtekê. Go keçik kete şikevtê, go bi paşiya şikevtê ve çû çû, nert ku wa sê heb text in. Go ma ma têde ku wa diya wan heye. Mêrê wê û yekî din heye. Go hatin herkê li ser textê xwe rûniştin. Go pîrê şîva wan da wan. Go viya seh kir ku pêjina jina wî li hindir tê, go sê çar kevçî li birinca xwe xistin, go teyfikek bi hêdîka di bin xwe re xist bin textê wî. Go zanibû ew textê wî ye, bi îdara Xwedê ketibû bin textê wî. Go jinikê go; ka ez bi kevçiyê mêrê xwe bixwim wele min hewqa bêriya wî kiriyê. Min çi anî serê xwe. Go ma. Go diya wî go:

- Wele weke hawê pêjina tişteki, bêhna tişteki ji mala me tê.

Go:

- De yadê wê bêhna çi were. De razên ji xwe re.

Go pîrê raza o hîne ew şiyar bû. Go mêrik rahîşte saz û lê xist. lê xist û lê xist û klam gotin. Go nert carekê pîrê got:

- Lawo rûnê ew ins bû em cin in. Em ji hev re nabin. Min ji ter go em ji hev re nabin, te go na ez ê qîza Nûriyê Arif bînim. Lawo nedibû ji me re, razê razê.

Go wele wer hasilî diya wî û birê wî razan o go ji jinêkê re go:

- Heydê em herin.

Derketin.

Beşa Heftan:

Go derketin, hatin qistekê bi rê hatin. Go nert carekê:

- Wele wa diya min hat, wa babîsok hat, diya min e.

Go wele jina xwe kire parêz o xwe jî kire nahtorvanî. Go hat va dûmana diya, go:

- Nahtorvanî te ti pîrek û zilam bi vir ve nedîtine?

Go:

- Wele ana pîrekek û zilamek ha bi wî alî de çûn.

Go berê pîrê dana wî alî go dîsa go:

- Heydê.

Go hatin hatin, go nert dîsa pîrê hat, dîsa dûmana wê hat. Go jina xwe kire aş, xwe jî kire qiraş, sêhrê li xwe dixwîne. Go wele hat. Go:

- Qiraş qiraş te ti pîrek û zilam li van deran nedîtine?

Go:

- Wele ana pîrek û zilamek li vir bûn bi derê ha de çûn.

Go dîsa dûmana pîrê bi wir de çû. Go hat reviya reviya, Go nert dîsa wa pîrê hat. Go:

- Wele xelasiya me ji ber diya min tineye.

Go jina xwe kire darekê van darên bilind ên hewr, xwe kire mar o go xwe li darê pêça pêça pêça heya serî, go serê xwe li ser danî. Go pîrê hat rahişte tîr û kevanê xwe li dora darê çû û hat, vir de dike berdiyê, ji vir de dike berdiyê, dike nake keysê lê nêne. Mar xwe lê pêçaye heya ku çûye ser serê wê. Ê go pîrê go:

- Zê ça bikim ma, serê te bixwe bi ser jinika ins de.

Go bi xwedê pîrê veregeriya. Go wele anî, jina xwe anî. çîroka min ji te re xweş.

Çîroka Sêyem: Teyrê Sînbeg/ Çîroka Çil Bira

Beşa Yekem:

Go padîşak hebû, çil kurê wî hebû. Go herro diçûne seydê, karê wan seyd û nêçîr bû. Go rokê çûn li hevdû rûniştin. Go:

- Lawo wele va birê me yê piçûk simbêl ba dan ma wê kengî bavê me ji me re jinê bîne? Heydê mê herne malê. Mê dawa jinê ji bavê xwe bikin.

Go hatine malê, go bavê wan go:

- Xêra lawo çima win hatin?

Go:

- Yabo wele va birê me yê piçûk simbêl ba dan, ma tê kengî ji me re jinê bînî? Wele em ji bo wilo hatine. Me gotiye mê herin dawa jinê ji bavê xwe bikin.

Go:

- Wele lawo ez jî çavê xwe digerînim nagerînim, çil qîzê ji dê û bavkî ez ê dibêmin belkî ez bibînim ji we re bînim, hê min nedîtiye.

Ê go:

- Destê me bide me.

Ê go:

- Destê we ji we re herin.

Go çûn, go:

- Binêre lawo, mêrgê ku şop lê neketibin win li wan mêrgan nesekinin, herin.

Beşa Duyem:

Go wele çûn qonaxek hılanîn yek danîn. Go rokê çûne mêrgekê, go ti dibê qey çûk di ser re neçûye. Mêrgeke giyayê wê li noqê û pir û xweş. Go:

- Em ê li vir rûnên.

Go navê birayê wan î piçûk Mîrze Miheme bû, go:

- Lawo me te dî, bavê me ji mer go mêrga ku şop lê neket li wê mêrgê nesekine.

Go:

-Oooo de o bavê te. Ma xwene ê ku were ji me pirtir e yan ji me mêtir e!

Go kir nekir bi a wî nekirin. Go rûniştin çadirê xwe kutan her kê di bin çadira xwe de, hespê xwe jî her kê bi derkê girêdan û rûniştin şîva xwe xwarin. Go wî birê wan Mîrze Miheme kir nekir xewa wî nehat. Go helbet talokak tê hebû loma bavê me ji mer go. Go çû rahîşte şûr û mertalê xwe dûrî çadira li cîkî rûnişt ji xwe re, ma ma kete hikmê nivê şevê, go carekê tişteke çavê wî weke alatrîka, go xijj û kete nav çadira, çû ber vê çadirê, çû ber wê çadirê, çûr ber wî hespê çû ber temama û derket û çû da newalekê û çû. Go vîya hat ka bê ew çi kire ji wan ve, go hat nert carekê va temamê birê wî kevir in di bin çadiran de û çadir kevir û hespên wan tev kirine kevir. Go wax wax bi ser wan de giriya heya bû sibe.

Beşa Sêyem:

Serê sibê go hema berê xwe da wê newala ku çû, go pê de çû çû çû nert çarekê newaleke kûr e. Nert carekê berê wî kete şikevtekê. Nert carekê wa pîreke aha çîçikeke xwe avêtiye vi alî milê xwe yek avitiye ser vî milê xwe. Go welehî wê vêya min bikûje. Go hema çawa ji vir de çû devê xwe xiste çîçika wê. Go:

- Wî kurê min, yadê qurba wer ti jî kurê min. Wer çil kê m kurekî min ti li ser çilê temam.

Go wele rûnişt, go:

- Ma yadê ka ew birê min.
- Wa ew jî li ciyekê ne.

Go bû serê sibe go:

- Yadê zê herim seydê.

Go:

- De here lawo.

Go çû heta bû êvar bi ser birê xwe giriya û hate malê, go hate malê, go rokê didiwa, sêya, go:

- Yadê!

Go:

- Hê.

Go:

- Ez diçim newalekê, tiştin li wirane wek çadirana û weke... Wele yadê!

Go:

-Hê.

Go:

-Vêga îja ma ti dibê birê te hene, ka birê min li kur in?

Go:

- Va birê te li filan şikevtê ne, here ba wan. Ji te tizbika min bide wan tizbika min nîşana min e. Ti bidi wan zanin ti birê wan î, ti vêya nedî wê te bikujin.

Beşa Çaran:

Go wele viya çû çû, nert birao wa çil bira di şikevtakê de ne, çil hût, weke hûta ne. Go hema çawa çû, çavê wan fire bû, go hema wî tizbik bilind kir, go:

- Were birê were ti jî birê me yî wer, wer rûnê.

Go wele bû êvar şîva xwe xwarin. Go:

- Heydê mê herin.

Go:

- Winê herine ku?

Go:

-Wele mê herine ser bajarekî. Çil qîzê padîşe heye. Em dibê qey em ê herin wan ji xwe re bînin o her şev em diçin dora wan.

Go wele çûn, dora bajêr sûrî kiriye, vî alî wî alî. Go:

- Ka bise, bisekinin. Ka çil seke, pêncî seke.

Bê çî qas sekê hesin anîn. Go wele vîya destê xwe lêxist yek pêde hilkişiya serê, destê xwe li wiya xist heta ku hilkişiya ser serê sûriyê. Go çil kevirê bir ba xwe, go:

-Min her carê ku min kevirê avêt win ê yek ji we werine ba min.

Go:

-Temam.

Go kevirê avêt, go yek ji wana pêve hilkişiya çû balê, go hema serê wî jêkir, şûr pê re ye û gûhê wê jêkirin xistine berika xwe û gewdê wî avête wî alî. Go kevirê avêt wilo heta ku her çil hût jî serê wan jêkir, gûhê wan xistine berika xwe. Go rabû hat, ew tamam gûh xistine kêsekî û xistine bin kevirê û heta ba diya xwe ba pîrê.

Beşa Pêncan:

Go:

- Lawo birê te çawa bûn?

Go:

- Wele yadê baş bûn, sebra min bêyî te nehat. Min go zê herim ba diya xwe.

Go:

- Temam.

Go serê sibê çû seydê, go çû dîsa têr bi ser birê xwe de giriya û hat û keloşkek jî zefî kiribû ji xwe re keloşka xwe anî. Go:

- Yadê!

Go:

- Hê.

Go:

- Wele ez çûme çiyekî û bi Xwedê çima weke hespa bûn weke kevira bûn wana çi bûn?

Go:

- Lawo wana hinek bûn hatibûn ketine mêrga me. Min jî çû wan kire kevir û ez hatim.

Go:

- Ja bi çi rihet dibin?

Go:

- Bi tiştêkî rihet nabin, xweliya min dermanê wan e. Gava ku ez bişewtim, xweliya min di wan bidin derman e.

Go:

- Ma kî kare te bişewtêne.

Û go wele ma, keloşka xwe anî go:

- Ja ka yadê, zê çawa çêkim?

Go:

- Hema bavê firnê ji xwe re.

Go çû nêzîkî firnê go:

- Wele yadê e newêrim ka wer tê bavêjîyê.

Go gava ku pîrê hat go hema quna wê go piq, quna pîrê xiste firnê û devê wê da serê, go wele bû bûre bûre wê di ew ê de, go wele heta bû sibe. Serê sibê rabû wa şewitiye pîrê bûye komikek xwelî. Go rahîştîye bir xiste satilekê û hinek av bera ser da û bir di temamê çadira û hespa û di birê xwe giş da. Go nert carekê ba birayê xwe yê mezin kir, go:

- Birêm birêm, rabe.

Go:

- Arre birêm te me ji vê xewa şêrîn rakir, çiqaxweşbû xewa me.

Go di dilê xwe de go erê xew bû, win di xewê de bûn.

Beşa Şeşan:

Go wele rabûn, hatin, hatine bajêr, wa hînê, wa padîşe dibê:

- Hêêê bê kê wiha kiriye bira xwe derxe, xwe beyan bike, şanî min bide bê kê ye!

Go vîya çû go:

- Padîşê min ez im, min wilo kiriye, min serê wan teva jê kiriye.

Go ja nizam kurê çîko digo:

- Min kuştiye!

Wî digo:

Min kuştiye!

Go:

- Padîşê min go vir e.

Padîşe go:

- Herin nîşan e wa bêguh in herin guha bînin ez zanim ew e.

Go ja vîya çû go:

- Padîşê min, min wilo kiriye.

Go:

- Te çawa kiriye?

Go:

- Hal û meselê min wiha bû, nîşana min jî guh e, a va min guhê wan jêkirine.

Go:

- Temam te wilo kiriye, ti çi ji min bixwazî zê îro bid me te.

Go:

- Wele em çil bira ne, çil qîzê te heye, tê çil qîzê xwe bidî me.

Go:

- Temam, serçava. Qîza jî zê bid me te, oda jî zê bid me te, ti çi dixwazî.

Go wele lawo birin her yekê, qîza mezin danê ê mezin, a di da ê di a di da ê di a biçûk para wî ket. Go çûn êvarî tev çûn ba jinê xwe, go ev jî gava deriyê oda pîreka xwe vekir ku here odê go nert carekê hema hê nigkî wî li derve bû nîgek avîte hindirû go nert carekê bûkê jê re go:

- Here mesela Bajarê Mihemedê Kengê ti ji min re tînî bîne, ti naynî niha zê cêbeke giran bênim serê te.

Go:

- Mihemedê Bajarê Kengê li kur e keçê?

Go:

- Li kur be tê herî bînî, e nizamim.

Beşa Heftan:

Go viya derî girt û vegeriya çû çarçiyê. Ji yê ewil re, ji yê xwediyê dikanê re go:

- Vêga Bajarê Kengî li ku re lo?

Go:

- Weleh e nizamim.

Go çû ê di go li kure go nizam, go werhasilî pirsî pirsî heya ji bajêr derket. Qeyîkek hebû kete qeyîkê derbasî wî alî bû bê ew der kûr e. Dipirse dibê Bajarê Kengê li kur e, Mihemedê Bajarê Kengê? Dipirse dipirse dike nake, kes nizane.

Go rokê çû çihêkî çû gundekî go nert carekê wa pîreke belengaz e. Go:

- Pîrê!

Go:

- Hê.

Go:

- Pîrê ti mêvana nahewênî?

Go:

- Berxikê wê cihê te heye, cihê hespê te tineye.

Go zêrek da pîrê, go pîrê çav li zêr ket go ciyê hesp jî çêkir, ciyê wî jî çêkir. Go:

- Ez bi qurbana te me wer wer.

Go êvarî nert firek av anî, go:

- Pîrê ka firek av e tî me wele.

Go firek av anî da Mîrze Miheme. Go:

- Wele pîrê pirs a eyb tê tine weke bêhna pîs ji ava te tê.

Go:

- Yadê qurba ez ê ç a bikim weleh mîza min e, te go ka avê ava min tine bû.

Ê go:

- Ma çima ava te tine?

Go:

- Wele ziyak heye di devê kaniya me de ye ji heftê carekê wê qîzekê bibine jê re wê, wê qîzê bixwe wê hebki kêleka xwe berde, wê av bê xûş xûş xûş û were firaxa dije bike xelk heta heyftakî. Ja îro ti bûyî mêvanê min, min xwarin pêçêkir ava min nema.

Go:

-Ka li kûr e wiya?

Go:

- Li flan derê.

Go:

- Temam.

Go:

- Serê sibê zê herim. Ban mi ke wextê çûn.

Go wele serê sibê rabû ser xwe, go pîrê go:

- Lawo rabe rabe serê sibê ye, îro dora qîza padîşe ye, wê qîza padîşe bibine jê re.

Go wele çûn wa millet digirî li pey keçikê, keçik jî wa sêniyek birinc li serê ye, qazeke heşandî li ser birincê ye o go çûn peyde heya nêzîkî avê û go vana vejeriyan ku firaxê xwe bidine ber avê û go wele kurik çû. Mîrze Miheme çû go:

- Qîzê qîzê!

Go:

- Hê.

Go:

- Ka wê birincê û goşt bide min ez ê bixwim, ez ê xwe di bedêla te de bidime mar.

Go:

- Na keko ‘giriya’, ma çima tê xwe bidî? Xwedê ji min re xera kiriye, zê ma, a ji te re bixwe jî û ez ê herim.

Go wele li ber danî, Mîrze Mihemed têr birinca xwe û goştê xwe xwar û go:

- De heydê.

Go keçik da pişt xwe û şûrê xwe jî awha kir, da ber sînga xwe û go wele çû. Go kêfa mar hat mar, devê xwe ji hev kir wî go wa didine zê wa bixwim. Go hema gava devê xwe avête wan go awha şûr li qiraxa devê wî xist, go kir ku daqurtîne go wilo lê xist, kir ku daqurtîne, her carê ku dike daqurtîne şûr hewqasî diqelêşe go de de de de go hema nert carkê

bû di şeqiya mar. Û go hima wextî bajêr li ber av û xwînê biçûna. Go keçikê jî awha şaş ma, go hema destê xwe li nava wê avê û xwînê da û li nav piştê kurik xist û go baz da. Keçik çû ew jî hate mala pîrê xwe. go kê, go bajêr hat go lawo ev çi xwîn e lawo. Go keçik hat go:

- Ev çawa çêbû lawo?

Go:

-Yabo mizgîna min li we be yekî mar, ziya kuşt!

Go:

- Waa êê çawa kuşt in îsal heqas sal.

Û go wele ewya hat go:

- Min kuştiye!

Wiya hat go:

- Min kuştiye!

Keçikê go:

- Vira nekin, Ê ku kuştiye ez zanim, Ez wî nas dikim kî ye.

Flan bêvan geriyan negeriyên ew kesek xwe şanî wan nede go mal teftêş kirin çû çû çû go çû wî ya di mala pîrê de bû. Go:

- Were ne te ev mar kuştiye?

Go:

- Na yabo e çim e rebeno ku ez mar bikujim.

Go hat giha çav keçikê go:

- Ew e ew, ha minê (destê xwe jî li nav piştê wî xist ner ku wa ew kurik e, ê kuştiye).

Go:

- Lawo te ev mar kuştiye, ev ziya?

Go:

- Erê.

Go:

- Îro ti çi ji min dixwazî zê bidime te.

Go:

- Zê ji te çi, go wele tiştêkî jî ji te naxwazim ka heya ku rokê ji min re lazim be zê ji te bixwazim.

Go:

- Temam.

Beşa Heyştan:

Go dîsa hate mala pîrê. go:

- Pîrê!

Go:

- Lawo ma ti vî mêrxasê hana yî!

Go:

- Pîrê ma tu nizanî ma Bajartê Kengê li kur e?

Go:

- Yadê qurba wele ez nizanim Bajartê Kengê li kur e, lê teyrek heye, jêr dibê Teyrê Sînbeg awaa li newala bîrê ye. Her sal her sal wê çêçîkê xwe mezin bike. çêçîkê wî bigihîne firrê û ziyak diçe wan çêçîka dixwe û wilo dimîne. Ew jî sar dimîne. Her sal karê wî²⁷ ew e. De wekî ku wilo de here. Ti vî zîlamê jêhatî ku ti wî ziyayî bikujî belkî ew tiştêkî ji te re bibêje.

Go çû nert carekê, bi îdara xwedê, çîrok e, nert wa ziyak çawa bi darê ve hildikşe ku here çêçîka, go hema vî ya gihayê bi şûr go çêlp û çêlp û go mar kuşt û wî perçe perçe kir û

²⁷ Teyr di çîrokê de ji ber ku xwedî çêçîk e em dizanin ku mê ye, lê di vir de çîrokbêj wê bi kirdeya mêyê nişan daye ku ev xeletiyê vegotinê ye.

awha avête ber çêçik go bera çêçik bixwin. Go çêçika xwar û go hinek jî ma. Têr xwarin mar mezin bû. Go xwe li ber siyê rada go, di vê esnayê de di xew re diçe, go nert carekê Teyrê Sînbeg hat, haylo ku wa reşek li bin darê razaye. Go ‘welehîne hebe tine be vî ya çêçikê min dixwe hewakî tê dike. To wa li bin darê ye’. kes newêre. Û go hema hîmekî hew qas xist nav lekmê xwe ku were bi ser de berde. Go çêçika bi zaravê xwe go:

- Yadê yadê (bû şîre şîrê wan) were were! Kevir bavê ti ka were mê ji te re bêjin.

Go kevir evêt go hat go xirr xwe li ba çêçikê xwe danî. Go:

- Yadê ti were. E vî mêrkê bin ew ê, ziya kir were kir me bixwe û ew ya ew kuşt va me têr xwariya va me para te jî hîştiye.

Go:

- Bera?

Go:

- Wele.

Go wele rabû ma. Go ew jî di xew re çûye. Go bû tava nîro, go carekê Mîrze Mihemê ji xew rabû ku wa siya darê çûye derê hana û wa weke siya baskekî, teyr li serê ye. Go carekê serê xwe bilind kir ku wa baskekî ji çêçikê xwe re kiriye sî û yek jî Mîrze Miheme re kiriye sî. Wa li ser e. Go gava rabû ser xwe go teyr go xijj dakete ba lê. Go Xwedê teala ziman avête devê teyrê go:

- Ya filan kes ti çi kesekî? Îsal heft sal çêçikê min evî marî dixwarin. Ti îro çi ji min bixwazî zê bidme te bi emrê Xwedê.

Ê go:

- Wele ez dixwazim ti min bibî Bajarê Kengê.

Go:

- Bajarê Kengêêê! Wele lawo rokê ez biçûkbûn, ez bi diya xwe re û bavê xwe re em di ser bajarekîre hatin ji min re got ‘ev ya Bajarê Kengê ye’. Mi jî ji hînga pêve nedîtiye; lawo çiqas zahmet bû, lê min bi te re soz daye, ez ê te bibim. De here heft kûn av, heft dûvê berana, heft tenûr nan ji min re bîne û were.

Go vî ya hate ber padîşe, go:

- Padîşê min ez heft dûvê berana, heft tenûr nan û heft kûn av ji te dixwazim tê bidî min, werînî bin wê darê.

Go:

- Vana û ne tişkî din.

Go wele rabû heft dûvê beranê jêr zûka şejê kirin, heft tenûr nan lê xistin, li qamtira kirin anîn bin darê danîn.

Beşa Nehan:

Go:

- De were ser baskê min dêne û ti jî li ser siwarê û hema xwe bigire ti nekevî.

Go wele li ser danî û xwe bi baskê wî girt û gûr û firiya. Ya Allah û ya Xwedê. Go bilin bû, bilind bû, go:

- Çiqa dinya ji te ve xuya ye?

Go:

- Wele hîn dinya tevde ji min xuya ye.

Go:

- De ka tenûreke nan û dûvkî berana û kûnek av bavê bin zimanê min.

Go wele vîya dayê, dîsa bilin bû bilind bû, go dîsa:

- Dinya çiqas ji te ve xuya ye?

Go:

- Wele dinya baş xuya ye hê.

Go dîsa:

- Ka tenûrek nan û dûvkî berana.

Werhasilî ew jî dayê xwar. Dîsa bilin bû bilind bû, go:

- Wele yanî gund hew xuyanîne.

Go dîsa:

- Ka bide min.

Werhasilî dayê, heta ku bû taristan.

Go:

- Çiqa dinya ji te ve xuya ye?

Go:

- Z derkê nabênim, bûye taristan ji te pê ve z kesî nabênim.

Go:

- Dûvkî te yî berana maye, kûnek av wî jî bavêne bin zimanê min, tenûrek nan.

Go gava ku rahîşte dûvê beran go şemitî ji destê wî ket, go hema kêr da rahnê xwe, parîkî ah wilo ji rahnê xwe kir û xiste bin zimanê teyrê û go:

- Temam.

Go xirrr, go gava ku xwe danî xwe danî xwe danî, bi çi qasî bilin bûye, hewqasî xwe danî go carekê li ser benderê Bajarê Kengê ket. Go li ser bendera ket, go:

- De here. Ka birê here!

Go:

- De here xwedê ji te razî!

Go:

- Ka birê here li ba min.

Go gava birê çû kûliya. go:

- Çima ti dikûlî?

Go:

- Wele ji destê mi de dûv ket û mi jî hema kêr dayê ji rahnê xwe jêkir û mi xiste bin zimanê te min eyb kiriye ji te re bêjim.

Go

- Va min di bin zimanê xwe de ji ter hîştîye. Mi zanibû ne weke goştê dinê ye, zanibû ku şêrîne.

Go li ser danî bi emrê Xwedê rihet bû û go:

- De here.

Di pirtikê xwe jî danê, go:

- Gava ku li te bû pêsertengî, pirtikê min li hev xe, ez ê ji ter werim, Xwedê bê herê.

Beşan Dehan:

Go wele hat hat li ber dikanekê, nêzîkî dikanekê rûnişt ji xwer. Xerîbe kesî nas nake go ma ma heta bû êvar. Go nert carek go xwediyê dikanê go:

- Bira?

Go:

- Hê!

Go:

- Wele ti ne weke xelkê van darî yî, ti çi kesekî? Heyd kerem ke em herin malê.

Go:

- De heyê.

Go çûn mala wî, bû serê sibê go:

- De heydê em herin dikanê.

Go hatin dikanê go sazek ji xwer kerî, go li saz xist û hingî ku dîrokne xweş gotin. go tamamê bajêr lê civiya li dîrokê wî û sazê wî hingî ku xweş kir. Go bazar wê rojê ji dikana wî mêrikî bû. Go adine rojê tamamê dikana hatine girtin, hingî ku bazar ji dikana wî bû. Go ji

mişteriya re go werin tişna ji min re bînin. Go adine re rojê wilo, sê roja wilo ma. Go rokê Mihemedê Bajarê Kengê ji xulamê xwe go:

- Here defterekê o qelemekê ji min re bîne, (qelemekê û zilfekê, kaxeta pê dinvîsin).

Go evîka jî hat nert ku wa însan pir in û pir in go rê tine bû here go hema darek li wir bû hilkişiya ser serê darê. Nert birawoo ma wa mêrikek li sazekî dixê û dîrokna dibêje, kesî tiştê wilo li dinayê nedîtiye. Go ew jî li wir ma dîna ku weha kir wa haylo wa 'esir e, go: 'bi wê qura wê axe serê min jêke'. Go daket zûzûka kaxit kerî û çû. Go Mihemedê Bajarê Kengê go:

- Lawo ma şeveqe li kur û ana li kur? Ma ji kengî ve min te şandiye. ma çi ferman e?

Go:

- Bise axê min. Ba ti nizanî, yekî hatibû dîrokin digotin, sazekî dixist. temamê milete Bajarê Kengê lê civiya ye.

Go:

- Ê wele ku ez sibê herim ku ne wilo be zê serê te jêkim.

Go:

- Temam ku ne wilo be serê min jêke, e li ber serê xwe sekinî me.

Go wele bû serê sibê dîsekanê hat, bira gidî go jixwe rê tine ku axe here. go wiha çav li axe ketin hebekî qelaştin, qelaştin, Go çû li têhila Mîrze Miheme rûnişt. Go fahm kir ku axe ye go bêtir ê xweş gotin, kilamê xweş gotin, dîrokê xweş gotin. Go wele bû wextê êvar, go:

- Kerem ke ti îşev mêvanê min î.

Go xwediyê dikanê go:

- Na wele axe, xerîb e derkê nas nake.

Go:

- Na bise mêvanê min e.

Go wî jî dixwest jixwe ji bo mesela wî çûye. Go wele hat, êvarî hatine malê şîv çêkirin. Şîva wî li ber danî go:

- Kerem ke.

Go:

- Wele axê min şîva te naxwim.

Go:

- Hîîî xêr e çima ti naxwî?

Go:

- Ez hatime mesela te, bê çi mesela te heye. Ez hatime mesela te.

Go:

- Wele lawo ti ji ku bi mesela min zanî, mesela çê.

Ê go:

- Wele ev e, z hatime mesela te, ya tê bêjî ya jî şîva te naxwim.

Go:

- Yawo bixwe ez ê ji ter bêjim. Ez ê mesela xwe ji ter bêjim.

Go şîva xwe xwarin dane alî, kes li balê tine ye, go:

- Binêre ez gava mesela xwe ji te bêjim, ez ê serê te jêkim. Kesek bi mesela min nehisiya ye, min ji kesî re negotiye, ti kes pê nizane ev bê bi çi şiklî ti hatî bê ti ji kîja bajarî yî.

Go:

- Temam gava te tamam kir serê min jêke. go wele rabû.

Go:

- Ti zanî mesela min çi ye.

Go:

- Mesela te çi ye?

Binbeşên Çîrokê:²⁸

Beşa Yekem:²⁹

- Go rokê mala xalekî min hebû, go dûrî me bû. Niza ji vir û kîderê dûrî me bû. Rokê çûme mala xalê xwe wa mala xalê mi bi made ne û xeber nadin. Mi go xalo xêr e çima win wiho bi made ne?

Go:

- Lawo çi xêr û çi ha, wele jinxala te welidiye û keçikek jê re çêbûye û jinxala te miriye û ew keçik maye, ez nizam mê ça bikine jê ve.

Go:

- Temam ez ê keçikê ji xwer bibim, ez bibim wê xwedî bikim ji we re.

Go:

Wele ti bibî mala te ava.

Go mi rahîşte wê keçika çîlînî mi danî ber xwe qumateka wê mi anî malê. Go min anî malê mi' b şîrê xezala wê xwedî kir. Ez sedyvanî bûm, filan, mi ji vir de, wir de keçik bi şîr ve bû, keçik bû di salî, keçik bû sê salî, keçik bû deh salî, keçik mezin bû, bû qîz. Go rokê min wê li pişt xwe kir û çûme mala xalê xwe. Çûme mala xwalê xwe gava ez peya bûm, go şing û keçik li pey min peya bû. Em çûne jorê:

- Xêr e lawo filankeso (mezinbûye keçik).

Go mi go:

- Wele xalo keçika te ye.

Go:

- Vêga ew keçika çîlînî ye te aniye, vêga nemiriye?

²⁸ Di vê beşê de vegêran tevî hev dibin. Her sê bergeh jî di vê beşê de xuya dikin.

²⁹ Ev beş û yên şûndetir bi gelemperî ji aliyê vegêranekî ve tên gotin û tên veguhaztin lê ji bo ku axaftinên lehengan baş were fahmkirin me raste rast axaftina wan di van beşan de jî bi vê “-“ nîşanê diyarkirine nemaze jî axaftinê rû birû.

Go mi go:

Erê wele.

Go:

- Lawo ji bo Xwedê bera ji te re be li te xweş helal be. Her wê ji xwer bibe, bavê pişt xwe bibe.

Beşa Duyem:

Go wele ez hatim, qîza xalê xwe anî, mi li xwe mar kir. Rokê didiwa sisiya mehekê salêkê bê çi qasî li ba mi ma. Go di hespê mi hebûn. hespkî bahrînî bû yekî bayînî bû. Go rokê mi nert carekê hespê min î bahrînî xera dibe ê bayînî çêdibe. Go min sayisa re go:

- Lawo ev çi derdê hespa ye, qey win êmê vîya kêr didinê, vîya çêdibe vîya xera dibe.?

Go:

- Axe wele pîreka te niza çê

û devê xwe xuman û nego tiştêk. dehkê, heyştke di ez mam, dîsa mi nert hespê min pir xerabûye. Mi go:

- Lawo ev hespê bahrînî çêdibe ê bayînî xera dibe ev çi derdê we ye.

Go mi dî yekî go:

- Wele axê min sîcê pîreka te ye.

Go gava sîcê pîreka te ye. “Waa çi sîcê pîreka mi ye”. Go ew ro ez ranezam, mi tiliya xwe qelaşt û mi hinek xwê xistyê û min go ay serê min ay serê min têşe. Go:

- Çima serê te têşe, çi hewala te ye,

li ber min geriya filan bêvan. Go wele mi carekê xwe li xew danî, xirînî ji xwe anî û e şîyar im. Go mi dî rabû ser xwe û hêdîka derkete derve û mi dî hespê bahrînî derxist lê siwar bû, mi jî ê bayînî derxist. Go ê bayînî xurt bû, newêribû li wiya pir siwarê. Min reşê wê hinda nekir û wele e çûm çûm çûm, şûrê xwe bi xwe re biriyê. Go mi dî carekê çû weke devê şikevtekê min

jî hespê xweli vî alî girê da û e çûm çûme ser kûlekê mi nert carekê birawoo wa çil heb hût tède ye. Go ez di kûlekê de li wan dinerim. Go mi dî carekê go ê mezinê wan go:

-Wele min sond xwariye ez ê çil darî li texim. Ma ji bo çi ti heqa mayî?

Go mi dî go:

- Wele fikir nedikir kûçiko ranediza, heya ku raza bi Xwedê ez hatim.

Go mi di ê di jî hevalê wî go:

-Ma ti çil darî lêxî tê wê bikujî. Hema raje wê melkezê lêxe çil dar heye wê sonda te were cî.

Go mi dî melkez lê xist. Go, gotiye mi bi çavê serê xwe dî (de çîrok e, wî digo, xalê seîdo digo. zilamkî mezin bû, her ro dihate mala me çîrok digotin)³⁰ her çil çû ba pireka min û go mi dî derket. Derket ku here û go hema mi xwe avête nava wan go û go ya Allah, ya Xwedê, min serê ê mezin jêkir heta ku her çil, mi safî kir. Min kir ku e derêm go mi dî carekê yek wa bi qaça ve girêda ye. Go min dî go:

- Wa Mihemedê Bajarê Kengê ma tê min li vir bihêlî?

Go ez jî çûm mi wiha kir wa bi qaça ve. go hema min zincîrî wî qetandin, wilo ketiqê wî bê çi pê ve ye û go hema dîna ku min dî hinda bû. min wî nedî. Hema ku min çawa dest û nigî wî vekirin min hew wî dî û go ez hatim, ez hatim zû zû, ez hatim min hespa bayînî siwar bûm, li alî vîyalî ez fitilîm de de de hatim. Min teslîmî sayisa kir, min go ji wer girêdin û ez hilkişiyama jorê. Min xwe xiste nava ciyê xwe, hînê wilo mi dî carekê hat. Min xwe li xewê danî, gava xwe xiste nav ciya, mi go:

-Aree ti çiqas cemidî yî?

Go:

-Mi dî go wele çûme derve û ez hatim. yanî çûme tewaletê û ez hatim.

Başa Sêyem:

Go ma serê sibê. Ê de ez beecî me. Go serê sibê adine rojê, go mi xwe zûka li xew danî, go mi dî zûka çû. Çû go mi dî hat zûka vegeriya. Go mi dî vegeriya xwe xiste bin li hêfê,

³⁰ Nîşeya çîrokbêjan.

min zanibû tife tifê wê ye, min zanibû raneza. Bû serê sibê go mi dî cêriya xwe re go: Ka kûrsiyê me derxe ser serê qesrê îro. Go mi dî kûrsî derxistine ser serê qesrê rûnişt. E jî li pacê re lê dinêrim, oda di re ez lê dinêrim. Go mi dî carkê cêriyê jê re qehwe bir, çayê bir, xwarin bir, bê çi bir. Mi di hema nigê xwe li nigê cêriyê xist, cêrî go gûmm di qesrê werkir. Go mi dî derket go:

- Wîî cêriya me têwer bû,

û go li ser vê cêriyê giriya giriya giriya. Go mi jî gava serê wan jêkiribû, serê ê mezinê wan xistibû cihûrê hespê xwe min anî bû. Go mi dî carekê, go çûm li ber geriyam:

-Keçê hişê bes bigirî ez ana vêga ez ê cêriyeke ji vê cêriyê çêtir ji te re bînim. Ti bê kîjanê zê wê ji ter bînim. Bes bigirî, ma tê ma li ser vê cêriyê bigirî.

Go:

- Na,

û go giriya giriya. Min kir û nekir girî nesekinand. Go min go:

- Wa ka wî cihirû hespa bîne şebeşek tede mê ji xwe re bişkînin, tê bixwî.

Go wele mi dî carekê şebeş anî go:

-Minê mêvanê delal ez wilo ji te re dibêjim gava ku ez çîroka xwe tamam bikim ez ê serê te jêkim.

Min go:

- Temam, serê min jêke.

Go mi dî gava ku serî anî, vala kir, min go:

- A ti li ser viya digirî, ma ti li ser cêriyê digirî.

Go hema gava mi wilo go, go hema mi dî şivek ji ber xwe derxist go çelep di nava guhê mi de. Go mi dî go:

- Heydê kûçik

û go hema mi dî ez bûme kûçik. "Heydê derê derve" û go ez derketime derve.

Beşa Çaran:

Ez çûme vir de bêhna însana ji min tê, vir de diçim kûçik têne min. E ça bikim. Go wele e jî çûm çolê, ez reviyam e tev birîndar kirime, çûm derketim ji bajêr. E derketim, go mi nert, mi xwe da ber siya darekê. Go mi dî carekê, di heb zarok e, zilamek û pîrekek di ber mi re çûn go mi dî carkê jina wî jêr go:

- 'Filankeso!'

ji mêrê xwe re go:

- Ti vî kûçikî nas dikî?

Go mi dî mêrik jî go:

- Çi ehmeq e! Kûçik e îja kûçik nas bikim çawa!

Go mi dî go:

- Mêrê qehpa xwîya min e.

Go:

- Hîî îja mêrê xwiya te ye?

Go:

- Wele.

Go:

- Wer wer kûçiko were wer, were bide dû min.

Wilo go, go zarokê wan jî kêfa wan ji min re hat ez çûm kûçik mûçik têne min, go zaroka nehîşt kevir mevir dakirene kûçika. Go çûm go, ewt ewt hey têne min go ez ketime hewşê go zaroka wan derî girtin, ez di hewşê de mam hevza min ji kûçika bû. Go ti nabê e li wir ji bîr kirim. Go ma ma, go mi dî carekê zarokeke wan derket go:

- Aaa yadê! Ew kûçik va hîn li hewşa me ye a.

Go:

- Wîî lawo mi jir bîr kiriye, ka bankê bankê bira were.

Go mi dî go:

-Kûçî kûçî!

Go e bi pêlikê ve hilkişiyam çûme ba wan hindirû. Go mi dî go:

- Kûçîko, minê ti însan î ez ê ji te re bêjim ti fahm dikî. Binê ez ê çil şivî bi vê şivê li texim. Minê deng ji te were ti rehet nabî ku deng ji te neyê tê rihet bibî, va e ji te re dibêjim ti fahm dikî?

Go mi jî serê xwe wiha kir ba ez kûçîk im. Go wele mi dî go yek û didê, sisê û çar û pênc û bîst û sî û flan û bêvan. Go a dawî hingî ku janê da kezeba min go ûyyy, go hindik û go hema min dî ez kirme însan û dûvê kûçîk bi min ve ma. Go dûvê xwe ji bin aba xwe derxist go:

Minê xelk dibê Mihemedê Bajarê Kengê li mêj nake. Minê limêj bi dûvê kûçîk nabe. ez ê jêkim, di berê jî jêkim meh naqede te dî şîn hat bû wek berê. Go mi dî go:

- Zanî, xwezila te ev deng jî ji xwe nanyana tê rihet bibûna.

Go mi dî go:

-Zanî, ez ê ji te re bêjim, aa ji te re şiv. Here binê wê ji te bitirse ewilî, ewilî xwe kêmbike, jêr bê “keçê ba de ti çî bikî tê bikî e deng nakim” heta ku te rokê te keys lê anî; ku te keys lê anî, ti vê şivê li nav gûhê wê de lêxe, ti bê bibe çî wê bibe wiya. Dilê te çî hebe wê bibe wiya. Mi go:

- Temam.

Beşa Pêncan:

Go mi anî şiva xwe xiste paşila xwe û ez hatime malê. Go çawa ez hatime malê go:

- Qehpa xwiya min te rihet kiriye ne kûçîkê heram?

Mi go:

- Keçê ma e tiştêkî ji te nakim. Ez ê ji xwer li hindirû weke hêsîra rûnê, ti çî bikî, tê bikî.

Go wele ez rûniştîm. Go hey hey ji min dipelikêne. Rokê didiwa sêya çara mehekê, go gûhê xwe êdî ji min birî. Go rokê hevîr dikir go destê wê di hevîr de bû, ez jî li wî alî, ez hatim derî vekir ez hatim min zanibû bala wê ne li min e. Go hema mi şiv ji paşîla xwe derxist heta ku Xwedê hiner da min, mi ew şiv li nava guhê wê de, go mi go:

- Heydê de qamtir

û hema mi dî bû qamtireke weke dîwarekî û hema hindir de çû û hat û go hema mi derî lê vekir mi go:

- Siktir be derê.

Sê çar hebê din jî lêxist û go derkete derve. Go mi çû ba yekî qamtirçî kir ku bara dibin Stewrê³¹ û Ahmediyê³² û digêrênin. Go mi go:

- Were vê qamtirê bibe, ne êm ne jî avê bidyê û kîjan barê giran lêke.

Go mi dî go:

- Ez ê êm û avê bid mê lê ez ê barê wê giran bikim

û go wele xiste ber barê êzinga, xiste ber tiştêkî. Go mi dî go haa minê haaa minê hawa ye heke ti bawer jî nakî (*ji Mîrze Miheme re dibêje*)³³ go wele hew kar pê bû hingî ku barê wê giran kirin ket. Aaa waa li binya sergo ye wa ketiye wa qijak li ser piştî wê ne, çûk wa tev birîndar kirine, dike wa dike bicahme, li wê derê ye. Lê bira zê serê te jêkim. kesî mesela min nebihîstiye mi ji re got ez ê îja serê te jêkim. Go:

- Temam serê min jêke, li ber serê xwe sekinî me. wele ka bise zê herim ser serê qesrê.

Beşa Şeşan:

Go wele gava ku e çûme ser serê qesrê mi destmêj kir mi dî carekê mi misînê xwe li ber xwe danî, pirtikê xwe li hev xistin, go mi dî teyr go xiijji dakete ba min. Go ez li ser piştî wî siwar bûm, mi go:

- Rehmê tê bi rû pacê xî ez ê xatir ji bixwazim pir taab bi re dî.

³¹ Navçeya Mêrdînê (bi tirkî Savur).

³² Bajarokê navçeya Stewrê (bi tirkî Ahmetli).

³³ Nîşeya berhevkar.

Go wele teyr anî go xijj li ber pacê sekinî go mi go:

-Ya Mihemedê Bajarê Kengê! Bi xatirê te.

Go mi dî go:

- Oxir be oxira te a xêrê be ewî yê daleqandî, ew qahpa jina min diçû rica wî ya. ew jî a ê te bû ha. Ew qahpa jina min diçû rica wî ya, ew wî yê daleqandî gava te wî vekir hew kesî wî dî, ew yarê a te bû, ew yarê ê min bû o go de here li te xweş helal be.³⁴

³⁴ Vegêr di vir de kirdeyan tevî hev dike lê ya ku dixwaze bibêje di peywenda wateyê de baş tê fahmkirin.